



Sal 6
Hejmar 18
Payîz 2000

Xwedî Komeleya Nivîskarên Kurd
li Swêdê

Redaksiyon Laleş Qaso
A.Gernas
Zinar Soran
Mûrad Ciwan

Şertê abonetiye 100 SEK

Pergala rûpelan Apec

Sûretê bergê pêşî Xatun li ber deriyê Şêx Hadî

Postgiro 46 32 31-1

ISSN 1400-528X

Çap APEC Tryck AB

Berpirsyarê nivîsê nivîskar bi xwe ye.

Navnîşan
Box 2015
176 02 Järfälla / Sweden

Naverok

Sal 6 • Hejmar 18 • Payîz 2000

| | |
|---|-----------|
| Îbrahîm Paşayê Millî | 3 |
| Sir Mark Sykes Wergêr: Mûrad Ciwan | |
| Hevpeyvînek bi Hesenê Metê re | 13 |
| Lokman Polat | |
| Hin şaşîyên transkrîpsîyona | |
| <i>‘Adat û rusûmatnameyê ekradîye</i> | 13 |
| Selman Dilovan | |
| Dayêean | 36 |
| Şahînê Bekirê Soreklî | |
| Kêliya dawî | 38 |
| Kamîran Haco | |
| Mêvan | 42 |
| Albert Camus* Wergêr: Serdar Roşen | |
| Ceribandînên Montaîgne | 53 |
| Sermîn Bozarslan | |
| Tirsa mirinê | 57 |
| Mêvan B.Batê | |
| Ferhengoka Şêx Fethula Werqanisî | 62 |
| Zeynelabidîn Zinar | |
| Têymûraz çawa kirin şayîr | 68 |
| Tosinê Reşîd | |
| Rojek ji rojên Girtûgeha Diyarbekirê | 74 |
| Laleş Qaso | |
| Di derheqa pirtûka <i>Dîroka Kurdistanê da</i> | 78 |
| Wergera ji rûsî: Têmûrê Xelil | |
| Ez û Heykel | 89 |
| M. Ali Kut | |
| Ji weşanên nuh | 92 |

Îbrahîm Paşayê Millî

Sir Mark Sykes
Wergêr: Mûrad Ciwan

Rêwîtiya siwariya hespan a roja dîtir di esasî de wekî ya roja berê bû, lê belê piştî ku em têra xwe di nava erdên bin desthilata Paşa de bûn, karwanên piçûk ên bi du sê keran bala meriv dikêşan û merivên ku em li ser rê rastî wan dihatin ji xwenêzikkirina me nedireviyan. Ew pirtir bazirgan û firoşerên wiha bûn ku ji bo kîrrîn û firotinê di navbera eşîrên konfederaliyona millîyan yê cuda de diçûn û dihatin, yan jî hin gundiyên ermenî yê Wêranşarê bûn ku mijûl bûn bi raguhaztina xurek û rûnê nîvişk ji bajaran ber bi waran û ji wir jî ber bi aliyê din ve. Qasî ku ez ji van merivan têgihîştim, her çendin li ser hidûdan ew ji bal anaze û şemerên başûr ve dibûn hedefên şelandin û diziyê, piştî ku diketin nava hidûdên millîyan îdî di ewleyî de bûn, bi têtikiliyeka xweşbînî û rêzlêgirtinê dihatin pêşwazîkirin.

Em di ser gellek warên konan ên kurdan re derbas bûn, lê me hema hema qet agehî ji bal xelkê ve bi dest nexistin ji bilî nûçeyên ku hevalên Miss Shattuck (Mîsyonereka ciwanik a li Urfayê) ji bal beraziyan ve hatine şelandin û li ser gilîyê wê gellek meriv hatine zîndankirin. Pişt re wextê êvarê ji hin siwarên çekdar ên bi çekên dewletê em hîn bûn ku warê konên Paşê ne zêde li dûrê ye. Li dora piştî saetekê em rastî komeka konên li biniya girekî vegirtî hatin û hîn bûn ku ev warê Îbrahîm [Paşa] ye.

Bi gîhaştina me, Paşa, ku berê jî ez bûbûm mêvanê wî, derket derva ku pêşwazî li me bike û li gora adeta bedewiyan ez himbêz kirim û ser milê min ê rastê ramûsa. Pêre pêre ez hatim vexwendin bin konekî mezin, ku li ser 100 sitûnan hatibû vegirtin û pahnayiya wî 1.500 yard çargoşe bû. Piştî ku em ji bin tava rohnî ya çavçimên a nivê rojê hatibûn, di destpêkê de gellek dijwar bû ku meriv karibe bi zelalî bibîne bê ka li quncikên vî konê fire yê dewasa çî heye û çî nîne. Lê pişt re xwiya bû ku ji min wêdetir qasî 150 meriv li dora dîwana nizm a ku ciyê rûniştina Îbrahîm [Paşa] bû, rawestiyabûn. Wî ez birim wê dîwana ku bicîhkirî bû li pêşiya agirê jî pişkulê devan û wekî her gav çend gumgumên qahwê li serê bûn.

Paşa merivekî tenik î bejinzirav bû, rûyekî kurdîni yê safî yê difnmezîni ê kuftikî û çavên xwedan awirên gellekî tûj ê bi meraq, eniyeka pahn a hilkirî û devekî mezin li serê bûn. Di sakiniya ruyê wî de ifadeyeka gellekî bêyom a meşûm a ji bal biruyên rabûyî (pîjbûyî) pêkînayî, di nava rûniştîyên konan ên bin tava berriyê de gellek adetî û belav bû; ji bal birineka şûran a bin çavan ku çapaxa binî ya çavan dadixist xwarê vî awirê haşîn ê hizirtîjî ji zarifiyê dihat bêpar hiştin . Lê belê di sohbetê de bişirîna wî ya misêwayî ya vekirî û dilxweşker û edayên wî her dem dostane bûn. Bi vacayiya balkêş a ruyê wî, dest û piyên wî ji heddê wêdetir piçûk û zarif bûn.

Di dema sohbetê xwe de, wî zanîneka fewqelade ya di derbarê kar û barên Awrûpayê, têkiliyên Îngiltereyê yên li gel Îrlandayê û gellek buyerên din nîşan da. Xuya dibû ku çavkaniyên wan agehiyan, ji rojnamên tirkan pirtir in. Bêşik çavkaniyên wiha li cem wî boş (pirr) û dagirtî bûn.

Qelebalix xelkê ya ku li dora wî civiyabû ji insanên ji gelek bawerî û qewmên Tirkiyê pêk dihatin, pirranî ji bo kar û bar hatibûn. Yên ku hatibûn ew kes bûn ku ji bo safikirina dawê, doz û bac û xeracên xwe hatibûn, bazirganên rûn, hirî û kincan û yên tiştên din bûn ku ji bo Paşayî lazim bûn. Xusûsiyeta listeyeka wan kesên ku bi tesadufî min li gel wan axaft wê karibe fikrekê bide.

1. Êzîdiyekî (tabîê şeytanî) ku piştî bûbû misilman.
2. Dokorekî tirk ê ku bi ser biryargeha Paşayî ve bû, yekî sirgûnkirî bû.
3. Hemawendiyekî ku berê zabîti bû ku ji postexaneyê Îskenderûnê 2000 mecîdiye (330£) şelandibû, 150 sal hebîs dabûnê, lê di hevîsê de tunelek kolabû û reviyabû hatibû xwe avêtibû Paşê.
4. Dizekî ku li nêzî Helebê çar mîr û jinek kuştibûn.
5. Ermeniyekî xangêr yê ku barhilderê diyariyeka ji devan bû û ji bal kurdên karageçî ve hatibû hinartin.

6. Dizekî ku min bi xwe ew du sal berê li nêzî Nisêbînê girtibû û niha firosêr bû.

7. Erebeke şemerî ku hatibû ku safikirina dozeka xwînê ya di nava eşîra xwe de pêşkêş bike.

8. Hemîdiyeyekî heyderanî yê ji Wanê.

9. Begekî çerkez ku di xizmetê de amade bû.

Paşayî, ji ber hebûna van merivên kêmrûmet dawa lêborînê kir û got ku adet û qanûnên çolistanê wî mecbûr dikin ku kesên xwe davêjin bextê wî, wan bihewîne. Têra xwe para rastiyê di vê de heye, lê belê rîayetkirina Paşayî a di vî warî de bi wî awayî pêk tê ku bilindbûn û nizmbûna wan kesên keftiyên qedere dikeve destê hamiyê wan û ew dibin peyayên wî yên har ên ku rohnî di çavên wan de namîne. Li aliyê din ji bo Xwedê divê bê gotin ku rabûn û rûniştina van merivan di nava hidûdên Paşayî de têra xwe rast û durust dibe, tu kes ji wan nabe ji wan tûpên ku ji bal polîsên îngilîz ve wekî “gunehkarên fêrbûyî” tên naskirin, yên ku nikarin xwe ragirin û neşelînin.

Axaftina Îbrahîm [Paşa] ya destpêkê gellek balkêş bû: Gelo bi rastî ji konferansa Algecirasê hatibû birrîn? Gelo rast bû ku xîveta şanogerî ya seyyar a Sarah Bernhardtê ji konê wî mezintir bû? Piştî ku me demekê li ser buyerên rojevê yên ciddî axaft ew bi min re hat xîveta min, li hundur mektûbeka taybetî nişanî min da ku ji bal wezîrê azam ve jê re hatibû û jê dihat xwestin ku min taqîb bike, çavê xwe ji ser min nede alî, bê ka ez çi dikim çi nakim. Pişt re wî ji min pirsî ku gelo ew çi bike. Min jê re got ku çêtir e ew rastiyê bêje, û rapor bike ku ez ji bo kêf û hînbûnê digerrim.

Di dema axaftinê de, wî behsa kurdên millî bi wî awayî dikir ku goya wekî qewm ji hemûyên din cuda ne, li gora agehiyên wî, tesîra hukmê wî ji wan eşîrên tabîên wî gellekî wêdetir diçû. Li gora ku wî digot qewmê kurd bi ser sê şaxan ve parve bûbû; şaxê millan, şaxê zîlan û şaxê baba kurdî. Ji wan şaxên millan û zîlan her tim dijminê hev bûn û tu yekê ji wan baba kurdî ji farisan pêştir tişteke hesab nedikirin. Wî her wiha got ku tu ferqî û cudatî di navbera eşîrên wî bi xwe de; her wekî di navbera eşîrên Dêrsimê ên şîa û yên wî bi xwe yên Qerejdaxê de tunene. Li gora wî nehezkirin an pêşînhukmîyeka kurdan li hemberî yezîdiyên Çiyayê Sîncarê -ku ew kurdên millî bûn- ji tunebû. Jê balkêştir wî îddîa dikir ku pêwendiyek di navbera erebên caîs (Jais Arabs) û kurdên milî de heye. Lê tu delîlên vê nebûn û gûman li ser bû.

Wî çîrokeka kurt a dîroka eşîra xwe jî ji min re got, ku ji balkêşiyê ne bêpar bû:

Di destpêka sedsala nozdehê de, di dewra Sultan Mahmûd de, li başûrê rojhilatê împaratoriye sê mîrên mezin hebûn. Eyyub Beg, bavê bapîrê wî bi xwe, li ser axa Cizîrê ji Bîngolê heta Çiyayê Sincar (Li vê derê qesd ne bajarê Cizîrê ye, tevayiya erdên bakur ên Mezopotamyayê ye M.C) îdare dikir. Mihemmed Paşayê Rewandizî mîrê tevayiya wan erdên navbera hidûdên rojhilêt û Mûsilê bû. Li bajaran axayên mezin û eşrafan bi xwe xwe îdare dikirin. Li rexê din, li berrî û çêregehên başûr Şêx Sfugî serokatiya eşîrên bedewî dikir. Ev hemû reis û mîr, di navbera xwe de di nava şerên berdewamî yên şan û şerefê de bûn, qasî zerreyekê paxav ne bi paşayê Bexdayê ne jî bi sultanê Îstenbûlê dikirin. Dawiya dawîn vê şêla wan bala hukumetê kêşa û wê Reşît Paşayê mezin şand ser wan. Mihemmed Paşayê Rewandizî hat girtin û kuştin, Sêx Sfugî û Eyyub Beg jî hatin derdestkirin û hinartin ji bo Diyarbekirê ku ew li wê derê mirin. Li ser vê yekê tirk demekê bi tevayî bûn desthilatdarên welêt.

Pişt re şerê bi xidîvê Misrê re, dagirkirina Sûriyê ji bal Îbrahîm Paşayê kurê Mihemmed Alî yê mezin [Mihemmed Alî Paşayê Kawalayî M.C] hat. Tîmawî Begê ku ciyê Eyyub girtibû, tu sedem jê re tunebûn ku ji tirkan hez bike, tevî misriyan bû û di bin femandariya wan de êrîş bir ser hêzên li Mêrdînê bicîhkirî, bi wê meqsedê ku rê li ber wan bigire da ew tevî ordiya esasîn nebin. Ordî, wê demê ji Meletiyê ber bi Nizîbê ve dikişiya. Tîmawî di wazîfeya xwe de bi ser ket, Mêrdîn zeft kir, lê di şerekî hema piştî wê de ew bi xwe hat kuştin.

Demekê pişt re vekişiyana misiriyan û ji nuh ve avakirina serdestiya Osmaniyan dest pê kir ku bi vê yekê re kurdên millî jî ketin navbera belengazî û perîşaniyeka mezin. Kesî wan tunebû ku serokatiya wan bike, xwe bi xwe şerê hevdu dikirin û her daîm jî bal erebên teyî û şemerî ve dihatin talankirin. Wan gund kivil kirin û ew ber bi Qerejdaxê ve paş ve avêtin. Her di eynî demê de hêzên hukumetê jî rê li ber wan digirtin da xwe nêzî warên xwe yên Bîngolê û yên nêzî Diyarbekirê nekin. Rewşê bi vî awayî dom kir heta bavê Îbrahîm, Mahmûd Begê kurê Tîmawî mezin bû û serokatiya eşîrê girt destê xwe. Lê heta vê demê, ew ji rewşa nebaş ew qas perçe bûbûn ku wî mîkarîbû tiştê jî wan bikira. Kes wê li pay wî nemeşiya, loma jî wî muracaatî Paşayê Şamê kir ku hin hêzan bide wî da ew xelkê xwe berhevî ser hev bike. Paşayî sed meriv danê û got de tu dikarî çî biki bike. Bi van hêzên xwe wî teyî û şemerî paş de qewirandin û eşîrên xwe li Wêranşarê berhevî ser hev kirin. Di çend salan de ew gihîşt hêz û murefeliyeka berbiçav û cesareta wê yekê di xwe de dît ku li Wêranşarê qesrekê ava bike. Lê Umer Paşa yê ku wê wextê Diyarbekir îdare dikir zû bi zû tevgera wî şikand, Mahmûd

zîndan kir û qesra wî şewitand.

Îbrahîm bi xwe, wê wextê li dora huvde saliya xwe bû. Bi rênîşanderiya bavê xwe pazde mihîn girtin û reviya çû Misrê da bikaribe muhaweleye bike ku dilovanî û sempatiya Îsmâil Paşayê Xidivê Misrê ber bi Mehmûd ve bikêşe. Ji bo ku Îbrahîmê gênc di entrikayên serayan de bêtecrube bû, ket nav destê navberçiyekî bêwîjdan ku wî ew xapand, mihînen wî jê girtin got min dane xidiv, lê di rastiyê de wî bi xwe dest danî ser wan. Vî merivî miqdarek pere dan Îbrahîm û got ku tiştê ku Xidiv karibe ji bo te bike hew ev e. Piştî ku bi vî awayî hemû muhaweleyên wî yên li Misrê bêfêkî man, Îbrahîm çû Şamê, bi hêviya ku pê bişewire serî li Emîr'î Hec da ku ew bi eslê xwe kurd bû. Vî mirovî şîret li Îbrahîmî kirin ku doza xwe bibe rasterast li ber Sultan deyne û navên hin kesên karbidest ên li paytext dayê. Gava Îbrahîm gîhaşt Îstanbûlê, ji siûda wî re Xidiv Îsmâil [Paşa] bi xwe ji li wê derê bû, kurdê gênc firsenda wê yekê dît ku wî bibîne û pêwendiyên kevn ên millîyan û hukumeta Misriyan bi bîra wî xe. Ji xweşbextiya wî re kêfa Îsmâil li serê bû, bi dilxweşi pêşwazî li muraceta Îbrahîm kir û ji Sultan Abdul Azîz fermanek li ser serbestberdana Mahmûd Beg girt. Îbrahîm bi wê fermanê vegeriya Wêranşarê bavê xwe da serbestberdan û di karûbarê îdarekirina eşîran de alikariya bavê xwe kir.

Lê siheta Mahmûd Beg a ji ber dirêjkêşana mayîna di zîndanê de xera bûbû, piştî bi serbestbûna xwe ne bi gellekî mir û serokatiya eşîrê ji Îbrahîmî re hişt. Îbrahîm li ser şopa adetên eşîrê meşiya, karwan şelandin, xiristiyan parastin, talanên bazirganên Diyarbekirê bir, heta ku dizî û talankirinên wî gîhaşt dereceyeka bêtehemmuliya welê ku hukumetê ew da girtin û tevî şeş serokşîrên din sirgûnî Sîwasê kir. Li wê derê, ew qasî şeş mehan, belkî zêdetir jî di nava rewşeka dijwar de man. Piştî wî mektûbek hazir kir û şand ji diya xwe re ku wê wextê li Wêranşarê dima, tê de hêvî kir ku jê re çend mihînan bişîne da ji wê derê berê xwe bidin bi aliyekî de. Diya wî niyeta ku di serê wî de bû bicîh anî, ji hukumetê musaedeyek derxist ku karibe heft mihînan bişîne Sîwasê. Heywan gîhaştin wê derê û hefsiyan îzin girtin ku derên derva, wan tehqîq bikin. Bi îşaretekê, her merivekî xwe avêt ser mihînekê û berê wê da riya esasî ya Meletiyê. Zû bi zû taqîbateka ji esker, zabit û temaşevanan li pey wan derket û qasî sê saetan bi xurtî ajot. Piştî re taqîbat her ku çû sist bû heta wê derecê ku firariyan dîtin ku li pey wan tenê çar esker mane ku hîn şopa wan dimeşînin. Îbrahîm û hevalên xwe ji nişkê ve rawestiyan û li benda van lipeyhatiyên aceb ahmeq man. Kurd bi ser wan de qîriyan:

“Hûn çi ji me dixwazin?” Esker li ser vê pirsê ecêbmayî man, sekinîn û gotin ku ew dixwazin alîkariya wan bikin da ew di firara xwe de bi ser kevin. “Karê herî qenc ê ku hûn ji bo vê yekê bikin” Îbrahîm got, “ ew e ku hûn vegerin Sîwasê.” Eskeran guh dan vê şîreta wî û dev ji lipeyçûnê berdan.

Piştî demekê ew fikirîn ku çûyina di riya esasî de zêde xeter e, berê xwe dan riyên çiyayan. Vê guhertina han kêm zêde xeteriyek xist nava pîlana wan, ber bi rojava ve riya xwe wenda kirin, seranser wê şevê li palekê man bêyî ku zanibin li ku derê ne. Serê sibê dan ser şiveriyeka nenas ku ji xêra Xwedê re bi tesadufî ew ber bi aliyê rast ve dibirin. Lê ber bi nîvro mihîna Salim Begê Iikumî û ket erdê, nema karibû xwe bilivîne. Îbrahîm tawsiye kir ku xwe bavêjin pişt şaxên darên himbiz. Bi rastî jî bi vî awayî wan welê xwe parastibû ku hêzeka eskerî ya siwarî hat bi rewanî di ber wan re derbas bû, ew qas nêzî wan bû ku wan ji pişt daran dengê axaftina wan dibilîst. Piştî ku gava xwestibûn herrin nava gundekî, pê hesiyabûn ku esker wê istîrehera xwe ya nava rojê li wî gundî bikin û bi vegereka bilez, bi zorê xwe ji ketina nava lepên eskeran xelas kiribûn, şevêka din jî li serê çiya derbas kirin.

Êvara dîtir taqîbat ew qas nêzik bûbû, ew qas hal di mihînen firariyan de nemabû û jê wêdetir wan ew qas rê li ber xwe şaş kiribû, rewş bi her awayî bêhêvî dixuya. Pişt re fikreka curetkar a wisa hat bîra îbrahîm ku min heta niha nebihîstiyê. Ji nişka ve hat bîra wî ku heke ew şopa xwe li ber lipeyhatiyên xwe wenda bikin wê karibin biçin ber bi Urfayê ve, wî cihê ku firariyan dixwest biçinê. Li gora vê, Îbrahîm û hevalên xwe wî gundê ku siwarên esker biryar dabûn şeva xwe lê bibuhêrin tesbît kirin û qasî mîlekê li pişt wî gundî li ser rêya ku dijminê wan tê re derbas bûbû daketin ji bo vehesiyane. Çimkî wekî Îbrahîm jî gava ji min re maceraya xwe got bas kir, “Ji sedî sed ew ê destvala venegeriyana û wan ê ji bilî riya ku tê re derbasbûne berê xwe bidana her riyê. Bi vî awayî kurdan qasî pênc rojan di wî welatê nenas de şopbirên xwe wekî rêberên xwe bi kar anîn, lê li dora Meletiyê ev pîlan jî faşil bû. Çimkî lipeyçûyîyan hemû şopên rêberên xwe yê zorakî wenda kirin û sibeheka sar xwe di herêmeka nenas, di nava xelkekî nenas de bêmecal, windayî û bêkes dîtin.

Gundiyeke halxweş ê siwarê erebeyeka gayan ji hember ve ber bi wan hat. Piştî silavê wî gazî kir got “Hûn bi kû ve diçin?” Îbrahîm bi hazircewabiya xwe got ku ew hin koçer in ku li deveyên xwe yê dizîyî digerin. Yê gundî li wan vegerand: “Hûn kurd in û ez kurd im. Tu Îbrahîmê Millî yî, ez jî axayekî sînemînî me ku ew bi eslê xwe ji milliyan e. Esker li

gundan li we digerin, bi min re werin ez we veşêrim.”

Piştî çend saetan, her heft zilaman cara pêşîn xwarineka germ li oda mêvana ya axayekî qizilbaş dixwar, lê sergêjaniya wan hê xelas nebûbû. Hê erdeka sed û pêncî mîl fireh, ew ji herêma wan bi xwe veder dikirin. Û wexta ku wan bi mazûbanê xwe re munaqêşeya rê û dirba herî baş a berdewamkirina rêwîtiya xwe ya ji wir pê ve dikir, dengê trampetekê li derveyî gund hat. Ew têngihîştin ku şopberên wan careka din li ber paçika hustuyê wan in. Tevî ku li dijî adetan jî bû, yê qizilbaş mêvanên xwe li odeyên alî harema xwe veşartin û li hêviya hatina eskeran ma.

Zabitekî mifrezê ket hundur: “Selamun aleykum, ew heft meriv ma xwe li vê derê vedişêrin?”

Axa cewab da, got “Na, tu nikarî tu kesên wiha li vê derê bibînî.”

“Baş e, ev çîye?” zabit bi qîrîn pirsî. Eba Salim Begê ya ji pirça devan ku wî ji lez û bezê li erdê li pey xwe hiştibû, rakir û nîşan da. Bêşansiyekê têra xwe serî hildabû. Çimkî şewqên hevrîşmîn ên Mr Lock çend li Torosan belav bin ebayên ji pirça deveyan jî ew hinde belav bûn.

“Min ji te re got” axa bersîv da, “ew merivên ku tu li wan digerî tu li vê derê nabînî. Heke tu alayekê bînî, belkî tu bikaribî li wan bigerî. Adetî, xwarin ji bo te û merivên te **hazir e**, li vêderê ye, kerem kin, lê heke hûn tecawuzî haremên me bikin em mecbûr in ku şerê we bikin. Heft sed çekdarên me amade ne, û em gazî bikin du hezarên me jî li ber bangkirinê ne.

Yê zabit têngihîşt ku bi bîst mirovan ew neşê tu tiştî bike, bi rewşê razî bû, şîva xwe xwar û ajot çû. Wê şevê Îbrahîm û hevalên xwe hatin veguhaztin ji bo gundekî din, bi vî awayî her şevê ew jî eşîreka qizilbaş teslîmî yeka din dibûn, heta sibehekê wan xwe li ser peravê Feratê dîtin ku bi qonaxa du rojan a di beriyê re ji eşîrên wan dûr bû. Piştî ku ew gihîştin malên xwe bi awantaj limalêbûnê jî bo reîsan ne dijwar bû ku aştiya xwe bi hukumetê re pêk bînin û pê re li hev bikin. Wê demê şerê bi Rûsyayê re nêz dibû, hin karên hukumetê jî yên din hebûn, lêgerîna hin aştxerakiran ne girîng bû. Loma jî lihevhatin zû pêk hat.

Ne bi gellekî piştî şerê rûs û tirkên bû ku Îbrahîmî derfet bi dest xist ku bikêrhatin û basîreta xwe îsbat bike. Gava wî ya pêşîn ew bû ku dostaniyeka tekûz bi wê komika çerkez a piçûk lê li ser xwe ya Rasul Aynê re deyne. Pişt re şêxên piçûktir ên eşîrên dora xwe di bin hukmê xwe de civand û ji ehlên wan cuda kir, bi vî awayî her carê ewleyiya beşek jî 100 200 konan pêkhatî pêkdianî. Wî her wiha dîplomasiya xwe jî li dar xist, ku ji kurdên millî re lê hat ku cepheyeka gellek bihêz a ji her demê

bêtir pêşkêş bikin. Ev hemî bi hêz û entrikayan hat pêkanîn û rûdan a pêşveçûnan ji bal wan erebên ku bi şer û pevçûnên nava xwe mijûl bûn nehat keşifkirin. Siyaseta Îbrahîm ji wê yekê pêk dihat ku bi xurtan re heval be, bi zeiftiran re tavîzkar be û gefan li jartirinan bixwe.

Teqriben di vê dewrê de buyereka mezin rû da, Îbrahîm û hin serokeşîrên kurdan yê din hatin wezîfedarkirin ku bibin Hamîdiye, piştî ziyaretkirina Îstanbûlê ew bi rutba mîralaytiyê hat tayînkirin û rutbeya paşatiyê ji bo wî hat dayîn. Piştî vê, siyaseta wî qelewtir bû. Dest pê kir li hember anaze û şemeran li ber xwe da, gav bi gav ew paş de xistin, di encamê de herêma xwe ji beşên wan ên herî xerab malişt. Wî xiristiyan(ermenî û keldanî) han dan ku bar kin werin li dora Wêranşarê bi cih bibin û bazarek li nava vê qesebê ava kir ku zû bi zû geş bû. Gava eşîr û reisên din ermenî talan û qetil dikirin Îbrahîm ew diparastin û cesaret dida xiristiyanên ji hemû mezheban. Qasî ku tê texmînkirin di dema komkujiya ermeniyana mezin de wî qasî 10.000 ermenî ji tunebûnê parastin. Bi riya mahrkirina xwişka şêx wî eşîra xurt a ereb a bi navê cais(Jais) ber bi xwe ve kêşa, afdelî, baggara û şerabî li pey wê hatin. Eşîra kîkan a li dora Mêrdînê tevî wî bû, lê belê teyî, jibbûrî, anezeyî û şemerî niha bûn dijminên wî yê xedar. Ji bo siyasetmeşînekî wekî Îbrahîm gellek xeter bû ku ev bloka req a dijmin destlênedayî bihişt. Bi riya îstifadekirina ji dijminayetiyeke dûr û dirêj a navbera her du aliyên şemeran Paşa, bi libergeriyanê, ruşwetê û axaftinê şêx Curallah(Jurrallah)ê mezin ê xwedanê 1.500 konan kêşa aliyê xwe.

Di vê navberê de bi bihêzbûna Paşê dewlemendiya wî jî zêde bû, mezinbûna giringiya Wêranşarê çûnûhatina karwanan kêşa ber bi binê hukmê wî ve. Berê ji bo koçeran îmtiyazek bû ku bi çavê talankirin û şantaj û gefxwarinan li karwanan binêrin, lê bi saya Îbrahîm ew bûbûn ew rûdana ku bereket û dewlemendî tanîn bajarê Wêranşarê û bi vê munasebetê pere û malên bazirganiyê tanîn warên koçerî yê wî, ditina wî ya li ser karwanan her tişt guherîbû. Zêde tê re neçû, qeregêçiyên ku pêşveçûnên kurdên millî bi çavê xwe didîtin ji vê yekê ne kêfxweş bûn. Niha ew karwanên ku çî ji hêla Diyarbekirê çî ji hêla Urfayê dihatin diviyabû di herêma vê eşîrê re derbas bibin. Wan jî misêwa bi serbestiyeka bêhed ew talan dikirin. Di 1904-ê de Paşa ev yek protesto kir, lê protestoya wî hat piştguhkirin. Li ser vê wî daxwaz ji îdara Urfayê kir ku asayîşê pêk bînin, lê hukumetê sersarî kir, loma jî Îbrahîm mesela qeregêçiyên kir mesela xwe ya şexsî. Siyaseteka adetî ya hukumeta tirk e ku ihtîmala bizaveka qetî hebe ji mudaxeleyî nava lec û pevçûna eşîran

bike. Vê carê jî yuzbaşiyek tevî mifrezezeyeka çiyayî ya ji panzde kesan pêkhatî hat şandin ku têkeve nava her du berên şerî. Li dora Sêwrekê derketin pêşiya Îbrahîm û hêzên wî, û yuzbaşî emir da serokeşîr ku vegerre welatê xwe. Îbrahîm ev yek red kir, axaftina navbera wan her ku çû req bû, yuzbaşî bi lêdana gulleyekê hat kuştin, merivên wî hatin bêçekkîrin û hinartin ji bo Urfayê, kurdên millî jî bi riya xwe de dewam kirin ku herin hesabê xwe bi djîminê xwe re bibînin. Di şer de piştî demeka kurt qeregêçî bi tevayî şikestin, kon û malên wan hatin birin ji bo Wêranşarê. Hinek şert li ser wan hatin ferz kirin ku ew van bi cîh bînin û di pêserojê de tedaxulê nav karê karwanan nebin. Ji bo ev lihevhatin û aşî bê tekûz kirin du mahr di navbera biraziyên kurr û keç ên her du serokeşîran de hatin birrîn û Îbrahîm ne tenê bi wî malê talankirî gelek ji wan tiştên destliserêdanayî bi xwe re birin û vegerrîya Qeregêçiyê. Û ji bo aşkirina berpirsiyarê dewletê ji ber sedemê kuştina zabî jî, karwanekî jî pênc sed barê devan yên rûn pêkhatî hat verêkirin Îstanbûlê ji Sultanî re.

A ev ew wext bû ku ku herkes di wê fikrê de bû ku hêza Îbrahîm diheje û wê dawî li rojên wî yên bi debdebe werin. Wî kurrekî Sultan kuştibû, hemû zabî û esker bûbûn tîhniyên xwîna wî. Diviyayî tenê bi gotinekê hebû, hemû çekdarên ku li herêmê di eskeriyê de xizmet dikirin amade bûn ku êrîşî ser wî bikin. Tam di vê demê de bû ku Îbrahîm bi cesareteka mezin hat Urfayê, merkeza hukumetê ku çend rojên dawiyê yên Remezanê li wê derê derbas bike. Telgrafeka taybetî ya ji Îstanbûlê emir kir ku bi başî pêşwazî lê bê kirin û ew xweş bê ezimandin. Dijîminên wî yên ku hê berî bi çend rojan li benda ketina wî bûn, niha ketibûn bin tayeka mezin û di halekî gellekî nexweş de welê man heta ku Paşa bi qeflê lipeyhatiyên xwe piştî çend rojan ji bajêr derket çû.

Siyaseta Paşa niha ew e ku êrîşî wan gundên wiha bike ku di binê hukmê wan kesan de ne ku ne dijîminê wî ne jî mittefikên wî ne, her wekî yên berazîyan, bi wê hêviyê ku belkî rojekê desthilata wî qebûl bikin. Di dema ku ew ji misilmanên bin destê hukumetê re tewsîr nake, ew kêman xiristiyanan diêşîne. Wî li hemî qeseban casûs hene, di warê xwe de penagehek ji bo rêbir û xerabkaran ava kiriye bi wî şertî ku gava werin herêma wî hay ji xwe hebin xirabiyan nekin.

Îbrahîm Paşa xwediyê karakterekî gelek seyr e. Bêgûman rêberekî tebîî yê peyayan, xwedanê xusûsiyetên hemû merivên ku di tecrubên curbecur ên jîyanê re derbas bûne, hêzeka mezin a bi xwe baweriyê ye, û tevî wê jî wekî zarokekî nazdar ê nazik e. Ji bo min ew bi her awayî jî bo lêhûrbûnê balkêş e, çimkî di wî de ji bo min merivekî welê xuya ye ku

wekî Warwîckê ku di Îngîlterê de hat û çû û her wiha li Tirkiyê jî wê jê re cih nemîne. Ez di wî de baronekî feodal, despotekî rojhilatî û serokekî koçer dibînim. Di nav konê wî de meriv dikare hin ramanên jiyana kon û warên Tîmûr û Atilla peyda bike; di hilhatina wî ya ber bi hêzbûnê de îlhamên serkeftinên destpêkê yên osmanîyan, di zeifî û hêziya wî de hin xeta û bikêrhatiyên Mithridatîyan diyar dibin.

Di dinyayê de tu xelk nîne ku qasî vanên Asyayî meyardarê perstina lehengan e. Qatîlekî herî jar gellek caran dibe xwedanê hurmet û rêzêgirtinê, rêberekî herî newêrek bilind dibe dikeve dereca Robin Hood. Esasên wiha ne ku rê li ber hilhatina zilmerivan vedike.

Û gava bi qezayî merivek dertê ku hêza wî tenê li ser qurnaziya wî ya siyasî bilind bûye, piştî meriv diyardeyeka fewqelade ya yekî bêhêz malûl ê wekî Îbrahîm îdareya girseyeka gelekî perçebûyî yê li dervayî zêftê dike.

Roja dîtir a piştî gîhaştina me ya wê derê, Paşê ferman da ku kon bèn rakirin û koç bi rê keve. Tevayîya wê koça ku ji barê 2.000 heywanan ne kêmtir bû ji destpêka fermandayînê di du saet û nîvan de amadeyî birêketinê bû. Ev wext piçekî ji wextê ku meriv karibe vê koçê deyne û konan vegire zêdetir bû. Di meşa karwan de Paşa li ser dallulekê (deveyeka rewan) di serê karwan de diçû, 50 siwar ên mihafîzên wî yên şexsî û komeka ku teqrîben ji 15 cot tajiyan pêkhatî li dora wan bû. Vê dîmenê bi hev re tabloyeka balkêş a harîka derdixist meydane.

Di seranserîya mêvaniya min a pêncrojan de a bi Îbrahîm re kar û bar berdewamî di wî konê mezin de dihatin meşandin. Siwarên bi mesaj, name û raporên li ser her awe karan misêwa dihatin û diçûn. Paşê bi suratek gellek mezin karên wan bicîh dianî, hîç jî bo fikirinê navber nedidayê û her gav jî hafîzeyê xwe gellek emîn bû.

Me di 14-ê mehê de sibehê zû konê Îbrahîm li cî hişt û em ber bi Rasul Aynê bi rê ketin.

(The caliphs' last heritage, a short history of the Turkish empire, by Lt. Col. Sir Mark Sykes, London, 1915, r. 316-327)

Hevpeyvînek bi Hesênê Metê re

Lokman Polat

Hesênê Metê bi qasî ku di novelên xwe de nivîskarekî me î serketî ye, di wergerê de jî wisa ye. Ji ber vê yekê min xwest ku ez di derbarê wergerê de hevpeyvînekê pê re bikim. Bi hêviya ku em hemû, ji qelesa vî nivîskarê me ê hêja, hîn gelek kitêbên nivîskarên wek Çexov, Pûşkîn û hwd. bi kurmanciya wî a delal bixwînin...

Lokman Polat : Te heta niha çend pirtûk wergerandine kurdî?

Hesênê Metê: Ji Pûşkîn min Keça Kapîtan wergerande kurdî û di 1988an de çap bû. Min û çend hevalên din, me her yekî çend novelên Çexov wergerandin kurdî û bi navê Mirina Karmend ew jî çap bûn, 1989. Ji Dostoyevskî romana bi navê Merivên Reben min wergerande kurdî û ew jî di sala 1991ê de çap bû.

Di wergerên Dostoyevskî, Çexov û Pûşkîn de zehmetiyên ku derketin pêşiya te, çi bûn?

-Di van wergeran de du babet zehmetî derketin pêşiya min: Jê yek zehmetiyên ziman bûn. Peyv û gotinên ku di kurdî de tunebûn, hevokên ku li kurdî nedihatîn û lezeta zimanên din nedidan... ev tiştên weha zehmetiyên ziman bûn. Zehmetiya din jî giraniya berpirsiyariyê bû. Berpirsiyariya ku ez ê stîl, huner û felsefa van nivîskaran hinekî têbigêhîjim. Berpirsiyariya ku ez ê wergera xwe zêde ji orjînalê dûrnexim. Berpirsiyariya ku ez ê zimanê xwe vekêşim, dapejinim û berhemên van maqûlan di zimanê xwe de bihewînim. Zehmetî ev bûn.

Werger çi ye û li gorî te çi girîngiya wergerê heye?

-Ca bihizire ku Mem û Zîna Ahmedê Xanî bi japonî bi hev re dipeyivin, Otheloyê Shakespeare bi kurdî dipeyive, Çiçikovê Gogol bi erebî dipeyive, Heci Mihemed Eliyê Qelşoyê Rojen Barnas bi finî dipeyive. A ev kar û qudreta pîrozwer, ev jirî û ahrandîneke weha, bi keda dest û hunera wergêran dibe. Pirsra ku îcar wergerandin çi ye, pîrî caran yekî ku bi du zimanan dizanc û dikane mana van herdu zimanan li hev vegeirîne em jê re dibêjin wergêr, an jî bi gotineke rastir tercuman e. Lê wergera ku anuha em dixwazin behs bikin, bi qasî ku ez têdigêhîjim bêtir li ser wergera edebî ye û ev jî erkeke girantir, jiriyêke ziravtir divê. Wergera berhemeke edebî ne tenê wergera hevok û maneyêke wê ye jî, her berhemeke edebî hunereke xwe heye, her nivîskarek xwediyê stîl, reng û dengêkî ye. Ev huner, stîl, reng û

deng ji di karakterê nivîskar de xwediyê ahengeke felsefî ye. Di wergerê de kar û erkeke baş ew e ku meriv bikani be van hemû xusûsiyetan di zimanê xwe de bi cî bike, bi kêmanî tiştêkî nêzîkî van tiştan formule bike.

Di nav me kurdan de wergerandina berhemên biyanî kêm in, gelo sebeb çi ne?

- Bi baweriya min gelek tişt kêm in, ne tenê wegerandina berhemên biyanî. Bêguman ev ji ji rewşa me ya siyasî, civakî û heta derekê ji rewşa me ya kulturî tê. Heta roja îro ji me ne dewleteke siyasî, ne civakeke bi ser û ruhekî silamet û ne ji jiyaneke bi kultureke weha dîtiye. Wek şexis maqûlên me ji hebûne û îro ji hene, lê ez dibêjim ev tişt wek civak û jiyana civakî çênebûye.

Dîtî û pêşniyazên te yên ji bo kovarên me kurdan çi ne?

- Temamê kovarên me ên kurdî divê tiştêkî bidin ber xwe û bigêhîjin wir. Ew ji standardên dema me ne:

A- Hevbeşiya karê kovarê (wênekêş, redaksyon, berpirsiyarên beşên ciyê ciyê - abone, xwedî, firotin belavkirina kovarê û hwd...)

B- Perê ked û karê niviskaran (weke keda karê niviskaran divê pereyek hebe, prensîbêkî bazariyê hebe, li ba xelkê mafê du rûpelan du hezar kron bc, tu bîst krona bide... Lê ji xwe re têke prensîb)

C- Qayîşkêşiyêke pir xurt, lê nerm û munasib (di nava kovarên kurdî de divê rekabetek hebe; bêyî êşandina hevdu, bêyî pîskirina hevdu divê kovar bi hev re têkevin qayîşkê ku yek ji ya din xurtir û hêjatir be)

Ev hersê tişt ne tiştên luks û zêde ne, belbî ABCya karê weşangeriyê ye. Formel be ji, hindik be ji divê ev exlaq hêdî hêdî rûne. An ne karê kovar û nivisandinê dibe weke suxrên mizgeftê û ji wan deran dernakeve. Û di dawîya dawîn de her yekî ji me, ew ê bibe feqî û sofîyekî edebiyatê û hew. Wê çaxê ji em ê li ser lîngan, li ser çogan ji bo XATIREKÎ silawatan binin û wek xêratên xwe yên edebî di kovarekê de belav bikin.

Ezbenî tu wisa dibêji lê aboriya weşangeriya kovarê têr nake ku mirov peran bide niviskaran; kesên ku kovar û pirtûkan dixwînin têra aboriya kovarê nake. Em bibêjin nivîskar hene ku pere ji dîde weşanxanekê ku pirtûka wî çap bibe.

- Belê belê. Min ji hay ji rewşa kovar û weşaxanan heye, lê ez dibêjim bila hinek prensîb hêdî hêdî di nav me de ji çêbibin. An ne ev rewşa îro nikane kovarekê xurtir bike, nikane hunera niviskarekî berzîtir bike, nikane xwendevanan zêdetir bike û nikane zimanekî ji dewlementir bike. Em ê negêhîjin derekê. De îcar bifikire ew nivîskarê ku tu dibêji ji bo ku pirtûka wî çap bibe peran dîde weşanxanekê. Ez nizanim, lê ku bi rastî ji rewş ev be... wê çaxê divê em hinekî li ser hêviyên xwe hûr bibin û ji nû ve bifikirin. Li ba me dema ku mêr diketin û dihatin kuştin, carina di ber xwîna wan de pereyek dihat xwestinê an ji pereyek didan ku bûyerê biteflînin. Bi gotinêke din, ev pere perê cezayê sûcekî bû. Anuha ez difikirim û dibêjim gelo sûcê niviskarekî çi ye ku di ber çapa pirtûka xwe de peran dîde?

Ji bo vê hevpeyvîne ez careke din ji dil û can sipasî te dikim.

- Ez ji ji dil û can sipasî te dikim û di karê te ê kulturî û edebî de serketinê dixwazim.

Hin şaşîyên transkrîpsîyona

‘Adat û rusûmatnameyê ekradîye

Selman Dilovan

Çend agahî derbarê vê xebatê de

A- Min li ser daxwaza mamosteyê xwe yê beşa edebîyat û dîrokê ev xebat kir.

B- Min ji beşa bi herfên erebî, ji rûpela 202yan heta 152an transkrîbe kir. Ev beş di transkrîpsîyona Delîlo Îzolî de 19 rûpel e (r.1-19). Pêşî, bêî ku ez li transkrîpsîyona Delîlo Îzolî binêrim, min bi xwe ev metn ji metna bi herfên erebî transkrîbe kir. Paşê jî min ya xwe û ya Delîlo Îzolî dan ber hev. Kelîmeyên ku di transkrîpsîyona min û ya wî de ne mîna hev bûn, min bi reştir nivîsandîne nîşan dan.

C- Ji ber ku wext hindik bû min tenê pênc rûpel ji transkrîpsîyona Delîlo Îzolî û ya xwe dan ber hev (ya Îzolî r. 1-5, metna bi herfên erebî r. 202-189). Li vir, ez di destpêkê de vê beşa transkrîpsîyona Îzolî û ya xwe her yekî li aliyekî pêşkêş dikim. Heta bi notên binî transkrîpsîyona min bi ya Îzolî re hatiye berhevdan (muqayesekirin). Piştî notên binî min îşareta *** danîye. Di pey îşareta *** re bê berhevdan, tenê ya min dom dike.

D- Li gora min Delîlo Îzolî hin peyv şaş xwendine. Hinek jî wî bi awayekî xwendine û min jî bi awayekî din xwendine. Ew peyvên wiha di nivîsa erebî de dikarin bi herdu awayan jî bêne xwendin. Lê min terciha xwe cihê nivîsiye. Mesela, wî nivîsiye, “Eger ew **merî** mîr e” (r. 6), min nivîsiye, “Eger ew **mirî** mîr e”. Ji ber ku di kitêbê de ez rastî peyva

“merî” ku bi maneya meriv tê nehatim. Di şûna vê peyvê de “mirof” û “mirov” hene. Qinyata min lê rûnişt ku ev peyv “mirî” ye, ne “merî” ye; ji ber ku berî vê hevokê qala şîna miriyan jî dibe. Dîsa wî gotiye, “... di **nîva** wan de” (r. 2), min gotiye, “di **nêva** wan da”. Dibe ku bi herdu awayan jî bête xwendin, lê min “nêva” tercîh kir.

E- Delîlo Îzolî hin peyvên erebî û yên tirkî ku di kitêbê de hene, guherandine. Nimûne: Peyva “edû” kiriye “dijmin”, ya “koyek” jî kiriye “kûçik”. Li gor min, diviyabû Îzolî eslê wê biparêze.

F- Dehlo Îzolî hin peyv jî ne li gora eslê wan lê li gora xwe xwendine. Wek “nêzûki” kiriye “nêzîki” (r. 4), “xûndari” kiriye “xwîndari” (r. 4), “xo” kiriye “xwe” û hwd. (Dibe ku peyva “xo” bi awayê “xwo” jî bête nivîsîn). Dîsa hinek daçek jî guherandine. Wek: “da” kiriye “de”, “be” kiriye “bi”.

G- Di kitêbê de hinek peyv bi du awayan hatibûn nivîsîn. Wek “jin/ jin” “mirof/mirov” û hwd. Delîlo hemû bi yek awayî nivîsîne. Wek “jin” û “mirov”. Lê min wisa nekir. Li kîjan cihî çawa hatibû nivîsîn, min jî wisa transkribe kir (di beşa berhevdanê de). Yanî min jî mîna nusxeya eslî carna “mirov, carna “mirof”, carna “jin”, carna “jîn” nivîsî. Hinek paşpirtikên lêkerî û yên lêkera kirdeyî ku îro jî bi kar tên, di kitêbê de bi awayekî din hatine nivîsîn. Wek, di cihê “em baş **in**” de “em baş **în**”, di cihê “çêdik**in**” de, “çêdik**în**” hatiye nivîsîn. Min jî wisa nivîsî, da ku eslê wê bê parastin. Ev awa di klasîkan de pir heye û hîn jî di hin devokên kurmancî de jî tê bikar anîn.

H- Delîlo Îzolî navê kitêbê guherandiye, kiriye *Adetên Kurdîstan*. Eger kitêbê bê nav bûya dikaribû navekî lê bike. Lê navê kitêbê heye, heqê wî tune ye ku navê kitêbê biguherîne. Wî di pêşgotina xwe de dema ku navê kitêbê gotiye, gotiye “Adet û rusûmatêna meî Eqradan” (beşa pêşgotinê r. X). Li gor ku Delîlo Îzolî dibêje, maneya navê kitêbê wiha çêdibe: Hinek adet û resmên eqradan. Delîlo Îzolî peyva “ekrad” kiriye “eqrad” û di kitêbê de jî her bi awayê “eqrad” nivîsiye. Lê rastîya wê ne “eqrad” e, “ekrad” e. “Ekrad” pirhejmara peyva “kur” e. “Eqrad” pirhejmara “qîred”ê ye, ku maneya “meymûn”ê dide. Dibe ku Delîlo Îzolî peyva “rusûmat” jî bi maneya “resim” (wêne) fêhm kiribe. Di pêşgotina xwe de weha dibêje: “Ew pirtûgê bê wêne bû, wêne ên ser û navin de çend diyariyek jî welêt me kirine berê...” (Beşa pêşgotinê, r. XI) Yanî kitêba Mela Mehmûdê Bayezîdî bê rism bûye, wî rismê lê zêde kirine. Lê peyva “rusûmat” tê maneya “urf û usûl”. Navê kitêbê *Adat û Rusûmatnameyê Ekradîye* ye Yanî, “urf û ‘Edetên Kurdî’”. (Navê wê yê dirêj û tam weha ye:

Kitabê 'Adat û Rusûmnameyê Tewaîfa Ekradîye we Usûlê Nîzamatê Kurmancî). Navê kitêbê di rojnameya *Kurmancî* de jî (hejmar: 10, r. 4) şaş hatiye nivîsîn: *Adet û Rusûmatê El Ekrad*.

I- Delîlo Îzolî navê Mela Mehmûdê Bayezîdî jî şaş nivîsîye, kiriye “M. Mahmut Beyazîdî”.

J- Di metna bi herfên erebî de îşaretên îmlayê wek bêhnok (vîrgul), du nuqte li ser hev, nînok (tirnak) tune bûn, nuqte jî carna hebû. Îşaretên îmlayê bi piranî min bi xwe danîn. Di metna bi herfên erebî de hin peyv hene ku bi a min şaş hatine nivîsîn. Min ev peyv wekî ku di metna erebî de ne nivîsîn lê di nava pranatezan de alternatîfa ku ez rast dibînim nivîsî. Wek: “... sondxurîn di nêqa [nêva] wan da qewî mezin e.” (r. 197) Li vir nuqteyeke herfa “v”yê kêm derketiye û bi şaşî bûye “q”. Carna di metnên bi erebî bi xwe de jî hin peyv di nava parantezan de ne. Delîlo Îzolî hin jî wan parantezan parastine û nivîsîne: “... piçûkan (piçkan)” (r. 2) [Diviyabû ku “... biçikan (piçûkan)” binivîse]. Hin parantez jî nenivîsîne: “... neseba **xwe bi zûwî**” (r. 2). Diviyabû, “... neseba **xo zû bi zûrî (bi zûyî)**” binivîse. Delîlo Îzolî dema ku parantezên beşa bi herfên erebî neqil kirine, paranteza kevanî () bi kar anîye. Ev parantez yên eslî ne, ku di kitêbê de hene. Hinek jî min bi xwe lê zêde kirin. Ji bo ku parantezên min bi yên Îzolî ve tevîhev nebin, min paranteza koşedar [] bi kar anî.

Kitêb: Nravi î Obiçai Kurdiv /
'Adat û Rusûmatnameyê Ekradîye
Nivîskar: Mela Mexmud
Bayezîdî [Mela Mehmûdê Bayezîdî]
Amadekar: M.B. Rudênko
Çap: Akademî Nauk SSSR,
Moskva, 1963
Rûpel: 202-152

Transkrîpsiyona min

Bismîllahîrrehmanîrrehîm.
Elhemdu lîllahî Rebbî'l-'alemîn.
Wesseselatu 'ela Muhemmedîn we
alîhî ecme 'în.

Kitêb: Adetên Kurdîstan
Nivîskar: M.Mahmut Beyazîdî.
Transkrîpsiyon: Delîlo Îzolî
Çap: [Hollanda], 1979
Rûpel: 1-5

Transkrîpsiyona Delîlo Îzolî

Bismîllahîrrehmanîrrehîm
Elhemdu lîllahî Rebbî'l-'Alemîn.
Wesseselatu ala Muhemmedîn ve
alîhî ecma 'în. **Emma baed.**

Emma be'd, me'lûmê cenabêd talib û naziran bibitin ku ew tewayifêd **ekradan** ji tewayifêd **e'rabêd** bedewîyêd berê ne ku zemanê mazîyê **da** ji wan tayifêd **e'raban** miqdarek cuda bûyîne û bi wan kenaran **da** bi 'iyal û etfal hatine. Û hemû qebîleyek bûne. Û berê lîsanê wanî jî bil'umûm zimanê 'erebî bûne û yek tayife bûne. Heta wî zemanî lefzê Kurdistan tune bûye. Paşê wekû hatîne van etrafêd xalî û sînorêd Îran û Xuresanê. Ew mirovêd hatî mesela çend in, elbette her yekî navek heye. Heyder mesela navê yekî bûye, herçî ji ewladêd wî Heyderî zêde bûyîne nisbet bi bal wî **da** ye Heyderî, **evne** bûne tayifeyek. Û mesela navê yekî **Zilo** bûye herçî ewladêd ji wî mirovî zêde bûne, **nisbet da ye** bi bal **Zîlo/Zeylî/Zilî** gotine. Tayifêd mayî jî bi vî tarzî ne. Mirad ji tayifan **eve ye**: Her tayifeyek kurê **babekî bûyîne**. Û bi mirûrê eyam, her yek **bûyîne** ev qeder mal. Îcarê ew tayife jî bi **heseb** nêzûkî û bira û pismamiya wî zemanî xîreta yekûdû **dikêşin** û eger **dûr in**, li yekûdû nabine xweyî. Qebîle û tayife **avne** ku beyan bûn.

Û lefzê **kurd** û **ekrad** eslê **wê girde** yanî berhev û **cem'kirîn**. Bi **wê [yan jî "boy"]** munasebetê ku ew **e'rab** bûyîne cîranê Îran û Fars û Xuresanê. Êdî ji lîsanêd wan tayifan **yeko yeko** berhev û cem' û exz kirîne û hêdî hêdî zimanêd **xo [yê]** qedîm ku 'erebî ye terikandîne.

Me'alûmî cenabêd talib û naziran bibitin ko ew tewayifêd **Eqradan** ji tewayifêd **Erebêd** bedewî êd berê ne. Ko zemanê mazîyê **de** ji wan tayifêd **Ereban** miqdarek cuda bûyîne û bi wan kenaran **da** bi eyal û etfal hatine û hemû qebîleyek bûne. Û berê lîsanê wanî jî bilumûm zmanê Erebi bûne û yek ta'ife bûne. Heta wî zemanî lefzê Kurdistan tune bûye. Paşê weko hatine van etrafêd xalî û sînorêd Îran û Xoresanî ew merovêd hatî mesela çend in elbette her yekî navek heye. Heyder, mesela navê yekî bûye. Herçî ji ewladêd wî Heyderî zêde buyîne nisbet bi bal wî daye Heyderî. **Ewana** bûyîne tayifeyek û mesela navê yekî **Zeylo** buye, herçî ewladêd ji wî merovî zêde bûyîne **nesebet** dayîne bi bal **Zeylo, Zeylî Zeylî** gotine. Ta'ifêd mayî jî bi vî tarzî ne. Mirad ji ta'ifan **eviya** her ta'ifeyek kurê **bavekî bûne** û bi mirûr eyam her yek buyîne **ew** qeder mal. Îcarî ew ta'ife jî bi **neseb** nêzûkî û bra û pismamiya wî zemanî xeyret a yekûdu **dikişin** û eger **dûrin** li yek û du nabine xweyî, qebile û tayfe **ewna** ko beyan bûn...

Û lefz **Kurd** û **Eqrad** eslê **wî girde ye**. Yanî ber hev û **cem'î kirine**. **Bo** munasebetê ko ew **Ereb** bûyîne cîranê Îran û Farişî û Xoresanî, êdî ji lîsanêd wan tayfan **yekûyekû** berhev û cem û exz kirine û hêdî hêdî zmanêd **xwe** ê

Û **bi mirûrê** zeman û bûrîna **eyamê**, bûyîne hinde 'eşayir û qebayil û tayife.

Ev navê wan ku maye kurd û **ekrad**, ev sebeb e ku zimanê berhev yanî mexlûtî ye, yanî **girdkerde** ye ji **faris û** îranîyan e. Îcarê **ev tayifene** ji etrafan bi navê kurd û **ekrad** hatîne navdanê û bûyîne miletekî me'lûm.

Em zimanêd wan jî bi heseb cih û mekan be'zê îxtîlaf tê heyîn. Lewranê lîsanê 'ereb û **faris** we **saîre** jî dîsanê **cuwî** muxayîret heyîn. Mesela lîsanê ehlê Hicazê û Misrê û 'erebêd bedewî naşibine yekûdû. Û zimanê farisiya derî û pehlewî û 'Iraq û Azerbaycanê naşibine yekûdû. Lîsanêd **ekradan** jî **cuwî tefawut** heyîn.

Û **ekrad** qewî zêde nesl û neseban hesêb dikîn. Û **umera** û axayêd wan be'zen seyid û be'zen sehabzade heyîn: Wekû 'Ebbasî û Xalidî û **Enesî** û Merwanî, ji **vane** tê heyîn. Wekî dinê ekserêd **ekradan** heta heft **baban** navêd ecdadêd **xo** dizanin û xizm û eqrabayetî winda nakin. Mesela xizm û pismamê yekî li Şamê û Misrê heye. Bab, ewî xizmî û ewî pismamî ji bo kurê **xo** wesyet dike ku li filan welatî û filan gundî, ji filan tayifeyê, **navê eve** xizm û pismamekî me heye, îqtîza bike. Ew jî dîsanê **ewê wesyetê** ji boy ewladêd di **xo** dikin.

Û eger şayed **ekradan xûndarî weyaxo** de'wayekî maye di welatekî

qedîm ko Erebi ye terikandine û **mirûr** zeman û borîna **îyamî** buyîne hinde eşayir û qebaîl û ta'ife...

Ew navê wan ko maye Kurd û **Eqrad** ew sebeb e ko zmanê berhev, yanê mexlûtî ye. Yanê **gird kirdi** ye. Ji **farisî** û îraniyan. Îcarê **ew tayfana** ji etrafan bi nav Kurd û **Eqrad** hatine navdan û buyîne miletekî **meallûm...**

Ew zmanê wan jî bi heseb cih û mekan bazê îxtîlaf tê heyîn. Lewranî lîsanê Erebi û **Farisî** û **sair** jî dîsanê **cezwî** muxayîret heyîn. Mesela lîsanê ehlê Hicaz û Misrê û Erebiêd Bedewî naşibine yekûdu. Û zmanê Farisiya derî û Pehlewî û Iraq û Azerbeycanê naşibine yekûdu. Lîsanêd **Eqradan** jî **cezwî tefewat** heyîn...

Eqrad qewî zêde nesl û neseban hesêb dikin û **amare** û axayêd wan bazen seyyîd û bazen sehabzade heyin. Weko Abbasî û Xalidî û **Ensî** û Merwanî ji vana tê heyin. Wekî dinê ekserêd **Eqradan** heta heft **bavan** navêd ecdadêd **xwe** dizanin û xizm û eqrabayetî winda nakin. Mesela xizm û pismamê yekî li şamê û Misrê heye **bav** ewî xizmî û ewî pismamî ji boy kurê **xwe** wesayet dike koli filan welatî û filan gundi ji filan gundi ji filan tayifeyî **navî ew e**, xizm û pismamekî me heye îqtîza bike ew jî dîsanê **ewî wesîyetî** ji boy ewladêd di **xwe** dike...

Û eger şayed **Eqradan**

da, digel mirofekî hebî, dîsanê **bi weqt** û tarîx û bi tefsîl, **dîsanê** (1) **ewê de'wayê** ji boy ewladêd **xo** dibêjin, **wesyet** dikin. 'Adetê wan ku eger yek ji wan mesela biçite **xurbetê** rastîya esl û neseba **xo zû bi zûrî** (**bi zûyî**) ji boy kesekî nabêjin. Lewranê ihtiyat dikin ku nebe **xûndarî**, **weyaxo de'wêdarîyek kevin** ji neseba wan **biderkeve**. Xulase, de'wa di nêva wan **da kevn** zayî' nabê, heta heft **baban** de'wa dajon.

Û **ekrad** qewî hweybext [xweybext] (2) dibin. Eger mirofek qebahetekî mezîn bike û biçe **xo** bavêje bextê yekî, elbette ji qusûra wî dibûrîn. Û bi bext sondê dixun û bi cih derew tişteki **naêxine** bextêd **xo**. **Wekî** yekî gote yekî, mesela "Ev şola weha nebûye", wekû ewî got ku "Di bextê min **da bibe** ku weha ye", elbette pê bawerî dikin. Yanî **be** bext sondxwûrîn di nêqa [nêva] wan **da** qewî mezîn e. **Wekî** mesela mirofekî dixwezîn [dixwazîn] bikujîn, **xo avêtiye** bextê yekî, elbette be çî terzî bibe, dê wî mirofî ji kuştinê xilas **bikit**.

'Adetê **ekradan** in, di şerî **da** wekû mirofek ji hespê ket û esîr bû, êdî **mumkun** nîn e ewî nakujîn.

Û 'adetêd **ekradan in**, biçikan (**biçûkan**) bêşik kertme dikin. Mesela wekû ji boy mirofekî keçek welidî û ji boy mirofekî jî kurek welidî, heman di roja **wîladetê da ewê keçê** didine wî kurî. "Bêşik

xwîndarî û yaxûd dawayekî maye di welatekî **de** digel merovekî hebî, disanê **weqît** û tarîx û biftesîl **ewî dawayî** ji boy ewladêd **xwe** dibêjin, wasiyet dikin. Adetê wan ko eger yek ji wan mesela biçite **xerîbetê** rastî a esl û neseba **xwe bizûwî** ji boy kesekî nabêjin. Lewranê ihtiyat dikin. Ko nebe **xwîndarî û ya dawaîdarek kewn** ji neseba wan **biderkevin**. Xulasa dawa di nêva wan **da kewn** û zayî nabe. Heta heft **bavan** dawa dajon...

Û **Eqrad** qewî xweyî bext dibin. Eger mirovek qebahatekî **mezîn** bike û biçe **xwe** bavêje bextê yekî elbette ji qisûra wî diborin û bi bext sondê dixwin û bi cih derewî tişteki **naxine** bextêd **xwe**. **Weko** yekî gote yekî mesela ew şola weha ne buye weko ewî gote ko di bextê min **de be** ko weha ye elbette pê bawerî dikin. Yanê **bi** bext son xwarin di nêva wan **de** qewî mezîn e. **Wekî** mesela: Merovekî dixwazitin bikujîn, **xwe avêtine** bextê yekî, elbette bi çî tarzî bibe dê wî mirovî ji kuştinê xilas **bikin**...

Adetê **Eqradan** di şerî **de** weko mirovek ji hespê ket û esîr bû êdî **mimkûn** nîne ewî nakujîn. **Adetên Eqradan ên piçûkan** (**piçkan**) bêşik kertme dikin, mesela: Weko ji boy mirovekî keçek welidî û ji boy mirovekî jî kurek welidî hema di roja **weladitîyê de ewî keçî** didine wî kurî. Bêşik

ketme” dibêjîn. Heta ku ew kur û keç balix dibin, êdî meni‘ û poşmanî nabit. Îcarê daweta wan herdukan dikin.

Û di **nêv ekradan** berdêlî jî dikin. Mesela yek xweha **xo** dide yekî û xweha wî jî ji boy **xo** distîne. **Weyaxo** keça **xo** dide yekî û keça wî ji boy **xo** distîne. Yanî mubadele dikin. Her kesek ji wan mesrefa daweta **xo** dibîne.

Ekserê ekrad, dawetan di weqtê biharan dikin. Lewranê zivistanan cihêkî tenha ji boy bûk û **zavayî** tunîn e. Wekî dawetê dikin li goşeyekî konî, **weyaxo** li goşeyekî malê perde girêdidîn, ew bûk û zava li pişta perdeyê gerdek dibin. **Wekû** dinê ‘adetêd wan **in** wekû cih tun bin bab û kur û bira digel jinêd **xo**, hemû di malekê **da radizên** û radibin. Û keç û bûkêd wan ji kesekî narevîn.

Biharan wekû **bistê (bîstê)** (3) meha adarê elbette bi der dikevin konan. Lakin nêzûkî cihê qişlaqê, ji wî ra “warê kozê” dibêjîn; heta ku pezêd wan **ji ziyê** xilas dibin. Paşê ji wî warî bar dikin. Warê **bihar** û payîzan, newal û cihêd talde û deşt dibin. Lakin warê havînê zozan û çiya dibin. Her deh û bîst û seh û çil malan mexsûs warek **heyîn**. Kesek li warê kesî **naêwire** û lê nabê xweyî. Û carnan dibê ku li ser wan, di nêva wan **da nîza**‘ peyda dibê.

Û ji bo birekî malan ku digel hevdû **diêwirîn**, “zome” dibêjîn. Û axayê **wê birê** û rîspîyê **wê cema’etê**

kertme dibêjîn. Heta ko ew kur û keç balix bibin, êdî men û poşmanî nabit. Îcarî dawata wan herdukan dikin.

Û di **nava Egradan** da berdêlî jî dikin. Mesela: yek xweha **xwe** dide yekî û xweha wî jî ji boy **xwe** distîne, **weyaxût** keça **xwe** dide yekî û keça wî jî ji boy **xwe** distîne. Yanê mibadele dikin. Herkesek ji wan mesrefa dawata **xwe** dibîne.

Ekserî Egrad dawatan di weqtê Biharan dikin. Lewranê Zivistanan cihêkî tenha ji boy bûk û **zava ê** tunîne. Wekî dawetê dikin li goşeyekî konê **weyaxût** li goşeyekî malê perde girê didin. Ew bûk û zava li pişta perdê gerdek dibin. **Wekî** dinê adetêd wan **ên** weko cih tunebin, bav û kur û bra digel jinêd **xwe** hemû di malekî **de radizin** û radibin û keç û bûkêd wan ji kesekî narevin.

Biharan wekî **bistî** adarê elbet biderdikevin konan. Lakîn nêzûkî cihê qişlaxê ji wî re warê kozê dibêjîn. Heta ko pezêd wan **zê yî** xilas dibin, paşê ji wî warî bar dikin. Warê **biharê** û payîzan newal û cihêd talde û deşt dibin. Lakîn warê Havînê zozan û çiya dibin. Her deh û bîst û sîh û çel malan mexsûs warek **beye**. Kesek li warê kesê **nahêwêre** û lê nabe xweyî. Û caran dibe ko li ser wan di nêva wan **de nîza** peyda dibî û ji boy birekê malan ko digel hevûdu **dihêwêrin**, Zome dibêjîn. Û axayê **wî birr î** û rî spî ê

kî ye, mesela Elo û Heso. Ji boy wê zomeyê “Zoma Elo” û “Zoma Heso” dibêjin. Birêd wan jî wekû gundan nav heyîn. Zoma filankesî û zoma filan axayî dibêjin. Mesela îqtîza bike ku tu **zomekî** pirs bikî ji boy te salix didîn, diçî û dibînî.

Şayed wekû tirsek hebê, îcarê ew êl hemû berhevê çiya weya deşteki dibin û li ser **hevdû**, nêzûkî yekûdû konan hêşî li hêşiyê wekû orduyan vedikirîn [vedigirin]. Ji **boy vê** berhevîya konan ra “**ebr**” dibêjin. “Filan **eşîrê bi ebr** danîne” dibêjin. Wekû şayed tîrsa wan jî kenarekî **da** heye, jî çar kenaran rîya yek se’etê yek çend siwaran **qirawêl** datînin û bi **xo jî** bi şev **ranazên**. Hespêd wan hazir, **lixabkirî** û bi **xo jî** çekgirêdayî guhdar in. Heman jî kenarekî deng û pêjneke peyda bûyî **hemû** siwar dibin û bi **wî** kenarî **da** diçin. Eger **yeqîna** hatina dujminan kirîn, defa wan î hawarê heye, bi şev û bi roj çî weqtê dibe, **ewê** defa hewarê li cihekî bilind didine qutan, ku deng bigihê hemû zomeyan. Wekû dengê defê peyda bûyî, êdî mumkun nîn e kes bi **şû ve** namîne. Siwar û peya bi kenarê defê **da** tèn.

Û jinêd wan malan jî heryek konistûnkî digrîn destêd **xo** û hazir dibin. Guhê jinan jî li şerî ye. Dîtin ku şer hate **nêzûka** malan, ew jîn jî bi wan istûnkonan diçine **şerî** û yariya mêran dikin. Dibê jîn jî têne birîndarkirîn û kuştin. Yanî wekû şerekî weha li ser malêd **ekradan**

wî cimaatî kî ye. Mesela: Elo û Heso ji boy wî Zomeî Zoma Elo û Zoma Heso dibêjin. Birrêd wan jî weko gundan nav heyîn. Zomea filan kesî û Zome a filan axayî dibêjin. Mesela: Îqtîza bike ko tu **zomeyekî** pirs bikî ji boy te salix didin, diçî û dibînî.

Şayed weko tirsek hebî îcarî ew êl hemû berhev çiya û deşteki dibin û li ser **hevûdu** nêzûkî yekûdu konan hêşî li hêşiyê wek ordiyan **vedigirin**. Ji **bo vî** berhevîya konan re **ABÎR** dibêjin, filan **aşîrî bi Abir** danîne dibêjin. Weko şayed tîrsa wan jî kenarekî **de** heye jî çar kenaran rîya yek saetî yek çend siwaran **qerewal** datînin. Û bi **xwe** jî şev **ranazin**. Hespêd wan hazir **lixab kirî** û bi **xwe** jî çek girêdayî guhdar in. Heman jî kenarekî deng û pêjneke peyda bûyî **hemî** siwar dibin û bi **vî** kenarî **de** diçin. Eger **yeqîna** dijminan kirin, defa wanî hewarê heye, bi şev û bi roj çî wextî dibe **ewê** defa hewarê li cihekî bilind didine qutan ko deng bigehê hemû Zomeyan. Weko dengê defê peyda bûyî êdî mimkûn nîne kes bi **suva** namîne siwar û peya bi kenarê defê **de** tèn. Û jinêd wan malan jî her yek konistûnekî digirin destêd **xwe** û hazir dibin, guhê jinan jî li şerî ye. Dîtin ko şer hate **nêzûkî** malan ew jin jî bi wan istûnkonan diçine **şer** û yariya mêran dikin. Dibe jin jî têne birîndar kirin û kuştin, yanê weko şerekî weha li ser malêd **Eqradan**

biqewimîn, jîn û mêr şerî dikin. Û eger şeyed hezar siwarêd **dijminan** bêne ser çil-pênçe malêd **ekradan** dîsanê **qadir** nabin ku ewan belav bikin. Lewranê di nêva **ekradan** eve meselekî **meşhûr** e ku “Şerê **kopekan** li ser dêlan in.”

Ekrad di şerêd ser malan bi xeyr ji mirin çare nîn in; elbette heta mirin şerî dikin. Û ‘adetekî din ê di şerêd ser malan **da** heyîn; wekû **ekradan** dibînin ku ‘**edû** zaf û ew bi **xo** hindik in, her kes siwar dibin û ji **nêva** malan bi der dikevin û **xo** didine çiya û kerrekî asê. Û malan dispêrine dijminan û bi **xo** ji dûr ve difekirîn û çek û alatêd **xo** **yê** herbê durust dikin û digel **yekûdû** qewl û qirarê dikin ku nerevîn. Yek ji wan dibêje ku “**Êne gozê** [kurê] (4) min Miho maye di dest dijminan da”. Û yek ji wan dibêje ku “Way keça min î Eysê maye di dest dijminan da”. Weha xîretê didine **yekûdû**.

Îcarê dijmin jî bi talan û malhilgirtinê mijûl dibin. Bilanî **zaf** bin jî, ew xweyêd wan malan bi carekê hucûm û **êrûşê** tînine dijminan. Û jinêd wan jî di nêva malan **da** bi **kêziman** arîkarîya wan dikin. Elbette dijminan perîşan dikin.

Û tayifeyêd **ekradan** wekû **xûndarî** nebitin, qewî mayilê qetlê nîn in. Di şerî **da** weya di rêbirê **da** mirovan digirîn û dişelînin, berdidîn.

Lakin ji boy şola xirab elbette mirofan dikujîn. Heta jinêd **xo** û keç

biqewimin jin û mêr şerî dikin. Û eger şayed hezar siwarêd **dijmin** bêne ser çel pênçe malêd **Eqradan** dîsanê **qedr** nabin ko ewan belav bikin. Lewranî di nêva **Eqradan** ew meseleyî **menşûr** e. “Şerê **kûçikan** li ser dêlan in.” **Eqrad şerêd** ser malan bi xeyr ji mirin çare nînin, elbette heta mirin şerî dikin. Û adetekî dinî di şerêd ser malan **de** heyin, weko **Eqrad** dibînin ko **dijmin** zehf û ew bi **xwe** hindik in, herkes siwar dibin û ji nêva malan biderdikevin û **xwe** didine çiya û kerrekî asê. Û malan dispêrine dijminan û bi **xwe** ji dûr ve **difkirin** û çek û aletêd **xwe** î herbê dirist dikin û digel **yek û du** qewl û qerarê dikin ko nerevin. Yek ji wan dibêje ko **eynegozê** min Meho maye dest dijmanan **de** û yek ji wan dibêje ko “wayê keça min Eysê maye di dest dijminan de.” weha xeyretê didine **yekodû**, îcarî dijmin jî bi talan û mal hilgirtinê mijûl dibin. Bilanê **zehf** bin jî ew xweyêd wan malan bi carekî hicûm û **êrişê** tînine dijminan û jinêd wan jî di nêva malan **de** bi **kiziman** arîkarîa wan dikin, elbette dijminan perîşan dikin.

Û taîfeyêd **Eqradan** weko **xwîndarî** nebitin qewî mayilê qetlê ninin. Di şerî **de** weya rêbirê **de** mirovan digirin û dişelînin, berdidin. Lakîn ji boy şola xirab elbette mirovan dikujîn. Heta jinêd **xwe** û keç û da û **xweha xwe** jî elbette qetl dikin. Û jin jî ji boy şola xirab mesela:

û **da** û **xwehêd xo** jî elbette qetl dikin. Û jîn jî ji boy şola xirab, mesela da keça **xo** û **xwesî bûka xo** û **xweh xweha xo** bi şev dixeniqîn **weyaxo je'rê didenê** û qetl dikin. Ji axa û rîspîyêd wan kesek pirsiyarî nakin ku te ji **boy** çî **eve** kuşt.

Waqî'a revîna jinan ji mêran, di nêv wan **da** 'adet nîn in. Jîn û keçêd wan ji kesî narevîn, wekû milletê efrencîye ew jî serbest in. Lakin bi **wê î'tîqadê** ku ew xirabîyê nakin. **Îlla** eger yekê ji wan şola xirab kirîn, çare nîn in, elbette **ewê** dikuji.

Û jîn û keçêd wan qewî **şolker** û cesûr û xweyhuner in. Kulav û berr û xalî û têran çêdikin. Û malêd ku xulam **tunîn in, hesêb ke** xulamê malê jin in. Herçî şola malê bibe, jîn dikin. Heta hespêd **mêrêd xo** jî jîn **xweyî** dikin. Mêr bi xeyrê şerî tevê şolekî qewî nabin. Bazar û dayin û **istandin** jî bi jinan dibin. Û tene meclisê û îqtîza bikitin tevî şewr û **umûrê** dibin û kerem û **îkrama xelqê** dikin.

Da, keça **xwe** û **xwesî bûka xwe** û **xweh xweha xwe** bi şev diqeniqîn. **Weyaxût jarî didinê** û qetl dikin. Ji axa û rîspîêd wan kesek pirsiyarî nakin ko te ji **bo** çî **ewa** kuşt...

Weqî'a revîna jinan ji mêran di nîv wan **de** adet nînin. Jin û keçêd wan ji kesî narevin. Weko milletê Efrencî ye. Ew jî serbest in lakîn **boy îhtîqadî** ko ew xirabîyê nakin. **Îllah** eger yekê ji wan şola xirab kirin, çare nînin elbette **ewî** dikuji.

Jin û keçêd wan qewî **şolekar** û cesûr û xweyî hiner in. Kulav û berr û xalî û têran çêdikin û malêd ko **xulam tê nînin besêbekî** xulamê malê jin in. Her çî şola malê bibe jin dikin, heta hespêd **mêrên xwe** jî jin **xwedî** dikin. Mêr bi xeyrî şerî tev şewlekî (şol) qewî **nakin**. Bazar û dayin û **standin** jî bi jinan dibin û tene meclisê û îqtîza bikitin tevî şewr û **îdare û emûrî (derbaz kirin)** dibin û kerem û **êqrama mêvanan** dikin.

Notên binî

1. Di ya Îzolî de peyva "dîsanê" nehatiye nivîsîn.
2. Wîsa xuya dibe ku nuqtêya "x"eya erebî bi şaşî nehatiye nivîsîn.
3. Îzolî li vir peyva "bîstê" ku di nava kevan de ye, nenivîsiye.
4. Di metna erebî de "gozê" hatiye nivîsîn. Bi tegmî na min, diviyabû "kurê" bête nivîsîn. Dibe ku nuqtêya "r"yê û xeta li ser "k"eya erebî zêde bin. Lewra piştî vê hevokê tê gotin, "Keça min î Eysê ..." Peyvên "keç" û "kur" munasibî hev in.

Weqtê ekrad ji warekî bar dikin û diçine warê dinê, malêd xo bar dikin. Û çend siwarêd wê zomeyê heyîn, hemû rimêd wan li ser milan û destvedayî li berayîka koçan diçin û jîn koçan dajon. Ew pez û revo û garanêd wan li pê koçan diçin. Ji wan siwaran ra ‘peşkoçî’ [pêşkoçî] dibêjin. Şayed wekû dijmin ji pêş ve peyda bebî ew serî li berayîkê dikin. Wekû bûye şêriya û jinêd di nêva koçan da barêd xo berhev cihekî dikin, wekû metresan çêdikin û hewş dikin û zarokan dikine nêva wê hewşê. Û tiving û tepançan hildigrîn û muntezirê şerêd mêrêd xo dibin. Eger siwarêd wan li dijminan xalib bûn, qewî qenc e, bi xo jî dîsanê koçêd xo dajon û diçin. Û eger şayed dijmin li siwarêd wan xalib bûn, ew siwar direvîn û tèn dikevîne nêva koçêd xo hisarê û dîsanê şerî dikin, heta hewarî ji cihekî peyda dibe. Lewranê ‘adetê ekradan e, heman boy şer elbette ew mirofan ji boy hewarê bi etrafan da belav dikin.

Û jinêd maqûlêd wan jî roja koçê li hespê çê siwar dibin û çek û silahan girêdidin û rim digrîne destêd xo û ew jî dikevîne pêşîya koçêd bixeml û serbizêr. Bi vî terzî dikevîne pêşîya koçêd xo. Lakin jinêd feqîran zarok jî li goşê koçêd xo dajon û diçin.

Û her zomeyekî du nobedar heyîn. Bi heq, şevê her yek li kenarekî malan dipên. Wekû hisa dijminan bikin, dikine gazî û xelqê zomeyê radi-bin û diçine wê semtê.

Wekû bi şev şayed dost û mêwan bêne zomeyê, ew nobedar diçine berayekî gazî dikin wekû qerawilêd orduyan. Paşê, ewan tînine nêva zomeyê. Çi qeder mêwan bêne zomeyê, mêwanê axayî û rîspî ne. Îlla eger zaf mêwan heyîn, îcarê serê konê du û sê û zêde siwaran belav dikin. Û axayêd wan û maqûl û dewletlûyêd wan hemû xweyqehwe û taxum in. Eger şayed mêwanî jî qehwe û taxum hebî, nahêlin ku taxuma mêwanan bi der kevin û bidne şolê. Belkû qehwe û taxuma xweyê malê dixebîte. Û axa û rîspîyan çît û perde heyîn. Yanî nîva konê birrîne û çît û perde kêşane û kirîne yalê mêran û dîwanxane. Mêwan li wê derê sakin dibin. [Ji bo] mêwanan berx û pez ser jê dikin û îkram dikin.

Û axa û rîspîyêd her zomekî melayek di malê da dibin ku bang didin û bi cema‘et nimêjan dikin û dersa zarokêd wan dibêjin. Û îqtîza bike nikah û birîn û mirîd (mirîyêd) wan li ser dixûnin û defn dikin. Ew zome jî her çî mîqdar zikatêd pez û dirafêd wan û fitreyêd wan heyîn, hemû didine wî melayî û zêde jî îkram dikin. Di salekî da melayê zomeyekî du-sê hezar quruş bi dest dikevî. Wekû di malekê da mewta hebit, cilêd wî mewtayî jî didine melayî û jaran, ewan cilêd wî nafroşin.

Li mewta û ciwanan zêde şîn û matem digirîn, libasêd reş werdigirîn û serêd xo reş girêdidîn. Û jîn û keç û xweh guliyêd xo jê dikin. Qewî zêde matem û şîne dikin. Eger ew mirî mir e û xweyhesp û çek û taxum e, hespêd wî dixemlinin û çek û sîlahêd li ser hespan girêdidîn, ewan hespan li berayîkê cenazeyî dikêşin. Û ew jîn û keç û da û xwehêd wî, dil û lawijk dibêjin, “Wey li min babo, wey li min bira, wey li min pismam” dibêjin û digirîn û deng û sedaya bavobavoya wan diçite felekê. Yanî mirofekî biyanî jî rast şîna wan bêtin, elbette dilê wî disoje û digirîn. Bi vî terzî bi ihtîşam dibin, çal dikin. Û ew jinêd ku guliyêd xo birrîne, ewan guliyan li ser qebra wî meytî, li kêlêd wî dilawisîn. Heta panzde rojan sube û êvaran jîn û mêr û cîran têne zîyareta qebra wî dixwûnin û digirîn, sedeqe û xêran dikin. Ew mirî eger mêr e, libasekî wî beqîmet mesela qapût û kurk weyaxo şalekî bibiha davêjîne ser cenazeya wî. Û eger jin e, dîsanê libasekî wê zîqîmet [biqîmet] davêjîne ser cenazeyî û dibine qebrê. Ew libasê ku avêtine ser cenazeyî, ew ji boy melan in. Ew dibin û mela difiroşin û li yekûdû parî ve dikin.

Heta sê rojan zad û te‘am li mala meytî nayête patin. Cîran zadî tînin û be mêr û jinêd wê malê didine xwarîn. Heft roj ku tamam buyîn, cîran diçin û libasêd meytî dişon û paşê didine jar û feqîran. Wekû bîst roj bûyî, mala meytî zaf helwa û zadan çêdikin û cîran û gundî û biyanîyan dikine gazî û be xêra meytî didine xurîn û belav dikin. Û ew libasêd reş heta şeş mehan, weyaxo salekî li ser ehlê meytî dimînin. Ew ehlê meytî heta jî şîne bi der nekevin, naçîne dawet û kêfxweşîyan. Wekû mudeyê huznê tamam bûyî, axayêd wan, weyaxo cîran û xizmekî wan ji boy her yekî ehlê meytî anegora halê xo tişteki tîne û reşêd wan hildigre, jî şîne bi der dikevin. Lakin eger ew meytî begzade, weyaxo axa û mirofekî kîvş bûya, elbette paşî panzde rojan hakimê wî welatî xelatek hazir dikirîn û dişande pê warisê meytî û tînane huzûra xo û digotîne; “Emrê Xudê ye, bilanî tu xoş bî, mirîn rîya me hemûyan e!” Ew xelat li wî warisî dikirîn û jî reşê bi der danîn.

Mirofêd maqûl, xêvetan dibin û li ser qebra meytî vedidîn. Anegora halê wî, mehekî û panzde rojan xêvet dimîne û mela bi ucret Qur‘anê dixûnin. Û rojê du dahnan zad û te‘am dibine xêvetê, ew mela dixwin.

Wekû dinê ekrad zêde bi kîn û kidûret û xwey’inad in. Eger dijminî digel yekî heyîn, daîm li zurra wî digerîn. Û qesda xisara wî dikin û diçine rîya yekûdû û hevdû birîndar (dikin) weya dikujîn. Eger qet nabî ji penî ve, bi şev ji dûr ve, ji kolikê weyaxo di xêvê da razayî bi gule li hevdû dikujîn. Ew jî nebî, bi dizî agirî bere malêd yekûdû didîn, weyaxo bi xef

rastî hesp û dewe û dewarêd yekûdû bibin, ewan heywanan pê dikin. Û eger mumkin dibe, belkû jî je'rê jî tevî zadêd yekûdû dikin. Xulase dijminayîya wan qewî bela ye.

Ekserî jîn, weya mela, weya şêx dikevîne nêva wan neyaran û li hevdû tinin. Lewranê tayifeyêd ekradan qewî zêde qedrê mela û şêxan û jinan digrîn. Ew hersê tayife herçî ricaya bikin ewan mayûs nakin. Zaf dibe du tayife li meydanê dikine şer û ji herdû kenaran jî telefîyat, bûye. Wekû jîn bê û laçika xo raxîne nêva wan, elbette ew du tayife ji yekûdû dibin. Weya mela û şêxek bê, bikeve nêva wan, def'a şerî dibê. Û ekrad nêzûkî malêd mela û şêxan nabin û nadizîn û xirabiya wan nakin. Dibêjîn ku ew ocax in, paşî bi me ve didîn. Îtîqada wan eve ye. Lakin ekserêd şêxêd wan cahil û nexwendî ne. Goya berê ecdadêd [wan] şêx bûne.

Wekû mirovek qebahetekî bikit û bireve xo bavêje malêd şêxan, xilas dibe.

Keçrevandin di ekradan da eyb nîn e, lakin bi riza. Bê riza keçê nabî. Wekû keç û kurî hevdû hebandîn û bab da keçê nedane wî kurî, îcarê [kur] ewê keçê direvîne, dibine mala axayekî weyanî şêxekî. Û xweyêd keçê be pê dikevin. Eger li rê rast hatî, keçê û kurî herduyan jî dikujîn. Eger rast nehatî, selamet çûn, êdî xweyê keçê qadirê tişteki nabî. Îcarê ew axa û ew şêx ku keç û kur çûyîne malê, dikevîne mabeynê. Eger malê wî kurî jî tune be, ji kisê xo weyanî ji cîranan miqdarekî malê û dirav berhev dikin û dibin, diçine mala xweyê keçê û rica dikin. Elbette sulha wan dikin. Û ewê keçê li wî kurî mar dikin û dijminî radibe.

Û keç û jinêd ekradan bi xo bi nefsa xo muxtar nîn in. Belkû bab û birayê keçê wekû ew dayîne mirovekî, keç qadirê men'ê nabî. Elbette xwah-naxwah, keçê dê wî mirovî bistîne, bilanî keç ji wî huşnûd [xuşnûd] jî nebî. Eve 'adete şer'îye nîn e, belkû şermîye ye. Di ekradan qewî eyb e ku bab û bira bidit, ew bebêjîn ku em nastînin.

Kumreşî û bedgumanî li nik tayifeyêd ekradan tunîn in. Mesela jinêd wan î ciwan digel mêrêd bîyanî xeber dîn û bikenin û rûnîn û rabin, ew bedgumanîyê nakin. Îlla ku xirabî bibînîn û yeqîn bikin, elbette bîla mecal, ewê jinê dikujîn û mêrî jî. Êdî ewan xwûn tune. Kesek li wan nabê xweyî.

Ekrad li hemû qebahetan dibine xweyî, lakin li şola xirab nabine xweyî. Lewranê li nik wan qewî eyb e.

Û 'adete ekradan xwûndar şîrê xo davê ustuwê xo û topekî cawî didite bin çengê xo û diçit xo davêjite mala xweyê xwûnê, ku "eve şîr û eve kafen. Yan min bikuje, yan min aza bike." Îcarê xweyê xwûnê elbette wî xwûndarê xo aza dike.

Û ekrad tebîetcahilîn heyîn. Bi fal û muncim û hindek tiştan bawerî dikin û hindekan se‘d û hindekan şom dizanin. Û be nusxeyan bawerî dikin. Bi wê dereceyê ku çewanî miletê efrenc bê hekîm nabin, ew jî bê nusxe nabin. Herçî îllet û derd dibî, bilanî bibe, elbette niwişt dikin.

Lakin îtîqada wan bi hekîman nîn in û guhdariya hekîman nakin. Ew dibêjin, “hekîm Xudê ye, derd û derman herdu jî ji nik wî ne.”

Welakin ekrad jî wekû efrencan qewî zêde ji nexoşî û webayê û halê û illetêd ku sarî ne, ditirsin û bi dûr dikevin. Heta kur û bab û bira eger yek jî wan bi vê merezê bimirîn, ewî mirîyî diterikînin, bi xo hilnagirîn. Diravî didine melan, mela diçin ewî mirîyî defin dikin û eger mela jî tune bin, wisanî ewî mirîyî di cih danî dihêlîn û bar dikin, direvîn. Û eger di gund û zomeyekê da weba hebit kes naçite wî gundî û zomeyê û mirofêd ku jî gundê nexoşî tê heye, nahilin nêva xo û naçin û nabin. Ew jî wekû efrencan îhtîrazî ji naxoşî dikin, lakin ne ji hemû naxoşîyan. Belkû jî weba û qolêre û halê, evne ku sarî ne, êdî ji naxoşêd mayî narevin.

Û ‘adetêd jinêd wan in ku li ser zarokêd xo rûtînin û naçine şû.

Wekû dinê ekserêd wan mirina di muharebe û şerî da temenî dikin. Eger mirofek bi ecela xo fewt bibe, dibêjin, “mixabin, xwezîya di şerî da fewt bibûya!” Wekû dinê ekrad di şerî da jî yekûdû şerm dikin. Eger di dil da jî cesaret tunebin, elbette ji şerma oldaşan dê şerî bike weyane bête kuştin. Ekrad di şerî da gazî yekûdû dikin û xîret didine yekûdû. Eger mirofek birceve, paşî êdî qedrê wî namîne û jîn, mêr tiv dikin ruwêd wî û mesxere pê dikin û di meclisan da qaweyê di qûna fincanê da didine wî mirofê revî. Û mudyekî jina wî jî ewî nadite xeberdan û her rojê ewê pîs dikin. Yanî di ekradan da di şerî da revîn, jî mirinê bedtir e. Mirof bi mirinê razî ye, lakin bi wan rezaletan razî nîn e. Ji boy vê xeberê narevîn. Û zaf tayife heyîn ku dayim digel yekûdû dijminîn û li kê derê rastî yekûdû bên, eger firsetê bebînin hevdu dikujîn. Û bi xo ser bê emrê hakimî leşker dikin û diçine ser malêd yekûdû û talan dikin.

Lakin jîn di nêv wan da murexxes in, ew destê xo li jinan hilnagirîn û edawetê digel jinan nakin û qewî zêde xatira jinan çav ra dikin. Jîn biçerîca xûnê jî dibexşînin.

Û di welatêd Buhtan û Hekarî û Behdînan, di nêva xwecihîyan da jî zaf neyarî dibe. Du gund weya du qeza weyaxo di gundekî da nivî kinarek û nivê dinê kenarek dibin û digel yekûdû rojekî û du-sê şerî dikin û ji du terefan mirof telef dibin û çeperan girêdidin û şeşxanan davêne yekûdû. Esla mêrek nikare ji mala xo bi der keve. Dîsanê jîn di nava gundî digerin û diçine malêd yekûdû. Jîn murexxes in, kesek ewan nakuje. Îlla ji boy

şola xirab, êdî kes ricayê jî nakin, îlla dikujîn. Wekû wiha nebit, jinêd ekra dan ji xelqê narevîn. Paşê gelek xirabî dibê, lakin ji kuştinê ditirsin. Çawanî bibe ku yek şola xirab dikin û têne kuştin, bê kuştin qet‘en mumkin nabê.

Ekrad rojêd înan seferê nakin, şom dizanin û roja sêşenbe jî nehs dizanin. Wekû mirofek li ser şolekî be, bebehniye, eger carek bî, “sebr” dibêjîn. Elbette wî şolî weyaxo wê seferê nakin. Eger du caran bebehniye “te‘cîl” dibêjîn, ewê zerer nîn e, ewî şolî dikin. Wekî mirovek biçite seferê îbtîda ku ji mala xo bi der dikevid, eger jin bête oxura wan, weyaxo cerê vala bête oxura wan, zaf şom hesêb dikin.

Û nezer heye. Ekrad nezerê rast dizanin û gelek jî ihtîrazê dikin. Goya mirovê ku kose û mûzer û çavheşîn bibe, jî nezera wî mirovî elbette ditirsin. Wekû mirofê bi vî sûretî bibînin ji wî zaf ihtîrazê dikin.

Ekrad di reşê da jî wekû yê berfê di kû rê diçî û dewsê digerin û dizanin wekû bi şev seyêd wan direyîn, ew ji reyîna seyî fehm dikin ku ev seye mirof dîtîye, weyaxo dabe dîtîye. Û be şev guhêd xo didine erdê, guhdarî dikin, jî dûr ve eger siwar bîn, ew ji dengê erdê fehm dikin û bi wî terefî diçin.

Û gelek şolêd wan heyîn goya ewan ceribandîne. Ji wan elametan goya fehma şolekî boyînê dikin. Mesela wekû bizin qemçika xo ber jorî bike, ew dizanin ku wê rojê baran nabare û eger bizîn (bizin) vemçika [qemçika] xo ber jêrî bikitin, ew dizanin ku dê wê rojê elbette baran dê bibarît.

Wekû teyrik bête derê malê û bike gazî ew dizanîn ku dê ji musafirî xeber û cewab bêtin. Wekû kîtîk [kitik] bi destê xo, ruwê xo bimalin ew dizanin ku dê mêwan bêtin. Wekû parî di destan bifiritin, weyaxo ji hêvîrî wekû jin dibirîn girik bifire, ew dizanîn ku dê mêwan bêtin.

Û eger li dora şemalê pirtik peyda bibin, ew dizanin ku dê ji boy wan jî dûr ve kaxiz bêtin.

Û eger solêd wan yekûdû siwar bibin, goya sefer waqî‘ dibê.

Eger nîva destê rastê bixure goya ji boy wan jî cihekî diraf têtin. Eger nîva destê çepê bixwure, elbette dê şerek peyda bebê û ji boy şerî hazir dibin. Eger vapaxa [qapaxa] çavê rastê bavêje, jî boy wan goya mizgîn têtin û şa dibin. Eger vapaxa [qapaxa] çavê çepê bavêje, bela nazil dibitin û mehzûn dibin. Xulase jî boy hereketa tamarêd bedenî hemûyan, heryekî tecrîbeyek li nik wan heye. Eger keskesor li kenarekî peyda bebî [bibî], goya li wê kenarê dibitin erzanî. Û eger êvarî û subeyî sefeqekê sor li damena esmanan peyda bitin, goya li wê kenarê şer û ceng peyda dibitin. Eger navê yekî bi xeletî be mirinê biderkeve goya ew mirof paşê dijî.

Wekû keçek dayîne bi şû, lakin hêj ne birî, mêrê wê bi emrê Xudê mir, ewê jinê şom hesêb dikin û “serxwere” dibêjin. Û zaf kes êdî nabine talibê wê jinê. Îlla eger du caran waqî' bibe, êdî meazellah, kesek ewê jinê naxozitîn. Lakin eger jîn bemre û mêr bimîne, ewê şom hesêb nakin. Bilanî deh caran jî waqî' bibe.

Û îxtîyar û pîrejîned wan ciwanan berhev dora xo dikin û şolêd dinê û umûrêd lazime jî boy wan dibêjin û hewirî wan dikin û li serhatêd [serhatiyêd/serpêhatiyêd] xo jî boy wan neqil dikin ku filan weqtî weha bûye û filan bi vî terzî kirîye û li filan şerî weha bûye. Terz û rism û ayendê şerî ew îxtîyar jî boy lawan neqil dikin û ehwalêd malan û rusûmêd jinan ew pîrejîn jî boy keçan û bûkan neqil dikin û şîreta wan dikin, çewanî mela dera suxteyêd xo didetin. Û ew ciwan jî şîretêd wan digirîn û jî xebera wan bi der nakevin. Wekû şayed şolekî dijwar û zehmet li wan peyda bebîtîn û jî wan kal û pîran tedbîra wî şolî pirsîyar dikin û digel wan şêwrê dikin û jî emrêd mezinêd xo bi der nakevin.

Û ehlê ekrad eger xwecihî û eger rewend, qewî zêde hakimperest û axaperest in. Zêde îtaeta hakimî û mîr û axan dikin. Bilanî hakimêd wan fileyek jî bibitîn, êdî zêde îtaet dikin. Lakin jî hemcinsêd xo dexsê dikin, bi înad û kîn û kidûret in. Eger jî cinsê wan yekî jê ra bibine hakim û axayêd wan îcarê ewî qebûl nakin û îtaeta wî nakin, elbette fesadekî peyda dikin.

Û eger ekrad îhsan û kerem û qenciyê jî yekî bibînin jî bîr qe nakin. Dayim ewê qenciyê di nêva xelqê da, di meclisan da dibêjin û xirabî jî kezalike. Û jî ber ,ewda qenciyê daîm merama wan ew e ku xizmetekî bikin. Û jî ber xirabiyê jî, mubadela wê bi xirabî û heyfê bikin. Ew dibêjin ku qencî jî û xirabî jî winda nabitin. Û di xeberdan û cewabê da bêperwa dibin. Hakim bit jî, elbette cewaba heq dibêjin û natirsin, bilanî ewî te'zîr jî bikin, elbette wê cewabê dê bebêjîtin. Di xeberdanê xweycesaret in. Eger bibine kuştinê jî dîsanê rexmî nîn in. Yanî bi rastî jî kuştinê, wekû milelêd mayî jî kuştinê natirsin, dilêr in.

Hespêd sipehî û cins di nêv wan da heyîn. Çar cins hesp heyîn; kihêl, seglawî, mi'nek. Necdî jî peyda dibin, lakin kêr heyîn.

Û her siwarekî cengê pênc agirî dixebitîne. Cotek tepançe di qebûrê da û cotek tepançe li ber piştan û qerebîne û rim û şîr û sezergan jî li ber tenga hespê da dikin. Xulase siwarekî deh derb heyîn. Wisan siwarêd mahir heyîn ku agir jî agirî nabire, qewî çapik siwar dibin.

Hespêd wan qewî zêde bi dewam û şolker dibin. Lewranê dibêjin şev û rojê lê siwar dibin û zaf zorê didine hespan û di şeran da jî ekrad hespêd

be êlim di'emilinin û çiqas ketibûye tengî, zorê li hespêd xo nakin û dihuşinin.

Hespêd wan î cins şev û rojan ji tirsê dizanrevandinê be qeyd dibin û mifte jî li nik xweyê malê dibî. Lakin dayim hespêd siwariya şev û rojê bi zîn û hazirlîxab li qerpûza zîn dibin. Û çêk û sîlahêd wan tîjî û tîzkirî ye. Lewranê wekû îqtîza bikitin ew ekrad filhal li ser piştê hespê lazim in. Dayim ew hespêd xweyîzînan ceh didîn û qenc xweyî dikin. Yanî ew qedêr îtîbar nakin ku hespêd xweyîzînan bibin û bitewilînin. Belkû li ber derê konî girê didîn û hazîre dibe ku di rojekê da du-sê hewarî peyda dibitin. Biharan wekû bi der ketine konan, çêk û sîlahêd daîm şev û rojan heta dikevîne qîşlaxê xaniyan. Lakin di xaniyan da êdî rahet in, hewar û gazî nabî.

Ekserê ekradêd dewletmend dirav û giraniya malêd xo dibin û li bajêran dostêd wan heyîn, bi emanet datînine nik dostêd xo. Wekû lazim dibî diçin û tînin. Lewranê îtîbara wan bi konan nabî, jî dizan û jî talan û dijminan emîn nabin. Ekrad bi xo dibêjin ku dewleta me ya qîşliq û quşliqê bêitîbar e. Yanî heyîya me, yanî eger pez û dewar e, bi zivistanekî şedîd qîr dibî û xilas dibe, weyaxo bi tiştêkî ew mal û dewar diçine talanê û dijminek tê dibitin.

Û keçêd wan jî dixwûnin û mela jî heyîn, dersa wan dibêjin. Û ekserê jinêd wan î navser qelûnê dikêşin. Û qelûna tîjî dikitin û tête meclisê, nêva mêran. Û jinêd wan kêr nimêjê dikin, daîm dixebitîn û şola malê dikin.

Û jinêd wan bi şev malê gêzî nakin û paqij nakin, dibêjin ku şom e. Û bi şev piv nakin çirayê û bi şev neynikê nafekirîn. Evne goya li nik wan şom e. Û bi şev eman jî malê bi dernaînin û zibî rûnakin. Û nêzûkî êvarê û rojêd çarşenbê serêd xo û serê zarokan naşon ku naxoşî peyda dibî.

Û hasila xo û malê xo nişanî kesekî nadîn ku neser dihingive.

Û pîrejîn di nêva wan da heyîn wekû zarok weyaxo mirofêk naxoş bibe ewê pîrejîne tînin. Ew pîrejîn ewî naxoşî bi nan û xwê efsûn dikin. Û paşî ewî nan û xwêyî didine san, dixwin. Guya ew seyêd xwerî [xwarî] nexoş dibin û ew mirof û zarok şifa dibînin. Û şolêd cahîle zaf di nêva ekradan da heyîn.

Û gelek malhebîn in. Carekê-duyan qewimîye ku yekî mîqdarê hezarê pezî hebûye û zivistan şedîd bûyî. Ew hezar pez hemû telef bûyî, qîr bûne. Paşê xweyê wan pezan çekêd xo girêdaye û li hespê siwar bûye û daye meydanan û tepançe bi kenarê esmanan da agir kiriye û meazellah gotîd ku "Xudê, te pezêd min qîr kirîn. Tu li kû yî were em bikine şer." Û

bi xo jî ji hespê da ketîye û mirar bûye. Weha ef'alêd cahiliye di nêva ekradan da zaf heyîn. Weqtê mirofekî wan î ezîz û ciwan dimire dîsanê dibêjîn ku meazellah, "Xudê te çi kir, filankes kuşt!"

Xulase tiştêd bê emrîya Xudê Teala zaf dikin. Wekû di şerî da di meydan da eger bira û kurê yekî bikeve, birayê dinê û bab diçe û xo davêje ser wî meytî ew jî tete kuştin.

Wekû zarûkêd wan diwelidîn, îbtîda ewî bi ava sar xusl dikin ku goya li ber sermayê qewî û muhkem dibitin.

Ekserêd ekradan yek jîn heye. Nadir ji axayêd [wan] du-sê jîn dibin. Û jînberdan di nêva wan danî qewî zêde kirêt û eyb e, kê m waqî' dibitin. Û jînêd wan zafê hisse û parê ji malêd bab û dayêd xo nastînin. Belkû dibexşîne warisêd nêr. Lewranê ursiyetistandîn, di nêva wan da şerm e û hem bê yimne. Goya herçî mîrasê bibe, paşî malê wê jî mîras dibî. Ji mîrasê gelek ihtîrazê dikin. Û ji cilêd miriyan dûr dikevin.

Ew jî mewlûd didine xwendîn. Mêr cuda û jîn cuda, zad û teaman tedarik dikin û bixûran disojîn.

Weqtê îbtîda keçekê dixwezîn wekû dana hespekî be taxum herêkirîn distînin. Paşê şîrîni vedixwin û paşê nişan dikin. Û qalenêd wan zaf dibe. Sed û dused û pansed pez. Û hind çend bab û da û birayêd bûkê heyîn, elbette ji boy heryekî xelatek lazim e, bê xelat nabê.

Eger xweyê dawetê axa weya dewletmend e, ew gazî kê ku bikitin, keleqendekî mezûn ji boy wî vi rê dikin û ewan gazî dawetê dikin. Ew mirovêd ku hatine gazîkirîn, anegora halêd xo, du û sê û deh pezan ji boy xweyê dawetê vi rê dikin. Û paşê jî bi xo diçin dawetê. Û ew xweyê dawetê ji mesrefa dawetê zêdetir pez û mal ji boy wî berhev dibî. Û eger xweyê dawetê feqîr û jar e, dîsanê bi wê dawetê xoşhal dibî. Lewranê herkes zêde toypay ji bo wî vi rê dikin, hal û malik ji boy wî pêyda dibitin. Eger mirofêd gazî dawetê dikin, merifne biçûk û bê hal mal in, serê her mirofekî keleşkirekî biçûk vi rê dikin û ewan mirofan gazî dikin dawetê. Elebete ew mirofêd biçûk ji labudde dê pezekî toypay ji boy xweyê dawetê vi rê bikitin. Xulase, dawet bê tişt nabî. Qata zaf û hindik dê tiştêkî ji boy xweyê dawetê vi rê ketin.

Jîn jî cudatiştan dibine dawetê. Ji boy keçê mesela ber û kulaf û 'eqîb û goran dibin. Û dawetêd wan jî zaf bi deng û istiran dibin, ew "bêrite" dibêjîn. Dengbêjêd wan heyin, bêritan dibêjîn, ew jî bi govend reqs dikin. Lakin jîn û mêr keç û law hemû têk da destêd yekûdû digirîn û reqs dikin. Û keçêd wan û jîn di govendê da distirên û dilîzîn. Lakin dibe ku daweta maqûlan da def û nay û kemançe û defik û çinger jî hebitin. Ema

sazbendêd wan mitrib in. Her tayfeyekî ji ekrađan cuda cuda mitrib heyin ku xasê bi wan in. Ji bîyanîyan mitriban nayînin.

Dawetêd wan sê rojan, heta heft rojan anegora haî dibitin. Bûk û zavê jî paşê tînin û dêxine govendê ew jî dilîzin. Wekû bûk û zava dikevîne goqendê [govendê], her kesek pez û diraf li wan şabaş dikitin û gelek pez û diraf cem' dibî. Du hissa wî dirafî jî boy xweyê dawetê û hiseyek jî boy mitriban in.

Û dawet û zîyafetêd ekrađan zad û teamêd wan birinc û goşt e. Êdî zêde ew zadê enwa' û cins cins çêkirîn nizanin. Û 'adet nekirîne. Belkû zafî qet enwa' û cinsêd zadan nedîtine û nizanin. Ê wan cinsê zadî û teamî ye. Lakin zaf simatan raxînin û tijî zadê goştî û birincî dikin. Ew cem'iyet dest bi dest rûtînin û dixwin û radibin, destekî dinê têtin û disanê zadê wekû kê m dibitin tînin, heta ku nas hemû zadî dixwin.

Wekû bûkê tînin, jînek jî mala kurî "berbûk" dibêjin, diçite mala bûkê û jînek jî ji mala bûkê disanê "berbûk" dibêjin, digel bûkê jî wî kenarî têtin, bûkê siwarî dikin. Û miqdarekî siwaran li beraykê dilîzin û bi keyf tînine mala zavayî û marê dibirin û bi şev didine gerdekê. Paşê sê rojan ewan jinêd ku bûne berbûk heryekî xelatekî didinê û bi rê dikin. Paşê muddeyekê mala bûk û zavê gazî hevdû zîyafetê dikin, mêr û jin digel cîran û xizman û hedyê didine yekûdû. Wekû şayed weqtê marê, baran û berf bibaritin ew dibêjin ku ev bûka zav binê amanan xwurîn. Û bê tala ye ku di daweta wê da baran û berf dibaritin.

Û ekrađ daweta kirîwayî dikin û dibine kirîwêd yekûdû. Ew jî 'adet e, wisan wekû yek murad dikitin ku mirofekî jî boy xo bikitin kirîwa, eger ew herdu mirof jûra jorîn e, tînin berê hespekî dixemilîne bi rext û taxum vi rê dikite mala wî mirofî ku bilanê bibite kirîwê min. Ew jî qebûl dikitin û bexşîşekî didine wî mirofî ku hesp birîne û cewabê dide ku belê ez dê bibime kirîw. Û eger ew herdu mirofêd ku kirîwayî dikin jî qismê usta, weyaxo di edna ne, ew jî beranekî dixemlînin û dişînin mala kirîwî. Îcarê ew dibine kirîw.

Xweyê kurêd ku dê bibine sunnetkirîn, tedarîka zad û te'amê dikitin. Wekî rojê di ew zarok bêne birîn, xelqê gazî dikin û kirîw jî têtin. Paşê teamî, xelq belav dibin. Îcarê dellak têtin, ewan zarokan dibiritin. Lakin bexşîşa dellakî û xelata wî ê ku bûyî kirîwa ew mirof diditin. Û heta sê rojan, rojê du danan xunçe û zad jî mala kirîwayî jî boy wan zarokan têtin. Wekû ew zarok rabûn ew kirîwa jî boy her yekî anegora halê xo destekî libasê dikitin û dike ber wan. Paşî çend rojekan êdî babê zarokan

ewî kirîwê mêr û jin gazî mala xo zîyfatê dikin. Û paşê mêr û jinêd kirîwan anegora halêd xo xelat didinê û bi rê dikin.

Ji boy xwendina zarokan dayina seydayî wekû romiyan rismekî mu'eyyen tunîn in; cum'eliq û meaş û hefteliq tunîn in. Berê wekû zarok vi rê kirîn seydayî anegora halê xo hedyeyekê didine zarokê ji boy seydayî dibin. Êdî tiştêk tunîn in, heta ew zarok xetma Qur'anê bikitin. Wekû ewî zarokî xetîm kir, îcarê bab û dayêd wî zarokî rojekê gazî seydayî dikin, anegora halêd xo du û sê û pênc pez, weyaxo çêlekekî didine seydayî, ew jî razî dibe. Wekû dinê dersêd kitêb û meşq ku dikin ewan seyda mehzen bi xêra xo te'lim didin, ucret nastînin. Îlla ku muderrisê medresan ucureta wan ji malê weqfê heyin, distînin. Û muderrisê suban zû têne medreseyê û dersan dibêjin, heta nêzûkê êvarê, paşê diçîne malêd xo. Îlla rojêd in û sêşenban te'tîl e; muderris nayête medreseyê û feqeh dersan naxwînin. Di wan rojêd te'tîlan da dewr û dersêd berê xwendî tekrar dikin. 'Adet e ku her kesek ji mala xo her rojê ser êvarê sê nanan û amanekî zadî herçî Xudê dayî ratib didine feqehid [feqehêd] medresan.

Û qewî qedrê melan dizanin û îkrama wan dikin. Eger melayek cahilekî biqute, weyaxo çêr bikitin ew cahil destê xo li melayî hîlnagirîn û xeberan li melan wernagirînin. Û li semtê Buhtan û Hekarî û Behdîn û Soran wekû cahil bi rê ve rastî melan bên ji dewara xo peya dibin û destêd melayî radimûsin û paşê siwar dibin û diçîne rîya xo.

Ekrad herçî ku xêmenuşîn in, wekû mêwan bêtin rast dajon derê konî. Xweyê malê jî radibe û pêş ve tîn û hespêd wan digirîn û girêdidîn. Eger şayed xweyê malê mêr hazir nebin, jinêd wan bi der dikevin pêşiya mêwanan. Û hespêd wan digrîn û girê didîn. Û ewan mêwanan dibine konî. Êdî zêde ji mêrêd xo îkram û î'tîrazê dikin.

Ekradêd xwecihê Buhtan û Hekarê û Soran, ewan odeyêt mêran tunîn in, belkû mihmanxana wan mizgeft e. Herçî mêwanê têtin, eger siwar, eger peya, eger maqûl, eger jar, rast diçite mizgeftê. Eger siwar in, gundî diçin û hespêd wan tînin û li mala xo girêd didîn û elif didinê û xweyî dikin. Ew mêwan jî li mizgeftê diêwirîn. Wekû bûye êvarî, ehlê gundî; mezîn û biçûk heryekî emanekî zadî herçî Xudê dayî digel du-sê nanan li ser destî tînin mizgeftê. Wekû nimêja êvarê dikin, destexanê radixînin, ewan amanêd zadan datînin, digel mêwanan te'amî dixwin. Û paşê ji malêd xo ji boy mêwanan, nivînêd razanê jî tînin. Lakin mizgeftêd wan kuçik tê heyin. Agirî hildikin qewî germ dibitin û raxistîye wekû odeyan bi tedarik in. Lakin ekradêd xwecihê Wan, Mûş û Bazîdê ewan herkesekî gora halê xo yalî mêran hîn mêwanan sakin dikin. Eger qe ceh tune bî, jin li yalê

malê li kenarekî xweyê malê digel jina xo û li kenarê dinê mêwan radizên. Nabê, cih jî tunebin dîsanê mêwanan jî derê malê venagerînin. Lewra li nik wan mêwan neewirandîn û jî derê malê vegerandîn qewî şerm û eybekî mezin e. Ê hurmeta mêwanan dikin. Bilanê millet axir jî bitin.

Ekrad di malêd xo da zêde mukerrem in. Mumkun nabit ku mesela wekû milelêd mayî ekrad li cihekî zadî û fêkî û tişteki bixwin û mirovek jî dîr ve bifekire û li wan nezer bikitin, ew qedereki jî wî zadî û fêkiyî nedine wî mirofî ku nezer dikitin. Lewranê îtîqada wan ew e ku nefsa wî mirovî dibe mar û bi şev tête xewna wî. Ê eve goya di nêva wan da mucerreb e.

Dayêcan

Şahîne Bekirê Soreklî

Em ji welatî çûn der lê Kurdistan di dilê me de bû kul û kesereke kûr,
naçe der.

Dayêcan!

Xewnên bapîran, stranên dengbêjan, destana Memê Alan û goristanên
welatî di nav mejiyê me de ketine goran. Roj li dû rojê, şev li dû şevê agir
bi gorê dikeve û yên di wê de bizava xwevejandinê dikin. Û agirê bi gorê
ketî, me jî bi xwe re disotîne.

Yadêcan!

Dem ne dema berê ye. Bi evîna te sond dixwim û bi şîrê ku te daye
min, dem nema dema berê ye. Rovi bûye şêr, şêr gêj bûye, bulbul bédeng
maye û Hekîmê Luqman ji nav me bar kiriye. Dîmenên bêrîvanên gundê
me, bilûrên şivanên me, siwarên deşta me, erf û toreyên me bi ber bayê
çerxa felekê ketin û em nema yên berê ne.

Dayêcan!

Ne ku me hêvî wenda kir. Omêd û daxwazên li pêş me bûnin xezala
Beriya Heranê di nav mijê payiza me de wenda bûn. Amancên di dilan de
bûn qedera Siyamend û Xecê. Belê, Dayê mereqên di dilan de her sêwî
man.

Anê!

Di kûraniya mirina xwe de meke li min loman. Li min meke jehr û axû şîrê çelrojkiya zarotiya min. Dilsar im ji rewşa kambax, ji kêmbûna seydayan, ji şevreşiya xwe avêtî ser Kurdîstana min, ji nakokiya di nav yên me de serî hildayî, ji paşvemayîna neyaran, ji wendabûna tîrêjên roja zerdeştî û ji gotinên mezin yên bêber manin.

Ronediyê!

Sipas dikim ji te re ji kûraniya dilê melûl ji bo wî zimanê şêrîn ku te wek diyarî pêşkêşî min kir, ji bo wan çemên çîrok û amojagariyên ku te di nav zeviyên hebûna me de çandin, ji bo deryaya evînê ku te di nav hestên min de bi cîh kir, lê çi bikim dayê, çav dibîne dest nagihê; ya ku di dilê min de zindî mayî!

Ma ne te digot, "dengê daholê ji dûr ve xweş e!" Dûrbûna me ji wisa ye, hebûna me ji wiha ye, govenda gundê me ji wani ye. Û xwîna lehengên welatê me hişk bûye di nav fişbûna berhemên rêberan de! Û nemana berf û barana li ser çiya û deştên me! Û mirina xezal û kevokên me! Û miqrisbûna çem û rûbarên stana me! Û bîmayîna dayên zarokên me! Û wendabûna hîvên asîmanê me! Û zivistana jiyana me! Û sindifkirina zimanê me! Û vemirandina findên me! Û stewrmana bûkên me! Û xwekujtina rastiyê!..

Dayêcan!

Xweziya dîsa zarokekî gundî bûma, xweziya nezanekî naxirvan bûma, xweziya derwêşekî evîndar bûma û xweziya li kêleka Derwêşê Evdî di cengeke bêmiraz de miribûma!

Kêliya dawî

Kamîran Haco

”Li pey dilê xwe here madem tu dijî.

Bê sînor kêfê bike.

Dilê xwe neşikîne.

Xwestinên xwe pêk bîne, li kêfxweşiya xwe bigere madem tu li ser riwê Erdê yî.

Tu kesî pere û milkê xwe bi xwe re ne biriye.

Tu kes ne hatiye vir dûvre vegeriya ye..”*

Nimêja xwe qedand..Guhkê cilka nimêjê lê vegerand..Dest bi dua kir..Dengêtizbiyên wî û gotinên ko ji nav lêvan derdiketin ,li wê mizgefta vala, xweş dihate bihîstin...Bi giranî rabû ser xwe,xwest here mal,çend gavan çû lê qeremên wî pêre ne hatin..Li ber pencerê rûnişt..

Melê bi temen ta girtibû,destpêka nexweşiyeke nenas lê xuya dikir.Bi xortaniya xwe guh ne dida êş û nexweşiyan,”lê xwedê mala xityariyê xira bike”,di dilê xwe de got..Xortanî...Hişê wî çû dûr..

Mele di dirêjia temenê xwe de ji riya xwedê derneketibû, weke bawermendekî ji davkên vê jiyana sexte xwe tim dûr dixist,bi hêviya ko li wê cîhana dî, li Wê devra dûr,jiyana rast û pak bijî.Bi xweşiyan ko li vir lê qedexe û haram in,li wê devera nenas ,bijî..Lê çima li vir qedexe ne û li wê cîhana dî serbest in û mafê bawermendan yên rewa ne..? Pirseke xortaniyê di serê wî de çû û hat..Dêmek ev tişt pir xweş in,ta ko ji mirov re bûne ezmûn.

Bi wî rengî bersiv ji amade bû..Lê eger ew cihana dî nebe..??Zû istixfara xwe anî û leenet li şeytên anî..Ev çi ramanên xirab in vê keliyê di hişê wî de şîn dibin.? Bi giraniya taya li ser xwe hisa..Bê goman ev tevlihevî ji nexwşiyê ye..Xwe da bawerkirin.. Li derve nerî..Baraneke hûr dibarî ,bi nermî dihate xwar,erda tî ew baran himbêz dikir..Bayekî sivik pêre dihat,pelên dara di hewşa mizgeftê de, bi nazî dihejandin.Sema pelan di ber ba û baranê li melê pir xweş dihat..Ji eşa serê xwe çavên xwe girtin,zû jî vekirin,ne dixwest ji vê wêneya xwezayî Bê par bimîne..Bi ser ko melê bi temen gelek caran ev yek dîtibû,lê ne dizanî êdî çend carên di dê bibîne..?Xityarî bîna mirinê di pozê mirov de dimeyênê..Xwedê mala xityariyê bişewitîne .Keserek hatiyê..Vê jiyana ko mirov jê têt nabe..Di dilê xwe de got..Careke dî li baranê guhdarî kir. xwest xwe dûrî van ramanên xirab bike.. Kêfa wî Ji baranê re pir dihat û jê têt ne dibû,jiyana têt re didît, ji xwe Ilmê Şerîf gotiye "Av jiyana e".

Di xortaniya xwe de ji rêveçûna di bin baranê De pir hez dikir..Xortanî ..Dîsa hişê wî dûr çû.. Mele xortekî lihevhatî bû û ji davkên jiyana bi tirs bû bi taybetî evîna ko mirov di gunehan de digevêze.Loma ji təkiliyên jinan pir bi tirs bû. Ji bîra wî tu caran naçe gava bi bafîka nivîstê, ew û jina bîst salî, ko ew salek bû mêtê wê miribû,li ciyekî xewle gihane hev.Ji gotina(subhan ji xwedê re)pêve ji devê wî derneket û li yek awirê bi çavên ta dawiyê vebûyî lê nerî.Dil kutka wî zêdekir û Dilê wî kir ko ji ciyê xwe derkeve. Jinbiya ko halê melê dît,di ber xwe de beşîşî û bi nazî û delalî dest û lêv û çavên xwe livandin..Agir bi hinavê melê reben xist..xwestina laşê wî giha radeke ko mirov nikare xwe li ber bigire.Cengeke mezin navbera xwestinên xwezayî û baweriyana de destpêkir.Bi çi rengî jî vê davka dijwar xilas bû ew jî nizane,lê wêneyê wê ta weke îro li ber çavê wî ye.Birîneke kûr jî di dilê wî de vekir..çima tiştê nekir û dilê xwe hişt ?Ew jî baş nizane.. Tirs bû.? Tirs ji mirinê bû,yan tirs pişt mirinê bû??Tirs ji xwedê bû? Yan ji bo ko ,li wê cihana dî, ji vê kêfxweşiyê bi xwe bê par nemîne?

Gelo bawerî bû?.Ko insan di vê jiyana kin de mehtêce xwe pê têt bike û pêwîst dibîne ko vê jiyana bi wate bike..!Gelo yek ji van bû yan hemî bi hev re bûn..?Mele ji nizanîbû.Lê xweş bawer bû ko ezmûneke dijwar bû,xwedê xwest jidiliya bewermendiya wî nas bike,loma iblîs xwe kire rengê wê jina sipehî de.Lê çima iblîs dikeve ezmûnên ko xwedê ji bawemendên xwe re çêdike? Û çima tim iblîs xwe dixwe rengê jinê de.?Gelo jin bi xwezaya xwe xisletên xirab têt de ne? Yan jî qelsiya mêtê ne li himber jinê?Gelo xweşiya herî mezin di jiyana de ev e..?!

Vebûna deriyê mizgeftê ew ji van ramanên tevlîhev derxist..Du mirovên ji Melê ve nas ketne hundir..

_Miho ne sax e..Yekî ji wan got..

Zanîbû ko ev pêleke Miho li ber mirinê ye, loma ev yek jê re ne xerîb bû. Hevalê hev yê piçûkayê ne.Mele zanîbû dor nêzik e.. Bi ser vê tayê de, neçar e,divê li hêviya laşê wî be ji bo şîştinê.. Dunya tarî bûbû.Taya li ser girantir dibû.Dîsa li derve nerî .Goristanali himber mizgeftê di bin ronaya belediyay xuya dikir,kêlên şil diçirîsin di kêlikê de ji winda dibûn, mîna jiyane!.Piraniya van miriyan bi destê wî hatine şîştin .

_Gelo ko ez bimirim wê kî min bişo.? Ji nişka pirsek ji xwe kir.

Miho hate bîra wî,gava henek lê dikirin û digotiyê ko kengî mabe dê ava serê wî li êgir bike.Îro Miho ji barkir û bervajî xwestina wî mele dê ava serê wî li êgir bike. Miho vajî melê mirovekî bi xweşiyên jiyane ve girêdayî bû,dilê xwe ne dihişt,û li ber xweşkayê bê çek bû,ji pirekan pir hez dikir.Qerfên xwe bi melê dikr ji ber ko xwe ji fêkiyê vê jiyane bê par kiriye..Mele jî ji ber dostaniya wan tim bi ken bersiva wî dida.û agirê dojhê tanî bîra wî.

Lê Miho bi vê yekê ne bawer bû.Kêfa melê ji ji rastiya wî re dihat.carna ji rêz ji baweriyên wî re digirt..Gelo dixwest weke wî be? Bi vê pirsê Istixfara xwe anî,û xwest ji van ramanan dûr keve..

Pelên dara li hewşê,li ber ronaya belediyay diçirîsin.Pelên şîn jiyaneke nû destpêdikin.Di vê şeva bi bîna mirinê avis bûyî,bi tenê ev pelên han Hêvî ne..!

Dilopên xwêdanê ji aniya wî dihatne xwar,bi sistî û xemsarî laşê di nav destê xwe de dişişt.Hilma ava germ di oda şîştinê de bîna wî teng dikir. Melê tagirtî ko bi salane vî karî dîke,işev lawaz bûbû,xwe bi xwe ne digirt.. Sawa mirinê ko di destpêka şîştina laşan de,ketibû dilê wî,bi salan jibîr kiribû ,lê işev cardî ew saw ketiye hinavê wî..Tevzînok bi laşê wî de hat. Bi giranî destê xwe davête zerika avê û bi laşê di nav destê xwe de dikir.Li avê dînerî,çawa bi laşê Miho ve diherikî,jiyay tê de didît,lê bi vê jiyane mirinê dişoyê.Şîştin bi xwe heyrek bû.Ev laşê ko wê bibexwarina kurm,mar, û dopişkan û ji hestiyên rizî pêve tiştêk namîne,ji bo çi dişon.?Mele jî li gor xwe dizanî ko qedirgirtina miriyan ji ber tîrsa saxan ji mirinê ye, bêtir ko rêzgirîna kesê mirî ye..Ramanên wî ne rawestiyan,pirsên xirab û tevlîhev di xortaniya wî de bê bersiv mabûn,dîsa vê şeva bi nişan li dergihê mêjiyê wî dixin.

Oda şîştina miriyan lê teng bûbû,bayê hundir bi hilma avê girantir bûbû, taya wî ji hêdî hêdî lê cor dikir..

Hinarkên riwê wê sor dikirin. Ji fediya sortir dibûn. Bîna evînê li wî ciyê xewle belav dibû. Gulên li ber pencerê bi ronaya rojê û hilma evînê beltir û geştir dibûn. Evîna bi dizî sîwana xwe berda bû ser civanê pîroz. Mele destê xwe avête destê jina bîst salî, bîna wî çikiya, bû kutkuta dilê herdiwan, laş bi hev re lerizîn, liveke xwezayî xwest tîna laşan û sûtana wan vemirîne.. Li laşê di nav destê xwe nerî, laşê xwe dît. Av li laşê xwey qirêj dikir. Laşê wî pê dikenî. Av pir kir lê dikir ne dikir paqij nedibû. Du gornên bi yek laşî li goristana himber mizgeftê zêde bûn. Mizgefta bê deng ma bê bangdan..

*Ji strana (Harpiste) a gelêrî, ko berî 2000sal berî zayînê li dora gornan digotin..

Mêvan

*Albert Camus**

Ji swêdî: Serdar Roşan

Mamosteyê dibistanê didît ku waye du mirov li ser rê ber bi mala wî tîn. Yek ji wan siwarî yê din peya bû. Ew hîn ne gihîştibûn quntara gir ku li wê derê rê rast ber bi serê gir ve diçû û digihîşt xaniyê dibistanê. Hêdî û bi dijiwarî li nav berfa di nav keviran re, di wî zozanê tenha re dihatin. Pir eşkere diyar dibû ku yekcaran hesp dilukumî. Hîn deng ne dihat lê xweş xuya dibû gava hespî di firnikên xwe re hilm dida der. Yekî ji wan herduyan herêm baş nas dikir. Ew di şiveriya ku ev çend hefte bû ku di bin berfa qirêj de mabû, diçûn. Mamoste hesab dikir ku bi kêmasî dê niv saet wext bigire heta ew bigihîjin serê gir. Dunya sar bû, çû hundirê dibistanê da ku fanîreyekî li xwe bike.

Di sinifa sar û vala ya dibistanê re bihurî. Li textê reş yê nivisînê çar çemên Frensayê bi çar rengên cida bi tebeşîrê hatibûn çekirin ku ev sê roj bû diherikîn. Piştî heşt mehên bê şilî, bê tu baran wek mideteke haziriyê, berf ji nişkê ve di nav meha teşrîne de dahatibû. Ji lewre li dora bîst zarokên ku ji gundên derûdor, li zozanan, dihatin êdî nema hatin dibistanê. Diviyabû ew li bendî hewayaya xweş bisekinin. Daru bi tenê odeya ku ew lê dima agir pêdixist; ode li kêleka sinifê bû û herweha berê wê li rojhelat bû. Yek ji pencereyên sinifê li başûr mêze dikir. Ber bi wê hêlê, bi çend kilometreyan, zozanan dest bi nizimbûnê dikirin. Gava dunya sayî bû mirov dikarî morbûna zincîreçiyayên cihê ku sînorê di nav sehra û zozanan de pêk dianî bibîne.

Piştî ku Daru piçekî germ bû, vegeriya ber pencereya ku ew mirov jê dîtibûn. Niha wî ew ne didîtîn. Wê gavê wan cehd dikir ku bi gir de hilkişin. Asîman niha ewqas ne tarî bû: bi şev daketina berfê qut bû bû. Sibeh bi ronahiyeke ne zêde zelal bû bû û ronahî zêde ne bû bû lê ewr hêdî hêdî kêmbûn. Piştî nivro saet li dora diduyan mirov digot qey hîn

nuh roj hiltê, ronî dibe. Lê ji her sê rojên dawiyê çêtir bû; wê gavê çi bêje bi temamî tarî bû û hertim berf daketibû û bi bagerê li cotederiyê sinifê dabû. Wê gavê Daru bi sebir li hundir mabû; bi tenê gava li koxikê mirişkan mêze bikira an jî komir bianiya çûbû derve. Ji siûda wî re otobusa piçûk jî Tacide, gundê herî nêzik li bakûr, du roj berî berf û bagerê, xwarin anîbû; otobus dê piştî çil û heşt saetan vegeriya.

Têra xwe zad li cem wî hebû; li odeya wî ya piçûk çewalên zad li ser hev bûn; dezgehên resmî izin dabûn wî, da ku gava pêwist be zad bide wan zarokên ku malbatên wan jî nebarîna baranê zirar dîtibûn. Lê bi rastî wan hemiyan jî nehatina baranê zirar dîtibû, ji lewre hemî hejar bûn. Daru her roj hinek zad dida zarokan. Wî baş dizanî ku di vê berf û bagerê de bêşik pêwistiya wan hemiyan bi zad hebû. Dibe ku bavek an jî birayekî mezin êvarê were; bi vî awayî wî dê kariba hinek zad bidaya wan. Heta dema çinînê dê wisa bibuhuriya. Niha zad bi keştiyan jî Frensayê dihat; lê dema beriya çinînê zehmet bû. Herwisa jibîrkirina vê hejariyê dê dijwar bûya: ew qefleyên insanan ku bi paltoyên xwe yên qetiyayî, di bin rojê de diçûn û dihatin, meh li pey mehê bê baran, erdê ku dîterizî, dişewitî û kevirên ku di bin piyan de hûr dibûn. Bi hezaran mîh telef dibûn, yekcaran li vir û li wir insan jî dimirin bêî ku kes pê bihese.

Li wê derê, di dibistana xwe ya xewle de, mîna keşeyekî dijîya; ji jiyana xwe ya cefakar dilxweş û razî bû; gava wî belengaziya wan didît, wî xwe mîna begekî his dikir; bi dîwarên sîwaxkirî, bi dîwana zirav, bi çaviyên dolabê yên neboyaxkirî, bi bira avê û bi erzaqê xwarin û avê ku hefteyî jê re dihat. Û bi carekê ve bêî çu îşaretê, bêî ku wek navbireke baranê, dahatina berfê. Welatekî wisa bû, li vê derê jîyan heta bê insanan jîyan jî dijwar bû lê niha ne dikarî zêde tiştekî bikin. Lê Daru li vê derê hatibû dunyayê. Heke ne welê bûya, wî dê xwe li her derê wek mihacirekî his bikira.

Çû derve û li rasteya pêş dibistanê midetekê geriya. Niha ew her du mirov heta nivê gir hilkişiyabûn. Wî dît, yê siwarî Balducci bû; cendirmeyekî bi emir ku wî jî zû de nas dikir. Werîsek mîna hefsar di stuyê wî de, serî li ber û destên wî girêdayî yekî ereb li pey wî bû. Cendirme destê xwe jî Daru re hejand lê Daru xwe ne livand; awirên wî bi ereb ve aliqîn. Ereb, kirasekî kevin î şîn lê bû; ji bilî sandalan goreyên wî yên jî hiriye û bêreng di piyên wî de bûn. şaşıkeke teng û nizim li serê wî bû. Hatî nêziktir. Balducci jî bo xatirê yê ereb hespê xwe hêdî diajot.

Gava ew gihîştin hukimê bihistinê, Balducci got: "Ji bo van sê kilometreyan jî El Ameerê, saetek wext!" Daru dengê xwe ne kir. Bi bejina

xwe ya kin û xurt, fanîreyek lê li wir li wan temaşe dikir. Yê ereb carekê tenê jî serê xwe ranekiribû û lê ne nêribû. Gava ew gihîştin rasteyê, Daru got: "Merheba. Fermo em herin hundir, xwe germ bikin." Balducci bêî ku weris ji destê xwe berde bi dijarî jî hespî peya bû. Li mamoste mêze kir, di bin qevdesimbêlên xwe de bişirî. Bi çavên xwe yên reş û hûr yên kortekûr, bi eniya li ber tavê qemirî û xetên li dora devê xwe wî tesireke berbiçav dikir. Daru bi hefsarê hespî girt ew bir bi cih kir û vejeriya cem yên din; ku çûbûn hundirê dibistanê; li hêviya wî bûn. Wî ew dawetî odeya xwe kirin. Got "ez dê li sinifê sobeyê pêxim. Dê xweştir be." Gava vejeriya odeya xwe Balducci li dîwanê rûniştibû. Werisê ku wek hefsar ji bo yê ereb bi kar anîbû vekiribû; ereb li ser qelefiskan li ber sobeyê rûniştibû. Destên wî hîn jî girêdayî bûn; li pencereyê mêze dikir. Şaşika xwe ji serê xwe kişandibû dora stuyê xwe. Daru, pêşîn çî bêje bi tenê lêvên wî, yên gelekî mezin û tije, yên wek reşikekî dîtin; bêvila wî rast bû û çavên wî dibiriqîn. Eniya girover êdî ne di bin şaşikê de bû; canê wî yê li ber sermayê sipî bûyî dîmeneke isyankar dida rûyê wî; gava yê ereb berê xwe da Daru û ziq lê mêze kir; Daru heyirî. Mamoste got: "were vir, ez ê ji we re nane bikelînim." Balducci "spas" got. "Çi kar! Hêvî dikim ez ê li nêz teqawid bibim." Paşê bi erebî jî yê girtî re got "were." Yê ereb rabû ser xwe, hêdî hêdî bi destên xwe yên girêdayî li pêş dirêjkirî çû sinifê.

Daru gava çay anî hundir kursiyek jî bi xwe re anî. Balducci li ser maseya nivisînê rûniştibû; ereb li ser qelefiskan li ber podyoma kursiyê li hember sobeya ku di navbera kursî û pencereyê de bû, rûniştibû. Gava Daru qedeha çay dirêjî yê girtî kir; li pêş destên girêdayî dudilî ma. "Ma ne baştir e ku destên wî bêne vekirin?" Balducci got: "Helbet! Bi tenê li ser rê pêwîst bû." Balducci hewl da, ku rabe ser xwe. Daru qedeh danî erdê û li ber yê ereb çok da erdê. Yê girtî bêî ku tişteke bêje bi çavên ku dibiriqîn li wî mêze kir. Gava destên wî azad bûn, zendên xwe yên werimî firkandin, paşê qedeha çayê hilda û bi lez çaya germ bi deng fir li ser firê vexwar..

Daru got: „Belê, hûn dê bi ku de herin?“

Balducci simbêlên xwe ji ser çayê rakirin: „Vir, xorto.“ Daru: „şagirtên ecêb. Hûn ê îşev li vir bimînin?“

„Na. Ez ê vejerim bo El Ameerê. Û divê tu vî xortî bibî li Tinguitê teslîm bikî. Li wir ew li bendî wî ne. Dê derkeve pêşberê komisyona têvel.“*

Balducci bi bişirîneke piçekî dostane li Daru mêze kir.

Mamoste got: „Tu behsa çî dikî. Tu henekan bi min dikî?“

„Na xorto. Ferman e.“

“Ferman? Ez ne...” Daru dudilî bû, ne dixwest vî korsikaniyê kal aciz bike. “Ne karê min e.”

“Çi? Mebesta te çi ye? Gava ku şer e, divê mirov her karî bike!”

“Baş e, ez ê rawestim heta îlana şer were!”

Balducci bi kêfxweşî bi serê xwe erê got.

“Belê belê. Niha ev ferman e; û ji bo te jî welê ye. Tişt diqewimin. Tê gotin ku serihildan li rê ye. Heta dereceyekê em hazir in; mobilîzekirî ne.”

Di rewşa Daru de çu guhertin ne dixuya.

Balducci got: “Mêze bike, xortê ciwan. Ez jî te hez dikim, herhal tu fam dikî. Li El Ameerê em bi tenê duzîneyek mirov in ku divê em asayîşê biparêzin, ez mecbûr im vegerim malê. Ji min re hate gotin ku ez vî mirovî li vir daynim û zû bi zû vegerim. Me ne dikarî em wî li wir bihêlin. Li gundê wî pevçûn çêbû û wan dixwest wî rizgar bikin. Tu ê serê sibeyê wî bibî Tingûtê. Bîst kilometre ji bo xortekî jêhatî mîna te ne tiştek e. Hew, ne tiştekî din. Paşê tu ê vegeirî sinifa xwe, ser karê xwe yê berê.”

Wan, jî aliyê din yê diwêr, dengê firin û pikohiya hesp dibihîst. Daru jî pencereyê li derve fikir. Dunya vedibû; şilî û firtone vedikişiya, zozanên berz yê bi berfê pêçayî zelal dibûn. Gava ku hemî berf bihele dê careke din roj bi tirêjên xwe derûdora bi kevir, bişewitîne. Paşê, asîmanê sayî yê neguhêrbar, dê ronahiya xwe ya zuha li ser devera tenha bireşîne ku çu şopa insanan lê ne xuyabû.

Mamoste berê xwe da Balducci û got: „Wî çi kiriye?“ Berî ku cendirme devê xwe veke wî domand: „Frensî dizane?“

„Na. Gotinek jî nizane. Ev mehek e lê tê gerîn, lê gundiyan ew vedişart. Pismamê xwe kuştiye.“

“Ew diji me ye?”

“Ez bawer nakim. Lê mirov nizane.”

“Çima pismamê xwe kuştiye?”

“Ez dibêjim qey di nav malbatê de pevçûnek çêbûye. Yek jî wan deyndarê yê din bûye. Mesele hîn bi temamî ne diyar e. Her çi be jî, wî pismamê xwe bi dasokekê kuştiye. Mîna mîhekê, fişt!”

Balducci mîna ku mirov kêrê bide stuyê mîhekê welê kir; gava yê ereb ev tişt ferq kir, bi tirs li wî mêze kir. Daru jî nişkê ve li diji vî mirovî, hemî insanan û qirêjîya wan ya alçax, kîna wan ya bêdawî û çavsooriya wan hêrs bû.

Lê niha dengê kela çaya li ser sobeyê dihat. Wî çay îkramê wan kir; bêtir îkramê Balducci, lê piştî dudilîyê, qedeheke din jî çay da yê ereb ku bi kêfxweşî vexwar. Gava wî piyên xwe rakirin, kirasê wî jî hev vebû,

mamoste sînga wî ya esabî û ziravik dît.

Balducci got: “Spas, xortê hêja. Niha ez ê biçim.”

Rabû ser xwe, benekî zexim ji berîka xwe derxist û çû cem ereb. Daru pîrsî:

“Tu çî dikî?”

Balducci ecêb mayî benik nîşanî wî da.

“Ne hewce ye.”

Cendirmeyê kal dudil bû.

“Kêfa te ye. Çawa be tu bi çek î?”

“Min çifteyek heye.”

”Li ku ye?”

”Di sindoqê de ye.”

”Baştir e ku tu li ber textê razanê daynî.”

”Çima? Ne pêwist e, ez bitirsim.”

„Xorto, tu şêt î. Heke ew serî hildin kes ji me ne di ewlehiyê de ye; em hemî di keştiyekê de ne.“

„Ez ê xwe biparêzim. Gava ew bên min dê wext hebe ez wan bibînim.“

Pîrçînî bi Balducci ket; ji nişkê ve simbelên xwe bera ser diranan dan; ku -diran- hîn ji sipî bûn.

„Tu ê pê re bigiji? Belê, belê. Ji xwe min jî ev tişt got. Tu ji berê de piçeki weha ecêb î. Ji lewre kêfa min ji te re tê. Lawê min jî wisa bû.“

Her di wê gavê de demançeya xwe kişand û li ser kursiyê danî.

„Bila ev jî li vir be; gava ez vegerim El Ameerê pêwistiya min bi du heban tu ne ye.“

Demançe li hember maseya reşboyaxkirî dibiriqî. Gava cendirme zivirî, mamoste his kir ku ji wî bêhna hesp û çerm tê.

Daru got: „Binêre, Balducci; ev mesele û ev zilamê li vir dilê min dixelîne. Lê ez ê wî teslîm nekim. Şer, heke ez mecbûr bibim ez ê bikim. Lê ez wî teslîm nakim.“

Cendirme li pêş wî sekinî û tûj tûj li wî nêhirî.

Got: „Ev dînîti ye. Ez bi xwe jî ji meseleyê aciz im. Herçiqa ez di vî karî de kal jî bûm, mirov fêr nabe ku insanekî girê bide; ez fedî dikim. Lê mirov nikare bêdeng ji bimîne.“

Daru tekrar kir: “Ez ê wî teslîm nekim.”

“Xorto, ev ferman e. Ez tekrar dikim.”

”Belê belê. Here gotinên min ji wan re bêje. Ez wî teslîm nakim.”

Balducci midetekê fikirî. Li yê ereb û Daru mêze kir. Di dawiyê de biryar da.

“Na. Ez ê tiştêkî ne bêjim. Heke tu dixwazî me di nav belayê de bihêli, bihêle. Ez te nadim dest. Ferman dan min ku ez yê girtî li vir daynim. Ez bi cih tînim. Divê tu vê kaxizê îmza bikî.”

”Ne pêwist e. Ez ê înkâr nekim ku te girtî li ba min hiştiye.”

”Nilha dev ji henekan berde. Ez zanim tu ê rastiye bêjî. Tu ji vir î; û tu zîlam î. Lê şert e, li gorî qaîdeyan divê tu îmza bikî.”

Daru sindoqa xwe vekir; jê şuşeyeke piçûk e çargoşe bi hubra şînê vekirî û pênûsa sor ji qamîş ku ji bo destnivîsaran bi kar dianî, derxist û îmza xwe avêt jêra kaxizê. Cendirme kaxiz hilda, xweşik pêça û xist nav cuzdanê xwe û ber bi derî çû.

Daru got: ”Ez ê bi te re derkevîm.”

Balducci: „Na“ got. „Ne hewce ye. Te ez bê hêvî kirim.“

Li yê ereb ku her li cihê xwe rûniştî bû mêze kir; gunehê xwe pê anî û berê xwe da derî. „Bi xatirê te“ got. Derî li pişt wî hate girtin. Balducci li ber pencereyê xuya kir paşê wînda bû. Berfê dengê meşa wî dikuşt. Hespî li aliyê din yê dîwar simên xwe li erdê dida; qar qara mirîşkan bû. Piştî midetekê Balducci li ber pencereyê tevî hespî cardin xuya bû. Ber bi gir diçû bêl ku li paş xwe binêlêre; hefsar di destê wî de hesp li pey ji ber çavan wînda bû. Dengêkî lawaz ji gêrbûna kevirekî mezin hate bihîstin. Daru çû cem yê girtî yê ku xwe ji cihê xwe ne livandibû; lê bi awirên xwe li wî mêze dikir. Mamoste bi erebî got: „Bise“ û çû odeya xwe. Li ber şîpaneya derî fikira xwe guhert, demançeya li ber kursiyê hilda û xiste berîka xwe. Paşê çû odeya xwe bêl ku li hêla yê girtî mêze bike.

Midetekê li ser dîwanê pal da û gava guhdariya bêdengiyê dikir, didît ku ewr li asîmanê, ji berî ve zêde dibûn. Piştî şer gava hat vê derê her ev bêdengî jê re pir zehmet bû. Wî miracaet kiribû ku karekî li bajarê piçûk yê quntarê zincîreçiyayan bi dest biêxe, bajarê ku di sînorê sehra û zozanan de bû. Li vir sînorê lavîna bêdawî û dîwarê zinaran yê ku li hêla bakûr kesk û reş, li hêla başûr mor û gulereng bû. Li zozanan li hêla bakûr karekî bi dest xistibû. Di destpêkê de ji ber tenêbûnê û bêdengiyê li vî warê bêber ku niştecihê kevîran bû; gelekî dijwarî dîtibû. Cihî erd hatibû kolan ku dişîbiya zeviyê cotkirî, lê belê hatibû kolan da ku kevîrine bo avakirina xanî rakin. Li vir bi tenê ji bo kevîran erd dihate kolan. Li cihîne din ji erdê terizî axa reş didan ser hev da ku bexçeyên li derûdora gund piçêkî xurttir bikin. Lê bi rastî ji çaran sisêyê welat bi lihêfeke ji kevîran pêçayî bû. Bajar dihatine avakirin, mezin dibûn û paşê têk diçûn; insan dihatin, ji hev hez dikirin an jî dest dixistin qirîka hev û dimirin. Li vê sehayê qîmetê çu tiştêkî tune bû, ne insan ne jî mêvanên wan. Li gel

vê yekê ji kesekî ji wan jî ne dikarî bê sehayê bijî; Daru bi vê yekê dizanî.

Gava rabû ser xwe, jî sinifê, çu deng ne dihat. Ji fikira ku niha yê ereb reviyaye kêfxweşiyek his kir û ecêb ma; bi tenê bû, êdî ne mecbûr bû ku biryarekê bide. Lê yê girtî li wir bû. Bi tenê xwe di navbera sobe û podyomê de dirêj kiribû. Li banî mêze dikir. Gava bi vî awayî pal dabû, lêvên wî yên mezin berî hertiştî bala mirovî dikişand û ew zîşt nîşan dida. Daru got: „Were.“ Yê ereb rabû ser xwe û da pey wî. Gava ew hatin hundirê odeyê Daru kursiyek li ber pencereyê îşaret kir. Erebi li ser kursiyê rûnişt bêî ku nêrînên xwe jî Daru veqetîne.

“Tu birçî yî?”

Yê girtî “belê” got.

Daru ji bo du kesan sifre danî. Arvan û zeyt anî û di tasekê de hevîr kir; paşê firin pêxist. Gava nan çêdibû wî çû ji kilerê penîr, hêk, xurme û şîrê toz anî. Gava nan sor bû, deranî û li ber pencereyê danî da ku sar bibe; hinek av xist nav şîr û baş çeliqand û di dawiyê de omlet pêk anî. Gava ev kar dikir destê wî li demançeya li berîka rastê ket. Tasa di destê xwe de danî, çû sinifê û demançe li çaviya podyomê danî. Gava hat odeyê êdî dunya tarî dibû. Lembe pêxist û ereb vexwand xwarinê. “Bixwe” got. Erebi pariyek ji nan jê kir û bi lez bir devê xwe, lê xwe ragirt.

Got: “Ma tu bi xwe?”

”Tu kerem bike. Ez ê jî bixwim.”

Lêvên mezin piçekî ji hev vebûn, ereb dudih bû, lê bi biryar dev li nan kir. Piştî ku xwarin xwarin ereb li mamoste mêze kir.

„Ma tu hakim î?”

„Na, tu ê heta sibehê li cem min bî.”

”Çima tu bi min re xwarinê dixwî?”

”Ez birçî me.”

Yê din dengê xwe ne kir. Daru rabu ser xwe û çû derve. Ji kilerê textekî portatif anî û di navbera mase û sobeyê de bi tîkanî li ber textê xwe bi cîh kir. Ji sindoqeke mezin ku li qoziyekê bû û wek dolaba ewraqan bi kar dianî, du betaniyeyên mezin deranîn û li ser textê portatif raxistin. Paşê xwe ragirt, xwe leqayt his kir û li ser textê xwe rûnişt. Tiştêkî din ku bikira tu ne bû. Diviya li vî mirovî mêze bike. Li wî mêze dikir, hewl dida ku li rûyê wî yê jî qehran tevlihevbûyî bifikire. Lê ne karî. Careke bi tenê awirên birqoq yê tarî û devê heywanî dit.

“Çima te ew kuşt?” got û bi şeweyê gotina xwe ya dijminkarî ecêb ma.

Yê ereb berê xwe guhert.

“Wî baz dida, ez li dû wî bûm.”

Careke din li Daru mêze kir, nêrîna wî bi meraqeke nebextewar tije bû.
“Û niha, ew ê min çi bikin?”

“Tu ditirsi?” Yê din li cîhê xwe sar bû, li dûr mêze dikir.

“Tu poşman î?”

Yê ereb devvekirî ziq li wî mêze kir. Xuyabû fam ne dikir. Daru bêtir hêrs bû. Her wisa xwe di nav wan herdu textên razanê de bi laşê xwe yê girs, hantal û bêkêr his kir.

Daru bi hêrs got „Vekeve! Ew textê te ye.“

Ereb xwe ne livand. Bi tenê got:

“Binêre!”

Mamoste li wî mêze dikir.

“Ma sibehê cendirme dê vegere?”

“Ez nizamim.”

“Tu ê bi me re werî?”

“Nizamim. Çima?”

Girtî rabû ser xwe, xwe li ser textê razanê, pê ber bi pencereyê, dirêj kir. Ronahî ji ampûlê rasterast dida çavên wî, wî tavilê çavên xwe girtin.

Daru ku li ber textê razanê bû, tekrar kir, got: “Çima?”

Ereb çavên xwe di bin ronahiya ku direşiya vekirin hewl dida ku çavên xwe neşikîne, li Daru mêze kir.

Got: “Bi me re were.”

Nivê şevê hîn Daru raneketibû. Piştî ku hemî cilên xwe danibûn, ketibû nav nivînan: gelek caran wisa tazî radiket. Lê gava bê cilan welê li odeyê bû, dudilî bû. Xwe bê luzûr his dikir, daxwaza ku cilên xwe li xwe bike pê re çêdibû. Lê milên xwe rakirin; di jyanê de rastî gelek tiştan hatibû; heke pêwîstbûya dikarî yê hemberî xwe parçe parçe bike. Dikarî ji cîhê xwe yê ereb bibîne; yê ereb li ser piştê veketî û xwe ne dilivand û di bin ronahiya tûj de çavên wî girtî bûn. Gava Daru ronahî girt, te digot qey tarî bi carekê de bû qeşa. Piştî midetekê careke din şev vejîya, di pencereyê re asîmanê bê stêrk hêdî hêdî tevdigeriya. Mamoste êdî reşê yê veketî didît. Yê ereb xwe tevnedida lê mîna ku çavên wî vekirîbin. Bayekî sivik avahiya dibistanê çarmedor miz dida. Dibû ku ba ewr ji hev belav bikira ku tav derketa.

Bi şev hukimê ba zêde bû. Bû qarqara mirîşkan lê cardin bêdeng bûn. Erebb xwe bi ser kêlekê ve qeliband; piştî wî li Daru bû; Daru got qey yê ereb naliya. Paşê dengê nefesgirtina wî ya bi usûl û giran bihîst. Gava ew bêî ku karibe rakeve, welê veketî ketibû nav xeyalan guh da nefes girtin û dayîna yê din ku nêzîkî wî bû. Ev salek bû ku ew bi tenê di vê odeyê de

radiza; hebûna yê din ew bê huzûr dikir. Vî tiştî ew ne rehet dikir, ji ber ku ew mecbûrê birayetiyeke dikir ku bi rastî wî ne dixwest di şertên welê ku ji wî re diyar bûn, beşdar bibe: zilamên ku di eynî odeyê de radikevin; çi esker çi girtî, her êvar mîna ku bi rexê xwe wek ku kincên xwe daynin, bi xekekê kêmdîtî, dibûn yekgirtî; di nav westanê de di xewnên kevnare de yekitiya wan pêk dihat ku bi ser cidabûna wan ya hundurî de bû. Lê Daru ev his ji xwe bi dût xist, ji hestên welê hez ne dikir; niha mecbûr bû binive.

Hinekî paşê gava yê ereb xwe piçekî livand mamoste hîn di xew re ne çûbû. Di tevgera yê girtî a piştî, mamoste hayî li xwe bû. Bi alikariya çengên xwe hêdî hêdî radibû, bi tevgerên mîna yekî xewnî. Bê ku xwe tev bide li ser textê razanê welê rûnişt û bê ku berê xwe bide Daru rawestiya, mîna ku bi hemî hestên xwe guhdarî dikir. Daru xwe tevned: her di vê gavê de da aqilê xwe ku demançe di çaviya podyomê de ye. Ya herî baş ew bû ku tavilê biryara xwe bide. Lê li yê girtî mêze dikir yê ku bi tevgerên nerm piyên xwe danîn erdê, piçekî din sekinî û paşê cilên xwe li xwe kirin. Her di wê gava ku yê girtî dest bi çûyînê kir dê Daru tiştêkî bigota; girtî bi gavên edetî lê gelekî bê deng dimeşiya. Ber bi deriyê herî dût yê ku diçû kilerê çû. Bi diqet destîkê derî bada, çû derve, derî kişand lê ne girt. Daru xwe tev ne da, bi tenê weha fikirî: “Ew direve. Baş bû ku ez ji vê diwariyê rizgar bûm!” Lê her çi dibê çî nabe, hîn bi diqet bû. Deng ji mirîşkan ne dihat: yê din li rasteyê bû. Dengê şirîniyekê hat wî; lê berî ku yê ereb di nav derî de xuya bibe wî fêrnekir ka çî ye. Derî girt, bê ku deng derxe çû ket nav nivînan. Wê gavê Daru berê xwe guhert û raket. Piştî di xewna xwe de digot qey wî dengî dibihîst ku hin li dora dibistanê digerin. Ji xwe re got “Ez xewn dibînim, xewn dibînim!”. Û di xew re çû.

Gava ji xewê şiyar bû, asîman zelal bû; di terkên pencereyê re hewayeke sar û paqij dihat hundir. Ereb raketîbû; di bin betaniyeyan de xwe kişandibû ser hev û devê wî piçekî vekirîbû, bi temamî rehet dixuya. Lê gava Daru ew ji xew rakir, şaşbûyî ziq li Daru mêze kir bê ku wî nas bike. Welê tirsîyayî û hov dixuya ku Daru gavek bi paş ve avêt. “Metirse, ez im. Divê em taştê bixwin.” Ereb serê xwe hejand û got erê. Rûyê wî vegeriya tenahiyê lê bi temamî ne li ser hişê xwe bû.

Qehwe hazir bû. Herdu jî li ser textê portativ rûniştin gava qehwe vedixwarin pê re jî nan li destê wan dibirin devê xwe. Paşê Daru ereb bir li ber henefîya li serşokê. Ew vegeriya odeyê, betanî û textê portativ rakirin, textê razanê yê xwe rast kir, derûdor malaşt. Paşê di nav sinifê re çû

rasteya ber dibistanê. Roj êdî li asîmanê şîn li ber derketinêbû; ronahiyeke jîndar û nerm bi ser zozanên tenha de direşiya. Li jêr li quntaran çihine wek pîneyan berf diheliya. Dê midetê ne dûr kevir xuya bibin. Mamoste li ser qelefîskan rûnişt û li dîmena tenha mêze kir. Li Balducci fikirî. Ew xemgîn kiribû, çî bêje ku ew qewirandibû, mîna ku nexwaze bi wî re di eynî keştiyê de be. Hîn jî dikarî dengê cendirme bibihîze gava wî xatir xwestibû; bêî ku zanibe çima, wî xwe ecêb û êşiyayî his kir. Her di wê gavê de yê girtî, li aliyê din yê dibistanê de, kuxuya. Bê daxwaza xwe guh da wî, paşê keviyek avêt ku bi vizîni çû ket nav berfê. Ji ber sucê wî gelekî diqehirî, lê teslîmkirina wî li dijî prensîbên wî yên exlaqî bû: şerefa xwe şikandî didît, pê gelekî aciz dibû. Lehnet li hemwelatîyên xwe dianî ku wan ev ereb bi ser wî de şandibû û lehnet li yê ereb dianî ku yek kuştibû lê aqil pê re tu ne bû ku bireve. Daru rabû ser xwe, li dora rasteya li pêş dibistanê meşiya, bê hereket bîstekê rawestiya û paşê çû hundirê dibistanê.

Ereb li ber henefiyê, li ser erdê çîmento xwarbûyî bi alîkariya du tiliyên xwe diranên xwe paqij dikirin. Daru li wî mêze kir û got: “Were!” Yê girtî li pey wî çû odeyê. Qapûtek li xwe kir û pêlavên xwe hildan. Li piyan li bendî yê ereb bû, ereb şaşika xwe girêda, sandalên xwe xistin piyên xwe. Piştî ku di sinifê re bihurîn mamoste deriyê derve nîşanê yê ereb da û got: “here!” Yê din xwe ji çihê xwe ne livand. Daru “Ez tîm” got. Erebe çû derve. Daru veşerîya hundir, hîn kulînce, xurme û şekir xistin tûrek. Li sinifê berî ku here derve li pêş podyomê saniyeyekê dudilî ma lê paşê meşiya, ji şîpana derî bihurî û derî kilît kir. Got: “Ber bi vê holê.” Bi hêla rojhelet ve meşiya, yê girtî jî da pey wî. Lê gava piçekî ji dibistanê bi dur çûn, jê re welê hat ku dengî jî parve tî. Veşerîya û li derûdora dibistanê baş mêze kir: tiştê ne dît. Erebe li wî dinêhêrî, lê ihtîmala mezin bêî ku tiştêkî fam bike. Daru got “Em biçin.”

Bi qasî saetekê çûn, paşê li kêleka zinarine ji kilsê bêhna xwe vedan. Berf bi lez diheliya, tavê tavilê çalên avê dimêtin, zozan didan ber germahiya xwe hin bi hin wek hewayê zuha dikirin. Gava rabûn ser xwe û meşyan, ji rêçûna wan, ji erdê deng radibû. Li pêş wan bi baskvedana fireh teyrek bi çivîni asîman qelaşt. Daru ronahiya teze bi hilmîne kûr dikişand. Li pêş vê manzereya nas û mezin ya hema bêje bi tenê renezer ku di bin asîmanê mîna kumekî de bû, dilê wî bi şahî tije dibû. Bi qasî saetekê jî, ber bi jêr bi hêla başûr ve çûn. Hatî ber gîrekî ji zinarên terizî. Ji wê derê zozan bi hêla rojhelat ve ber bi deşteke dadiket, ku li wê derê darine fîrk dixuyan, li hêla başûr zinarine mezin xuya dibûn ku dîmeneke derûdora wê bi tundî jêkirî dida der.

Daru bi diqet li herdu aliyan jî mêze kir. Li asoyê bi tenê asîman xuya dibû, çu insan ne dixwiya. Berê xwe da yê ereb yê ku li wî fedikir bêî ku tiştêkî fam bike. Daru tûrik da wî. Got „Bigire. Nan, şekir û xurme ne. Dê du roj besî te bin. Ha ji te re hezar frenk jî.“ Ereber tûr û pere hildan, wisa rawestiyayî û piyên wî di rasta sînga wî de pêçayî bûn; mîna ku nizanibe ka bi tiştên ku wergirtine çî bike. Mamoste rojhelat nişan da û got „berê xwe bide, ew riya ku diçe Tînguitê. Rûya du saetan e. Li wê derê polis û dezgehên hikûmetê hene. Ew li bendî te ne.“ Gava ereber li hêla rojhelat mêze dikir tûr û pereyên ku girtibûn bi sînga xwe ve dişidand. Daru bi hişkî bi piyê wî girt berê wî da başûr. Li bin cîhê ku ew sekinibûn şiveriyek bi dijarî xuya dibû. „Ew şiverê ber bi zozanan diçe. Ji vir bi qasî meşa rojekê tu ê pêrgî erdê çêreyê û koçeran bêyî. Ew ê bixêrlhatinê li te bikin û bi gorî edetên xwe dê te biparêzin.“ Niha yê ereber berê xwe da Daru, tîrsê xwe di rûyê wî de dabû der. Got „binêhêre.“ Lê Daru got „na hiş be, niha ez te bi tenê dihêlim.“ Piştî xwe da yê ereber, çend gavên mezin ber bi hêla dibistanê avêtin, paşê bi bê qerar li yê ereber mêze kir û meşiya. Bi qasî çend deqîqeyan dengê rêçûna xwe ku ji erdê radibû bihîst, berê xwe ne guhert. Lê piştî lehzeyekê berê xwe guhert. Yê ereber li cîhê xwe bû; li piyan û piyên wî şendilandi li mamoste dinêhêrî. Daru jî qirika xwe his dikir ku çawa bêhn lê diçikiya. Ji acîzbûnê çêr kir, destê xwe jî yê din re hejand û di riya xwe de meşiya. Piştî meşeke dirêj careke din rawestiya û mêze kir. Li cîhê berê kes ne dixuya.

Daru dudil bû. Roj gelekî bilind bû bû, niha wî germiya rojê bi tundî his dikir. Mamoste vegeriya, pêşîn piçekî bi dudilî, lê paşê bi biryar meşiya. Gava gihaşt cîhê ku ew sekinibûn di nav xweydanê de mabû, bi helke helkê çû li cîhê herî bilind sekinî. Li hêla başûr zinar di bin asîmanê şin de xweş xuya dibûn, lê li hêla rojhelat, li deştê, mij jî erdê radibû. Di nav wê xumama sivik de Daru bi dilekî giran ereber dît; ku hêdî hêdî ber bi zindanê dimeşiya.

Piştî midetekê, li sinifê, Daru li ber pencereyê li piyan li ronahiya ku ji asîmanê berz li ser zozanan direşiya mêze dikir, lê ne didît. Li pişt wî li ser texteyê nivisînê di nav fetlên çemên frensî ku hatibûn çêkirin, bi destêkî neşareza gotinên ku wî hinek berê xwendibû hatibûn nivisîn: „Te birayê me teslîm kir. Em ji te re nahêlin.“ Daru li asîman, li zozanan, li dîmenên nexuyayî ku xwe bera jêr ber bi deryaya şin didan, dinêhêrî. Li vî welatê fireh ku gelekî jê hez dikir, wî xwe bi tenê his dikir.

* Albert Camus (1913-60) nivîsevanekî frensî ye.

* Komîsyona têvel, dadgehek jî endamên frensî û ereban pêkhati.

Ceribandinên Montaigne

Sermîn Bozarşlan

Wextekê keça xalê min çend kitêb bi diyarî dan min. "Daxwaza min ew e ku tu wê kitabê beriya kitabên din bixwî" got. Dûre li ser rûpela yekem weha nivîsand û îmze kir: "Ez dizanim ku tu yê di Ceribandinên Montaigne de, ji xwe gelek tistan bibînî. Bi heskirinên xwe ve. Pero."

Min bi xebera keça xalê xwe kir û ew dem, beriya kitêbên din ku wê bi diyarî dabûn min, dest bi xwendina Ceribandinên Montaigne kir ku Sabahattin Eyuboglu wergerandiye tirkî û çapxanaya Cem çapkiriye.

Bi rastî jî, gelek fikirên Montaigne ji bo nêzik xwiya kirin. Ez bi wan kêfxwes bûm. Ez bûm heyran ku ji zêdeyê çar sed sal berê ew xwediyê van dîtinên hevdemî bûye.

Ji nivîskariya Montaigne zedetir felsefeya wî ya li ser jiyane bala min kisand. Armanca min bi vê nivîsê jî, naskirina nivîskar Montaigne zedetir, filozof Montaigne e.

Michel de Montaigne, di sala 1533an de li Fransayê tê dinyayê. Di mektebên cuda de, edebiyat, felsefe û hûqûq û zimên dixwîne. Pistî xwendinê wekî bavê xwe dikeve meclisa Beledîya Bordeauxê.

Montaigne, di sala 1571an de dev ji her tistî berdide. Xwe vedikêse nava kitêbên xwe. Ji kutubxanê xwe re van gotinan dinivîse:

"Sal 1571. Michel de Montaigne, 38 salî ye. Rojekê beriya sersala xwe ji xulamî û karmendiya meclisê aciz bûye, lê gelek li ser xwe vedigere nava kitêbên xwe û biryarê dide ku jiyana xwe ya mayin li wir bi bêdengî derbas bike."

Ew di sala 1572an de dest bi nivîsandina "ceribandinan" dike. Cara ewil di 1580î de, du cildên Ceribandinên Montaigne tên wesandin. Lê wexta mirov wê dixwîne nikare bawer bike ku 419 sal berê hatiye

wesandin. Ji ber ku mirov gelek tist ji xwe û ji jiyana niha tê de dibîne. Di Ceribandinên Montaigne de xuya dibe ku ew însanekî pirr alî bûye. Ew ne tenê nivîskar , her weha filozof , zîmanzan, alim û hûqûqnas ji bûye.

Ew dem dihat gotin ku Montaigne xabera dawî hatina dema ronesansê û destpêkirina dema klasîk dide.

Montaigne, di "ceribandinên" xwe de behsa xwe dike. Dixwaze xwe, wekî xwe nas bike. Hisên xwe, dîtînen xwe, daxwazên xwe bê astengî diyar bike. Lewra mirov dikare bibêje ku Ceribandinên Montaigne, di pêvajoya hewldayînê, xwe naskirinê de derdikeve holê. Ew demeka dirêj jiyana xwe ji bo xebatên xwe naskirinê dibuhurîne. Li gor bîr û baweriyên wî, ger mirov xwe nas neke, nikare yekî/a din jî nas bike. Ger mirov ji xwe hes neke, nikare ji yekî/a din jî hes bike. Gelek balkês e ku Montaigne vê rastiyê wê demê tîne zimên ku îro jî derbas dibe. Ger însan xwediyê vê meziyetê bûna, ser jî û gelek trajediyên din jî li dinyaye wê nehata jiyandin. Bi tevayî têkiliyên însanan digel hev li ser bingeha heskirinê bûbûya.

Montaigne di pêsgotina kitêba xwe de cîh dide van gotinan:

"Xwendevan, di vê kitêbê de dek û dolap tune ne. Ji te re di serî de bibêjim ku ez li vir nivîsandina ji bo zarok û mirovên xwe pêştir armançek din nefikirîme. Xizmeta ji te re an jî peydakirina nav û deng ji bo te qet di hisê min re derbas nebûye. Hêza min têrî bazdana li pey armançeka weha nake. Min ev kitêb nivîsî ji bona mirovên min hêsanî be. Min xwest ku wexta min wînda bikin (ku gelek nêzik e), zanyariyên wan di derheqê min de hîn betir û zindîtir bin.

Ger niyeteka min a xwe dan ecibandina bi herkesî hebûya, min ê hewl bidaya ku bi halê xwe yê lierî bisetafat derketama. Ez dixwazim xwendevan di kiteba min de, min sade , tabî û bi halê xwe ya rojane bibînin. Li vir, ez însanekî çawa me û kêmasiyên min çî ne qasî ku edeb û terbiya min destûrê bide, dê bi eskere bê dîtînen....."

Belê Montaigne ji ber ku ji bo xwe û ji bo kesên xwe yên hêrî nêzik nivîsandiye kitêba wî ji însanan re balkêstir û nêzîktir tê. Ez bawer dikim ku her kes ê di Ceribandinên" Montaigne de, ji xwe tistan bibîne. Ew bi riya ceribandinên xwe, hem nêzîktirê xwe û hem jî kesên nêzikî xwe bûye. Bi vî awayî xwe nêzikî me xwendewanan kiriye.

Ew dixwaze bi her awayî kitêba xwe, wekî xwe bixwe binivîse ku xwendevan tê de wî bi xwe bibînin. Lewra çawa difikire weha dinivîse ji xeyrî xetayên ku ji ber bêdiqetiyê çêbûne naxwaze wekî din nivîsên xwe

dûre rast bike. Li gor hinekan ew gotinên qeba bi kar tîne. Jê re rexneyên bi vî avayî tên. Li ser navê gramerê, rast nivîsînê hin kes, pê tinazê xwe dikin. Lê Montaigne her tim diyar dike ku ew dê ji peyvên ku di kolanên Fransayê de tên bikaranîn nereve û wan peyvên ku di nivîsên xwe de bi kar bîne. Ew dibêje ku ew di jiyana xwe ya rojane de ji wekî di kitebê xwe de dike, pirr bi eskere xeber dide. Xwe tam nîsan dide.

Montaigne bala xwe pirr dide ser felsefeyê. Li ser pirsên jiyane difikire û wan sîrove dike. Di meseleya basbûyîn û alikari kirina însanan de weha dibêje:

” Ger insan ji bona ku dê bê zanîn û wexta hat zanîn dê bi xatir û qîmet bibe, dibe însanekî bas û bi sertê ku însanên din bibihîzin alikariyê dike, ne ew însanek e ku mirov jê feyde bibîne ”. (R.48)

Montaigne di dema xwe de li hember qanûn, adet, tabû û tistên weha derdikeve ku, mirovan, ji xwe bixwe eskere nîsankirin û ifadekirinê dîr dixin. însanan ji însanetî derdixin.

Ew pirr hêrs dibe ku jin li pêş însanên din xwerinê naxwin. Ji vê ihtiyaciya xwe serm dikin û wextê xwerinê xwe vediserin. Li gor Montaigne insan carna, ji xwe re derdên weha çêdikin ku di aslê xwe de tune ne. Serê xwe bê sebeb dixin belayê.

Li gor wî , welat guhartina pirr an jî seyahata pirr bingeha însanan gelek naguherîne, ji ber ku insan here ku xwe ji bi xwe re dibe.

Montaigne, acêbmayî dimîne ku, gelek insan ji bo xwe û kesên nêzikên xwe hiç tistekî nakin, xwe layiqî tistekî nabînin lê ji bona axakî an jî qiralekî xwe davêjin ber mirinê. Ew dîsa pirr hêrs dibe ku insan ji bo menfeetê ser û qetliaman dikin. Gelan qir dikin. Ew degereka mezin dide tekiliyên dostaniyê. Ew bawer nake ku wan kesên ku bi navê menfaata gîştî, menfaata welat ji merivên xwe dostên xwe dîr dikevin û ji wan hes nakin. Ew bawerî nake ku mirovên weha karibin ji welat hes bikin.

Divê mirov ji lasê xwe razî be. Yek ji wan nexwesiyên herî bibela neheskirina lasê me (bedena me) û biçûk ditina wî ye. Ger meriv ji xwe û lasê xwe keyfxwes nebe dê hertim nerehat be, li gor Montaigne.

Ew eciz dibe ku insan bi navê menfaata gîştî û qanûnan kirinên ne bas dikin, însanan dikûjin, zulm û îskencê li wan dikin û her tistî ji xwe re mubah dibinin. Ew weha difikire ku, gelek kes ne ji bo ku serek bi heq e ser dikin. Bi tenê ji bo menfeeta sexsî an jî ji bo xulmê li însanan bikin ser dikin û naxwazin ser dawî be. Ew mînaka du eskeran dide . Yek ji wana di serekî navxweyî de ferq dike ku birayê xwe kustiyê. Dûre ji qedere û

sermê dere xwe jî dukuje. Çend sal pasê disa di serê navxweyî de di nav eynî gelî de eskerekî din, birayê xwe bi zanistî dukuje û dûre ji fermanarên xwe medalya dixwaze.

Li gor Montaigne, bi çî navî bibe bila bibe, nabe însan mafên kesan bertaraf bikin. Dijmin jî be hin heqê wî yê insanî hene ku divê mirov destdirêjî neke û van heqên insanî nexe bin nigan.

Montaigne, çar set sal berê li hember ser, talan û îskence ji bo mafên insanetiyê dengê xwe bilind dike.

Ew tahamula koletiyê nake, weha dibêje: "...Ger qanûnên ku ez xizmeta wan dikim tiliya min a piçûk jî qadexe bikin, ez li ku bûma ferq nake, dê ji xwe re li qanûnên din bigeriyama."(R.139)

Divê meriv, zimanê heyî bikar bîne û wê xurttir bike. Nabe ku her yek ji xwe re zimanekî çêbikin. Hin hosteyên gotinan jî hene ku dixwazin balên xalkê ji tistên ku behs dikin zêdetir bixsînin ser xwe. Montaigne, ji wan hosteyan nefret dike. Ew jî tistên zorakî û sextê nefret dike. Ew weha daxwaz dike ku herkes wekî/a xwe bi orjînaliya xwe bê qebûlkin.

Montaigne heyfa xwe tîne ji bo qiral, hukumdar, serok û kesên wekî wan bi hukum. Heskirin û hurmeta ku xelk nîsanî wan dide, ne ji bo wan bixwe ye ji bo rutbeyên wan e. Di eslê xwe de ew jî herkesî zêdetir bi tenê ne û bê dost in. Millet jî bo ku ditirsin îtaatî wan dikin wekî wan difikirin û ji wan re çepikan dikutin ne ji ber heskirinê.

Ën ku pîrr dûrî insanan in, bi wan re nedin û nestûnin, derdên xwe bi wan re parve nekin, Ew nikarin têkiliyên dostanî deynin û aliyên xwe yên insanî nîsan bidin. Her weha li gor Montaigne, însan baweriyêherî pirtir bi tistekî an kesekî wiha dikin ku li serê herî kêmtir xwediyê agahdariyê ne. Lewra gelek kes ji kesên ku vekiltiya wan dikin bê sik bawerî dikin. Ewan jî xwe re xwedê qebûl dikin.

Montaigne, ji tekiliyên efendî û hizmetkarî pîrr aciz e. "Di cihekî de, di navbera efendî û xizmetkaran de cudabûyin kêmtir xuya be, tê wê maneyê ku li wir nîzameke bidelettir heye" dibêje (R.336).

Ew her weha wan kesên ku bi qebadayitîyê, bi zorê dixwazin dîtînen xwe bidin qebûlkin, ji eqil zeif dibîne.

Li gor Montaigne, divê dost, bi tîrsa hev û du sikandinê hereket nekin û bi vî awayî di navbera xwe de hewayeka sextê û derewîn çênekin. Divê dost karibin ji hev û dû re dîtînin û rexneyên xwe pîrr vekirî bibêjin û ger pêwîst bike karibin minaqeseyên hêrî zor jî bikin ku dostaniyên wan nemire.

Em nezîkî sala 2000 î ne lê insanên ku weke Montaigne bi mejiyê azad difikirin û gotînen xwe vekirî dibêjin û li pêsiya civatê ne, ne gelek in. Lewra halê me jî ev hal e. Bila Montaigne, bi me nehese!

Tirsa mirinê

Mêvan B.Batê

Mihemed li dor 25 salî û ev 7 sal bûn ku jina xwe Besna anî bû. Du zarokên wan hebûn, Gulîstan û Silêman. Kurik hê li destê dê 5 heyvî bû û Gulîstan 3 salî bû. Ew li gundê Alaqemşê diman.

Mihemed hê nû ji bavê xwe yê mirêba çê bûbû. Wî jî weke bavê xwe mirêbatî li cem xwedî milkekî dikir. Cotê Qantiran û mirêbatîya jî dehan yek têra nanê rojê nedikir. Mihemed bi nêt bû ku karekî baştir bike, da ku jî feqîrtiyê hinekî dûr bikeve. Carcaran jî xwe re digot:

-Ma ev jî kar e? Ez bi nanezikê dişixulim? Ma ne baştir e ez jî weke Birahîmê Keleş qaçaxiyê bikim? Weke ku Besna dibêje ew her sibeh çayê û zeytûnan dixwin. Û carna jî xurmên ku Birahîmo jî binxetê tîne diqelînin û dixwin. Lê taştiya me, ku hebe... nan û dewe.. Bi xwedê gelek caran jî nanê çeyî ye..

Lê Besna razî nedibû. Ew jî cendirman ditirsiya ku car-caran Birahîmê Keleş dibirne qereqolê û eziyet didanê. Û jî Mihemed ra digot:

-Kuro wele halê me baştir e!..Hema em parîk nanê çeyî jî be bi rehetî dixwin. Lê em jî xezeba cendirman dûr in û navê te di deftera wan de nîne..

Mihemed lê vegerand:

- De bes e Besna.. Tû nizanî çi dibêji!..Ma wê roja han ez bi xeletî di şûna Birahîm de têr lêdan nekirim. Arguşkên min bi buksan anîne xwar. Heta ku fêm kirin ku ez ne Birahîm im îşê min qedandin!!!Na Besna na, min biryar daye ez ê qaçaxiyê bikim..

Mihemed carekê-diduan jî Birahîm re got ku dixwaze qaçaxiyê bike. Pêşiyê Birahîm guh neda wî lê belê pişt ra daxwaza wî qebûl kir û got:

- Baş e!.. Bi me re were, lê bi himaltî. Ez dê serê mil 25 weraqên tirkî bidim te. Eger perên te çê bûn, tû dikarî mal li ser hesabê xwe serxet û binxet bikî. Eger tu amade bî îşev na yeke din em dê biçin.

Mihemed bi vê gotîna Birahîmo gelekî kêfweş bû û bi lez çû malê û mizgînî da Besna.

Piştî vê yekê Mihemed çar-pênc caran bi himaltî bi Birahîmê Keleş re bi himaltî çû binxetê û hat . Hinek perên wî çêbûn û çend carekî jî mal ji xwe re kirî û li serxetê firot. Fêdeke baş bi ser xist. Di qedera du heyvan de hatîna wî ji ya mirêbatîya du salan baştir bû.

Her carekê ku diçû binxetê çavên Besna li riya wî diman. Ew kêfxweş bû ku halê wan xweştir bûbû, lê ew ditirsiya jî . Guhên wê bi ser sînor ve pêl bûn. Ku dengê tivingan dihat, wê ji tîrsa nizanî bû çî bike!!!. Lê ku Mihemed dihate malê dilê wê xweş dikir, û digot:

- Ev teqandin ji avruyê re ye.. Birahîm û başçawîşê qereqolê tifaqdar in. Bi vî awayî usttegenê Bawerdê dixapînin. Carna çend serî sewal û carna jî çend milên partalê arzan bi şûn xwe ve dihêlin, û rengê serekî ji dil didine teqandîna bi derewan.

Ëvareke havînê, Besna û zarokên xwe li serê bên li ser erzêla xwe bûn. Zarok ji mêj di xew ve çû bûn lê xewa Besna ji tîrsan nedihat. Guhên wê bi aliyê sînor ve pêl bûn. Wext ji nivêşevê derbas bûbû. Heyverêş û şev gelekî bê deng bû. Ji nişkê ve bû xurêna tivingan. Besna hilcenî û guhên xwe bi aliyê dengê tivingan de pêl kir. Piştî reşêşeka tivingan a çend deqîqan şev dîsa ker bû.

Besna dilê xwe bi gotinên Mihemed yên berê xweş dikir û dua jî dikirin ku Mihemed hêsa vegere malê. Lê dengên temetîkê ev ramanên wê ji hev bela kirin. Dengê tivingan bi wext re hê zêdetir dibûn. Weke ku tu xwê tîxî êgir. Şer nêzikî niv saatê dom kir. Besna fêm kir ku ev şer ne weke yê caran kurt bû. Rohnikên cemsî cendirman li sînor xuya dikir. Dengê qêrînên cendirman bi ser gund diket. Besna him jî tîrsan dilerizî û him jî bi dengê nizm dua dikirin. Piştî bê deng bûne li sînor bi gelekî Besna şiyar ma û guh bi ser sînor de pêl kirin . Bi hêviya ku tiştêkî bibîne yan jî bibihîze. Bi vî awayî bê hemdê xwe xilmaş bû. Lê gelek tê ve ne çû ku Besna li dengê xelbixelb û qerebalixê şiyar bû.

Hê segurk bû, dinya baş rohnî ne bûbû. Besna çavên xwe ji xewê firkanî da qenc bibîne. Ewê dît ku birek xelk (mêr, jin û zarok) li pêşîya neh-deh candirma ne û berê wan dane hewşa mala muxtar a mezin. Cendirman bi qundaxtingan û bi daran li wan mirovan didan û bi wan de diqîriyan. Denge jin û zarokan li azmanan dirawesta. Mirovna dixwestin xwe ji komê xilaskin û birevin, lê rastî lêdan û tehdîdên cendirman dihatin.

Besna ji aliyê gund yê din jî qerebalixek bihist. Qeflek mirovên di jî ji aliyê Serkahnî ve li pêşîya cendirman bûn û berê wan dane hewşa camiyê

ya li nivê gund û nêzikî mala wan.

Besna mabû şaş nizanî bû çî bike. Hate bîra wê ku xwe berde jêr û tevli zarokan xwe di kadînê de veşêrin. Ewê bi lez da xwe; Silêman da milê xwe û Gulistan ji xew şiyar kir û bi dest xwe re hiland û bi lez xwe bi şêlmê ve berda. Hê pêpelûka tali ya şêlmê xilas nekiri bû du cendirme ketin devê deriyê hewşê. Besnayê berê xwe da serê bên û bi şêlmê ve bi hawa ket. Lê cendirman bi tirkî lê kirin qîrên û bû şerqe-şerqa tivingên wan. Besna tirsîya ku wê bikujin û di nivê şêlmê de rawesta. Cendirman êrîşî wê kirin, ji şêlmê de anîn xwarê û pê ketin bi dar û qûndaxtingan. Mefera Besna ew bû ku zarokan ji derbên wan biparêze. Zarêna zarokan bi ser dengê sixêfên cendirman diketin.

Her du cendirman Besna tevli zarokan dane pêşîya xwe û berê wan dane hewşa camiyê. Yek ji cendirman ji yê dî zalimtir bû. Bi riya camiyê de sê-çar caran singo di nav milên Besna dirakir. Ne derbên kuştinê bûn lê gelekî jan dida canê Besna ciwan. Besna ji tîrsa kuştina zarokên xwe gelekî bi janê ne dihisiha. Ewê zarokên xwe ji derbên singoyan diparastin. Bi ser ku camî cîranê mala wan jî bû lê riya camiyê ji Besna re bê dawî xuya dikir.

Besna hew xwe dît ku wê li hewşa camiyê ye. Hewş ji mirovan û heywanan hati bû dagirtin, rê di riyan de nema bûn. Qêrîn û zûrîna mirovan guh ker dikirin. Wey li wî ku li hev bipirse û xwe bighîne nêzikî nasên xwe. Kesî baş nizanî bû ka wê çî bête serê wan.

Besna ji gundiyekî li rex xwe pirsî:

- Keko çî bû ye? Doza çî li me dikin?!!

- Ez jî nizamim xuhê!!.. Ev usttegmenê han dibêje ku şevê dî we li sînora başçawîşekî min kuştîye, ez dê we hemiyan bikujim û bişewtînim!

Besna bihitî ma!! Di dilê xwe de got: "Eger ev romî zanibe ku ez jina Mihemed im ew ê min û zarokên min berî hemû kesî bikuje.

Besna got:

- Keko ma ev çî xerîb in ku ji gundên der-dorê anîne, ma wan çî kiriye?

Gundî:

- Usttegmen dibêje; "hûn Kurd hemû weke hev in. We yek ji me Tirkan kuştîye ez dê heft gundan bi jin, zaro, mêr û heywanan ve bikujim û bişewtînim. Da tu Kurdên din newêribin Tirkekî bikujin." Xwedê arîkariya me bike!!! Ev usttegmen gelekî zalim e!!! Ma ku me hemiyan bikuje, kî wê bêje çima?!!..Ew, Anqara li piştê wî ye.. Ma ê me kî me heye?!!

Ji tîrsa nava Besnayê dilerizî.. Ew pê dihisî ku wê tiştêkî gelekî

xirab bête serê wan. Çavên xwe li dora xwe gerand da ciyekî veşartinê ji xwe re peyde bike. Çavên wê li deriyê camiyê û berqela pişt derî ket. Hêdi-hêdi xwe bi aliyê derî ve vedizî û kete pişt derî. Destê Gulîstanê kişand û êxiste nav çogen xwe û Silêman bi himbêza xwe ve dewisand.

Deriyê hewşê bi nermayî bi ser xwe de kişand. Wilo çê bû ku wê hemû kesên li hewşê di nav derzên derî re diditin, lê wê ji wan ve xuya ne dikir.

Roj nêzikî taştiya palan dibû, lê hê jî xelk li hewşê dikirin kom.

Usttegmen li ser qatikê limêjê yê hinekî ji erda hewşê bilindtir sekînî bû û emir didane cendirman.

Rê di hewşê de ne ma bû. Weke Besna didît nêzikî sed-sedûpêncî mirov li hawşê civandi bûn. Di rêza pêşî de, nêzikî usttegman, cîrana Besna, û hevala wê ya zarokî, Zerîfê bi ber çavên wê ket. Kurikê wê yê xweşik, Bexes li milê wê bû, bi her du çavan rondik dibarandin. Li dora xwe bê hêvî dimeyzand. Besna dît ku ji nişkê ve Zerîfê, Bexes li ser destê xwe yê rastê kir, û ber bi usttegmen ve bilind kir:

-Romiyoy!!!..kerem ke bere ev kurikê xweşik ji te re be!!.. Ez zanim ku hûn ê me bikujin..Hema bere ev kurik ji te re be...

Usttegmen bi xezeb li Zerîfê meyzand, tivinga singolêdayî ya cendirmê rex xwe jê wergirt û bi qewet li zikê Bexes da. Singo di nav piştê Bexes re derket û usttegmen ew ji nav destê diya wî hilanî...Barêna Bexes nivê ma, lê barêna diya wî bi ser gund ket. Zerîfe xwe rakişande usttegmen, lê bê fêde bû. Usttegmen pêre-pêre got:

-”ATEŞ SERBEST” (Agir serbest).

Xurên kete dengê tivingên cendirman... Xelk weke pelên daran ku payîzan ba lê dixê bi ser hevde dihatin xwar...

Çogên Besna di piştê derî de şikestin û wê çog vedan . Bi her du destan Silêman û Gulîstan bi ser xwe de didewisandin...Lê wê hemû tişt di nav derzên derî re didit..Cendirman çavên xwe li yên sax û birindar digerdandin, û ew bi derbên singoyan timam dikirin...Usttegmen emir didan û bi xwe jî tevî komkujiyê dibû. Besna ji tirsê hay ji zarokan ne ma bû , lê bê dengiya Gulîstanê bala wê kişand. Gulîstan di nav destên wê de xeliya bû, û xwîn ji dev û bêvila wê dihat.. Bê çare Besna li ber xwe da ku can bi Gulîstan bîne...Gulîstan can sipartî bû...

Silêman bê navber digirîya. Besna selisî. Lê pişt re liate bîra wê ku sînga xwe têxe devê wî..Silêman sînga wê nedigirt û girî betal nedikir.. Hewşa camiyê her diçû ji nalnalê xalî dibû.. Ji ber ku cendirman hemû kes kuştibûn û hê jî li birindaran digeriyan. Besna sînga xwe bi kotek bi devê Silêman de dewisand. Ew hinekî bédeng bû.. Lê ku Besna sînga xwe

ji ser devê wî sist dikir, Silêman dikire girî. Besna, ne çar singa xwe bi ser devê wî de didewisand..Silêman bê deng bûbû, û cendirman jî gera xwe ya nav laşan qedandibûn.

Wext nêzîkî nîro ,cendirme bi hêviya ku kesek sax nemîne, agir berdane laşê mirovan yên li hewşê û derketin çûn...

Besna, bi ser ku baş wext derbas bûbû jî , hê jî newerabû singa xwe ji devê Silêman derêxe!!! Ditirsîya ku cendirme pêjna giryê wî bikin û li wan wegerin û wan bikujin. TIRSA MIRINÊ ew bê hest û kor kiribû. Bêhna dû zor dayê ku bikuxe.. Bi kuxikê re singa wê ji devê Silêman derket..Lê pêjin jê ne hat...Hinarîkên ruyê Silêman sipî bûbûn û çavên wî bel bûn..Besna ew da ber maçan û got:

- Lorî Silêmanê mino lorî...Gulîstan Tîrkan kuşt dayka te kor bibe, şîr daye te bi zorî!!!..

Ferhengoka Şêx Fethula Werqanîsî

Zeynelabidîn Zinar

Şêx Fethullah Werqanîsî di 1847ên Zayînê de li Werqanîsê hatiye dinyayê û di 1900î de li Bedlîsê çûye ber dilovaniya Xwedê.

Wî gelek pirtûk nivîsîne, hinek ji wan bi kurdî ne, lê me nepeyîtandiyê ka çend ji wan bi kurdî ne.

Dîwana wî ya ku ji 6.196 malikan hatiye dagirtin, di nêz de ji çapê derdikeve.

Ev 192 bêjeyên balkêş ku ji ferhengoka Werqanîsî hatine wergirtin, pêşkêşê xwendevanên kovara ÇIRAYê dibin:

Ajar: azbat, sulale.

Asim: zenb, guneh.

Awar: xwediyê êşê.

Bacan: rihdar, jîndar.

Badî: eşkere, diyar

Badîpa: lirêçûna pir zû.

Bahr: xarîqulade, ji edetê der.

Baze: bi erebî *meftûh* yanî wekirî.

Bêşî: dehla ku darên wê yên fêkî ne.

Belîç: tiliya li kêleka ya qiliçê.

Berheba: îmhabin.

Berxwar: fêkiyê xweşiyê dixwe, jê xweşî dibîne.

Bextwend: xwediyê demepêşê.

Bih: xweş û delal.
Bingeş: Binçeng.
Binyad: bingeh.
Cah: rutbe.
Cawîd: ebedî, daîmî.
Çenedar: Belîxê şedîd, di axaftinê de bi tesîr e.
Cewl: a) hereket, libat, b) nivisandina pirtûkê
Cewr: zulm.
Çiknût: çikûz, bexîl.
Cilop: parî, pariyek şeker.
Cûvan: mana bi hesretê, daxwaza suhbetê.
Cûvanî: talib, muhib.
Çîrp: taze, xweş, şîrîn.
Çovan: daxwaza pir zêde.
Dadar: hakim, dadmend.
Dadîres: bi erebî muxîs, kesê ku mirov hewara xwe dîgehînê.
Darijandin: ji kelandinê bilind bû.
Darijî: ji aliyê hêzeke duyemîn ve hatiye rijandin.
Darû: dewa, tedawî, doktor.
Dehişt: gaziya bi dengê bilind.
Demsaz: durustî.
Destîres: hakimiyet
Dexel: kîn, rik.
Diman: şubh, misl, wekebûn.
Dohe: xalis, safikirî.
Ehî: manî, asteng.
Endam: cesed, laş, gewde.
Êvişandin: men'kirin.
Êwirandin: civandin, sekinandin, bicihkirina tê de.
Fertût: qermeçandina serçav ji ber pîrîtiyê.
Ferzane: bêhemta, yê wisan tune.
Feyrûz: ji ceza beraet bû.
Fît: libata quretiyê.
Fîzar: qêrîna bi şewat
Fotîn: potîn.
Gêdûk: geremola nederketinê, ketiye navê lê riya derketinê
nabîne.
Gint: bilindayî, gir.

Gulişk: Guliyê dara fêkî
Guntar: qewl, gotin, xeberdan.
Guwah: şehadet, kelîma şehadetê.
Helîme: goştê ku pir zêde hatiye pijandin.
Hemdem: refîq.
Henûn: muşfiq, bi şefqet.
Hergele: îzdîham.
Hergiz: esla, qet'a, bi tu sûretî
Herwele: loqegur, çûna weke ya guran.
Herze: tirsê zêde.
Hewazin: a) vegirtina çadirê, b) qîreqîra bo ahkariyê, c) derketina
ji nedî ve (bi tirkî *çikişyapmak*).
Hewbe: bi erebî *zenb*,
Hewlnak: bi tirs, mexof.
Hilmişandin: li hev edilandin, li hev rastkiirn.
Hilqijandin: hilqijîn: herikîn, heriknadin. Av diherike.
Hingame: ezîm, mezin.
Hîre: hîro, fêrkirin
Hît: nihît, qirase, zirzope, mezin.
Hokehok: axaftina şivên bi pezê xwe re.
Hûçik: qilçikê zend.
Iksîr: kîmya
Kakojî: daxwaza zêde, viyan.
Karîsaz: sazkerê îş. Ev, xeysetekî Xwedê ye.
Kast: kêr, nuqsan.
Kehkeş: rîya kadiz.
Kelal: aciz.
Kemberbeste: di emr û fermanê de hazir in
Kespik: morîka nezerê
Kew: wî kewa xwe dit, kewiya
Keywan: qesr, koşk.
Kilk: qelem, xame.
Kitmûk: boyaxkirin.
Kuşad: vekirî, beşerxweş, meftûh.
Kulîne: textê razanê.
Kurîşk: porê xengalokî, gustiloka por,
Lewend: şerîf.
Lewn: dek û dolab

Maye: esl, ajar, koka mirov.
Mederkar: Çend kes bi hevûdu re îşekî xirab dikin.
Medîn: heyran.
Mehder: şefa'et.
Mehî: delal, rind, xweşik
Melî: dengxweş.
Menal: serwet.
Meyn: xîlaf im, dij, vaji.
Mîhan: gihastî, pijiyayî, qencîr (ermîş)
Mîm: misqalê zere.
Mîrxandin: kuştin û wêrankirin.
Nageh: ji nedî ve, fucet
Namîdar: enbiya, piraniya nebî-pêxember.
Nedîm: refîq, heval, hogîr.
Newl: terz, qayde, tewr, usûl.
Neykol: şûrê bi ku erebî dibêjin *filûl*.
Nêze: Tûjahiya serê rimê, sintûrik û tiştên wisa.
Nîşandin: danîn, bicihkirin, tê de çandin
Nîşatir: bi erebî şecî'.
Nîgah: muhafaze, parastin
Nihandin: nihand, bi cih kir, li serê danî
Nivîsayî: kîtabet.
Numa: bi erebî *zehere* yanî eşkere bû.
Padaş: binling.
Payan: nîhayet.
Paye: rutbe.
Perwa: iltifat.
Peyember: pêxember
Peygar: herb, şerê di navbera du dewletan de.
Peyk: qasid.
Pezîr: şehriyar, pejîr, meqbûl, xelîfe. Xelîfeyên Pêxember çar in;
Pol: polê mil, hestiyê pehn di jora mil (pîl) de.
Qaqîl: cûreyek bihnxweşi.
Qelaş: bi erebî *muznibîn*.
Qelpik: kelpik, kapika arvan. r:135/13
Qermûçk: quncirîk.
Qerzîl: Pelê dara xurmê.
Qeyser: siltanê menşûr

Qîl: germî, heraret.

Qilîç: tiliya li kêleka ya belîçê.

Qulal: serê çiya devera serçimka tûj.

Qurfus: qelefîsk.

Rabest: Hazirbûna li pêşberê serdarê xwe. Dema ku serdarê leşkeran dibêje *rabest*, tevek dikevin haziriyê û li ser nigan çik disekinîn, destên xwe jî bi ranên xwe ve dizeliqînin.

Raçandin: nivîsandina muhrê, kolana di hesin û kevr de:

Ram: îtaet, mutî?. Mirov *ramtî* jî dewleta xwe re dike.

Reşk: hesed, hevsûdî.

Rewan: ruh.

Rexs: Bereket

Reza: cefa, eza.

Rîş: birîna pir xedar.

Riha: xilasî, felat.

Rihaker/. xilasker, felatker.

Rimbaz: a) yê ku rimê delal dişixulîne, b) xwediyê huner.

Shwas: ceribandin, îmtîhan

Sitûnizm: riayetkar, mutîh

Şatîr: di zanînê de jêhatî, şeci?.

Şayiste: laîq, babet, hemkûf.

Şhame: bi erebî *muruwwet*

Şhm: ezemet, mczinatî.

Şehrîyar: pezîr, sultan.

Şhwar: layiq û sezayê şahan.

Şeml: civat, cem'iyet.

Şerefbexş: şerefê dide.

Şivêle: jî nêvê serê mirov heta eniyê, xeta vekirî ku por li herdu aliyan tewandiye.

Takêş: cedwel, xeta ku bi cedwelî hatiye kişandin.

Talde: تنها, xalî jî xelkê

Taqaz: qewet.

Tawîn: hesret, dema dengbêjek distirê, di nava sitirana wî de kesên li dorê dibêjin "tew" û dirêj dikan.

Tebah: bê fayde.

Tefav: bi ruhnî (vajiyê wê: tarî ye).

Temrîn: tecrûbe.

Ten: nefis, mêr, peya.

Terez: teres, xebîs
Tewan: keslanî, sistayî
Tewtewe: bi kêrê çu tiştî nayê.
Teyh: talûke, xeter. Ev bêje weha di helbestê de hatiye bikaranîn:
 “Lîsanê di Kurdan rihakem ji *teyh*, Heye yek bibê
 rehmetsullah 'eleyh”
Tursan: bi erebî *xaîf*.
Vewestîn: daxwazkirin, telebkirin.
Vexwer: tiştê ku tê vexwarin.
Virêkirin: şeyandin, hinartin.
Virî: muxalif, vajî, dij.
Wehm: heybet, tîrsa xeybî.
Werandin: danîna li şûnê.
Weris: weres: rengê di navbera sor û zer de. Û dibêjin jî ku rengê
 di navbera sor û kesk de.
Werte: di wê werteya zorê de, di wê dema zehmetiyê de
Xela: tuwalet.
Xirîdar: kirrox, muşterî.
Xudûk: mehzûn, teheyur, ponijdayî.
Xunçe: xunçeya gulê ya nepîşkiftî.
Xût: niyet. Ev bêje di helbestê de weha hatiye gotin: ”Qelem rabe
 meqsed ji bo me bibêj, Û *xûta* dilê xwe ji bo me bibêj”
Yekta: yê wîsan tune.
Zal: kesê pir bedew.
Zebûn: rezîltî, bi erebî *zîllet*.
Zêwirandin: bi erebî *tahe*. Ev bêje di helbestê de weha hatiye
 gotin: „*Girî, zêwirî, nalî Adem gelek*“
Zişt: qebih.
Zimanawer: fesahet û belaxet.

Têymûraz çawa kirin şayîr

(Ji bûyarên rojên buhurî)

Tosinê Reşîd

Li bajarê Tilbîsê sersal bû. Di her malê da sivrên mezin, çawa seva şaya, vekirî bûn.

Kevanîyên Tilbîsê hiz ne dikirin wê rojê ser sivra wan tiştêk kêmbê. Îcar ew maye sibê bigotina ser sivra filankesê bêvan tişt tune bû. Ew ne tiştê bûyînê bû. Carna xarinên amade kirî pê ra nedigîhandin bixun, hinek ji wan xirav dibûn û dirêtin. Lê yeke, wê rojê gerek her tişt ser sivra te hebûya. Usa dibû, seva sivra sersalê ewqas xerc dikirin, çiqas têra wane mehekê dikir.

Têymûraz şofêrê taksyê bû, mirovekî xweyî qedir, xweyî rûmet, xweyî pere, lema ji Gûhkoya jina wî wê دنیا xirav bikira eger sivre ne bi dilê wê bûya. Canikê bi xwe ji jêhatî bû; seva sersalê ewqas cûre-cûre xwarin çê dikirin, ewqas cûre-cûre salat çê dikirin, ewqas cûre-cûre totik û kade dipetin, wekî bi xwe nizanibû gişka dayne ku û hineka ji wan usa jî ser sivra wê ji xwe ra cîh ne diditîn.

Ê, destê Têymûraz da hebû, xema jinikê bû!

Lê îro kevanî bêtir diçe, tê. Mêvanê qedirbilind hatine mala wan; nivîskar, rojnamevan, mervên usa, ku bi têtêvîzîyonê carna dipeyivin, di derheqa wan rojname dinvîsin. Îro Bextewar, Dinêdî, Malava û Zarîrin hatine sersala wan pîroz bikin. Ew gişk ji eşîra wê û malmêranê wê ne,

herdem ser şîn û şayên hev in.

-Kurap, ev çi şeraveke xweş e, te ew ji ku bi dest xistiye?-Bextewar, ku li serê sivrêyî jorê rûniştiye, piştî kasa xwe heta binî valake ji malxwê pirsî.

-Na, nabêjim.- Têymûraz kenîya û di nav rêza diranên wîye ji duyê cigarê zer bûyî, herçar diranên zêr çûrisîn.- Çira bêjim ya te jî hebe. Kingê medê te kişandê were mala kurapê xwe em bi hev ra vexun. Tu kurapê min î mezin î, mal mala te ye, tu dikarî bê min jî bêyî, bixwî, vexwî.- Paşê vegeyîya ser jina xwe.- Qîza Tiko, dibe tu dilê xwe bikî, wekî kurapê min bê mala min, he?

-Kurapê te ser çavê min ra hatîye. Dewlet serê te, şikir mala têr, tijî, kingê dixweze bira bê, ez çira gere dilê xwe bikim.- Gûliko bi merdane got.

-Ez çi zanim, dibe tu jî mîna jinê hineka bikî.-Têymûraz ber xwe da got û bin simêlan da bişîrî.

-Têymûraz, tu kurapê min î, lê ez ê ji te bixeyidim. Gûlikoya bûka min ra tiştê usa nebêje. Ew qîza Tikoyê destebirakê min e. Heta niha jî li bazara Sabûrtalo kes nikare ber wî bêje viq!- Bextewar bi henek pêçîya xwe ser Têymûraz da hejand.

-Ne heyf.- Malava jî aliyê xwe da got.- Tikoyê me rastî jî mêrekî hêja ye. Çiqas min bibîne bêyî vexwarin bernade.

-Meriv gere ya mêra unda neke, welle camêr î mêr e. We rojê ez çûbûme bazarê, min ancax xwe ji dest wî filitand. Îcar wî jî aliyê xwe da şampany vedikirin, hevalê wî jî aliyê xwe da. Min kir, nekir, nehîşt ez jî şampanyekê bikirim, got: " Na, tu ser aylixê dijîyî, perê te tunene." Qet nizanim me çiqas şampany vexwarin. Paşê jî taksî girt, ez şandime malê. Sibetirê ez rabûm herime kar, dinhêrim çentê min giran e. Tu nevê du şampany jî kirine çentê min.- Zarîrin jî çiroka xwe got.

Şeravê hêdi-hêdi serê lawika germ kir, reng û rûyê wan sor kir. Rojê çûyî anîne bira xwe, demên kêfa û şabûna anîne bira xwe.

Gûliko hema usa ser pîya bû, xarinek dibir, yek dianî, temetîskek dibir, yeke din dianî.

-Bextewar, eger destûra te hebe ezê tişteki bêjim.- Qotê Malavayî keçel êdî jî şeravê sor bûbû.

-Kerem ke, kurap, ev welatê dêmokratîyê ye, çi dixwazî bêjî.- Bextewar hinekî metelmayî lê nihêrî ka wê çi bêje.

-Na, tu kurapê min î mezin î, eger tu destûrê nedî, ez nabêjim.- Malava

peyva bi zor hev va dike.

-Bêje, Malava, bêje. Îro di dilê kê da çi heye, gişk bira bêjin, em di mala kurapê xwe da ne, kesî xerib nav me da tune.- Bextewar got û çavê xwe ji Têymûraz ra qurçimand.

-Bextewar, dibe tu henekê xwe bi min dikî.- Malava ew yek dît û xwest teherekî dilmayî kurapê xwe binhêre.

-Ez henekê xwe te nakim, ez bî te şa dibim.

-Usan e ez ê bêjim.- Malava rabû şipîya, kursîya bin xwe hinekî şûnda da, kasa xwe hilda destê rastê, hinekî bilind kir û got,- Em îro mala Têymûrazê kurap da rûniştine, ne?

-Erê!- Gişka bi hev ra got.

-Kurapê me mêrekî hêjaye, ne?

-Erê!

-Mala wî timê ber me vekirîye, ne?

-Xwedê sedê ye.- Hazira nizanibû dawîya gotinên wî wê çibe.

-De wekî usan e ka em wî jî bikin şayîr!- Got û mîna mirovekî di pirseke giring da serketî ji jor da hogirên xwe nihêrî.

Demeke kurt gişk bêdeng bûn, paşê Bextewar bêdengî teriband.

-Têymûraz, tu xwendina kurdî zanî?

-Erê, lê çawa, ez gazêta Rîya Teze dixwînim.- Têymûraz qure-qure got.- Qîza Tîko, ca gazêta Rîya Teze bîne ez bixwînim bira kurapê min bibînin.

-Rîya Teze êdî seva çi ye, camêro, çira em ji kurapê xwe bawer nakin.- Bextewar got.

-Ez çi zanim, herke hun dixwazin, ez ê bixwînim.

-Welle, Malava tiştêkî hêja got, Têymûrazê kurap hêja ye bibe şayîr. - Zarîrin got.

-Rastî jî camêrî xweyî hebûn, xweyî qedir û qîmet, kurapê me, em çira gere nekin şayîr. Xwîn nabe av, sibê jî pirseke hebe, wê piştê kurapê xwe bigre.- Bextewar hêdika got, hinekî rawestîya, tê bêji di bira xwe da tişt hesab dikirin, paşê serê xwe bilind kir û got. -Pênc şûra ez didim kurapê xwe.

-Ez deh şûra didim kurapê xwe yî delal.- Malava ji aliyê xwe da got, kasa xwe vexwar û rûnişt.

-Ê, çira kurapê we ye, ne kurapê min e, ez jî deh şûra didim.- Dinêdî ser sîvra kêmbûyî.

Zarîrin serî di ber da ser destmala kaxez dinivîsî. Çavê gişka li wî bû. Wî nivîsara xwe tamam kir.

-A min hema hêja şîrek ji bo Têymûraz nivîsî, ev destpêka wê ye- Zarîrîn rabû şîpiya, destmala kaxeze ber xwe danîyî, ku ser nivîsî bû, hilda û bi dengekî bilind û teqil xwend.

"Sala teze, sala teze,
Ev welata temam rez e,
Çîya û banî tîjî pez e
Nav wî rezî û pezî ra
Çemê Kurêye dibeze..."

Qasekê gişk bêdeng bûn. Malava xwest tişteki bêje, lê xwe girt. Bextewar kurapê wanî mezin bû, divêt berî gişka wî fikra xwe bigota. Lê ew hê bêdeng bû. Wî paryê di devê xwe da hêdi, bi hemdê xwe cût, daqurtand, gulmek ava medenî ser da kir, paşê kasa xwe, ya tîjî şerav bi destê rastê bilind kir û got:

-Navê min Bextewar e, ez rastî jî bextewar im, çimkî şayîrekî mîna Zarîrîn kurapê min e!- Demeke ne dirêj bêdeng ma paşê gotina xwe berdewam kir.- Belê, şayîrê usa tenê eşîra me dikare bide, eşîra şayîra, eşîra aqilbenda, eşîra mêrê baş. Ez di temamiya jiyana xwe da van rêza jî bîra nakim. Ev rêz wê bi tîpê zêrîn diroka edebiyeta kurdî da bêne nivîsarê.

-Edebyeta kurdên sovêtê.- Dinêdi ber xwe da got.

-Ev rêz wê bi tîpên zêrîn di diroka kurdê sovêtê da bêne nivîsar. Û navê xudanê wan, Zarîrîn, wê timê ser zarê zarokên kurda be.

-Xudanê wan êdî Têymûraz e,- Dinêdi dişa got.

-Belê navê Têymûraz wê timê ser zarê me be. Şiir bi ruhê rojê hatiye nivîsarê, bi dema me ra girêdayî ye; îro sala teze ye û şayîr Zarîrîn, bibaxşînin, Têymûraz dinivîse; "sala teze, sala teze, ev welata temam rez e, çîya û banî tîjî pez e". Ev şîir bi réalîzma sosiyalîstyê hatiye nivîsar. "Ev welata temam rez e". Ev ne rezê kapîtalîsta yan kûlakan e, ev rezê Gurcîstana sovêtê ye. "Çîya û banî tîjî pez e", ev ne pezê axa û bega ye, ev pezê gundî û rênçberan e. Û nav wî rezî, wî pezî ra, yan nav vî welatê tîr û tîjî ra, çemê Kurê dibeze. Belê ne çemekî dinê, lê çemê Kurê, ku simbola Gurcîstana Sovêtîyê ye! Ev e poêzîya, gelî birano! Poêzîya gerek wa be, gelî hevalno!- Wî got, kasa xwe heta dawîyê vala kir û bi girmîn danî cîyê wê. Gişk bêdeng bûn, wê demê mêş bifirîya vizîniya wê wê bihata bihîstin. Çavên gişka li Bextewar bû, ka wê paşê çi bêje, çi bike.

-Hela çika tîlêfonê ji apê xwe ra bine,-piştî demeke ne dirêj Bextewar jî keça Têymûraz ra got. Keçikê tîlêfon jî sivderê anî û destikê wê dirêjî wî kir. Bextewar jî beriya xwe devtereke biçûk û berçavkên xwe derxistin,

berçevk dane ber çavên xwe, li rûpelê devterê tişteki digeriya. Gişk bendê bûn, ka wê ji kê ra têlêfon bike. Wî jimarek berev kir û gava wî serî destkê têlêfonê hildan bi dengê bilind got:

-Êvar baş, Nodar, çawanî, birayê min, sersala te pîroz be! Ez im, Bextewar!

-Ê, çira ne bextewar bim, dostekî min î mîna te heye.

-Welle Xwedê vî welatî şên bike. Li rûbarê dinê tu cîya ewqas seva me kurda nehatîye kirinê, çiqas li Gurcistana sovêtîyê. Temamiya milletê kurd minetdarê we ye.

-Erê, hê ji bîra min neçûye, şayîrekî meyî baş heye, xortekî bijare ye. Kurapê me ye, lê min heta niha nizanibû şîra dinvîse. Merivekî rûnêrm î, şermoke ye, lê çawa şayîr, şayîrekî bi gotina te ye. Bawer bikî ji lawkê me gişka baştir dinvîse. Hêja çend rêz ji şêreke xwe xwendin, tişteki ecêv bû.

-Ê, em çawa bikin, kesî mayîn nanvîse, xwe em zorê xelkê naynin nakine şayîr. Kurapê me dinvîsin, çawa tê xuyayê şayîrtî di xwîna me da heye. Bi gilîkî niha em li mala wî ne, dixwezî ez bişînim pey te, tu jî were, "Volga-24"-a wî heye.

-De tu zanî.

-Îcar em çawa bikin, wekî çend şîrê wîye bijare di rojnama te da çap bibin. Bira xelk ji bizanibe kurd li Gurcistana sovêtîyê ghiştine çi derecê, çiqas şayîr û nivîskarên me hene!

-Ez û tu, em ê bi hev ra rûnên û çendeka wergerînine zimanê gurekî.

-Îcar hingê em ê carekê mala wî da rûnên û şeravê vexun, şeraveke wî ya gelekî xweş heye. Nabêje ji ku anîye, dibê timê werin mala min vexun. Bi rastî mêrekî merd î destvekirî ye.

-Bira gotina te be, hingê em ê herin rêstoranê. Ez zanim tu kîjan rêstoranê hiz dikî. Îcar kingê şîrê wî bînim?

-Ê, baş, bira sala teze derbas be, paşê.

-Lê çawa, ezê şiklê wî, serhatîya wî jî bînim.

-Usa, kurap. Pêşîyê me gotîye: "Derba hêvişandî ne ya xweyî ye." Piştî hevtêkê şîrê kurapê min bi şiklê wî, bi serhatîya wî wê di rojnamê da çap bibin. Ez ê îro êvarê jî ji Çevoyê pismam ra têlêfûn bikim bira şîrek, dudên min, ku bal wî hene, bi navê Têymûraz di Riya Teze da, bi serhatî û şiklê wî çap bike. De îcar bira xêrnexwaz biteqîn. Kurapekî me jî bû şayîr. Çira em ê bihêlin hineke mayîn bîn, bibine bela serê me. Em in, xwexwetîya me ye, kêmasîke me jî hebe, wê nav me da bimîne. Niha ez im serokê para nivîskarên kurd, piştî mirina min Malava wê bibe, paşê

Zarîrin, paşê Dinêdî, paşê jî şayîrê meyî delal, Têymûraz. – Dû ra hûrdemekê hizirî û vegeŕiya ser Têymûraz,-Lê navê te ne navê şayîrtîyê ye kurap, divê tu navê xwe biguhêzî.

-Navî wî em ê bikin Têrmîraz, yan serî dewleta sovêtê, li Gurcistana welatê me, mirazê wî têr e.- Dinêdî got.

-Na, 'têr" ne gotineke şayîrtîyê ye,- gotina Dinêdî ne bi dilê Bextewar bû,- hê baş e em bêjin Şamîraz.

-Şayîr Şamîraz şîra dixûne!- Zarîrin bi teql got.- Navekî xweş e, bira navê te pîroz be.- Wî zanibû gotina bextewar kêrta kêvir e.

-Mam, papa bû şayîr,- keça Têymûraz jî diya xwe ra mizgînî bir.

-Şayîrê çî, keçê?- Gûliko metel ma.

-Canê papa, hêja papa kirine şayîr. Apê Ezo hêja yekî gurc ra xeber da, wê şîrê papa, şiklê wî û serhatîya wî di rojnamê da çap bikin.

Rast e Gûliko usan jî tê negihîşt mêrê wê yî şofêrê taksîyê çawa bi carekê ra bû şayîr, lê yeke şabûn kete dilê wê.

-De îcar bira biteqîn, him hebûna me heye, him jî mêrê min şayîr e.- Wê di dilê xwe da got.

Piştî demeke kurt Gûliko sinîk ser desta kete oda mêvana. Ser sinîyê konyakeke Napalyon bû, dora şûşê konyakê şokoladên biha.

-Ev jî jî bo çevronayê, wekî kurapê we bû şayîr.- Wê got û sinî danî ser sivrê.

Rojek ji rojên Girtîgeha Diyarbekirê

Laleş Qaso

Ji sala 1981ê û heta liberxwedana îlona sala 1983an, li Girtîgeha Diyarbekirê mehmetchîkan bêwestan agir li ser serê kurdên ku Xwedê ji hêsîrî pişka ezel dabû wan, barandin! Di hikmê wan sê salan de ji aliyê wehşetê ve tiştêkî ku dewleta tirkên misilman di serê me de ne kiribû, ne mabû! Ji destavêtinê û heta ku digiha jopradana destavê, hertişt erê hertişt di serê me kurdan de kirin! Her rojeke wê êşkencê bi qasî qonaxa sed salî dirêj dihat! Ey hewar ew çi roj bûn! Mîna ku zeman sekinibû, ne seet digeriya û ne ji roj diçû ava. Û gava diçû ava jî, her der di nava reşayê de xerq dibû û wilo diçû û diçû û diçû! Canên nermijî, parsuyên şikestî û kezebên ku mîna hêtûnê rivîn didan, di nava zilma tîrko de ha ha kêferat dikirin.

Xwîn bixwînê!

Li Girtîgeha Diyarbekirê hertişt êşkence bû. Di vir de ez ê li ser êşkenca himamê rawestim:

Li vê girtîgehê du himamên mezin hebûn û herdu jî mîna sînema wan bi mîmariyeke delal hatibûn avakirin. Girtîyan bêyî ku lêdan bixwarana, di van himaman de heta gulana sala 1982an carina xwe şuştine. Lê piştî ku dîsa di gulana vê salê de liberxwedan têk diçe, birêvebiriya girtîgehê himaman digire. Himaman piştî ku sê-çar mehan girtî dihêlin, dîsa vedikin.

Mehmetan mîna mişkên malê, çi xerabiya ku ji dest wan dihat, dikirin. Ev mişkên duling, ji xerabiyê pê ve li tiştêkî din ne difikirîn. Di rojên ku

em dibirin himamê, me tê derdixist ku ji pêşî de hertişt hesap kirine û li gora wî hesabî bi me re dikin. Çawa dikirin?

«Zaroyên teresan xwe ji şûştinê re zû hazir bikin!..»

Di hikmê deqîqeyekê an du deqîqan de çil-pêncî mirovî xwe tena derpî tazî dikir; çar çar yek diçû pişt yekî, ên pêşî diketin temenê, ên bi dû wan de dest dirêjî ser milên hev dikirin; serrep, ziq li zeraqa devê derî dinerîn û bi wî hawayî pazdeh-bîst deqîqan li bendî emrê mehmet disekinîn. Mehmet jî bi hinc pehînek dadiwişand deriyê hesinî, çerqîn bi zeraqa derî diket. Pêşî li pêpîkê dixist û dû re jî bi qahr digot:

«Qahpino derkevin!..»

Piştî ku girtiyar bi yek devî û bi dengê herî bilind digot "Em ji şûştinê re amade ne komutanê min", mehmet jî deriyê qawîşê vedikir û vê carê jî digot :

"Dest bi merşa, Tarihi çevir nal sesi kısarak sesi, bikin qûndenol!"

Girtiyar dest bi vê merşa ku hemû li ser nîjatperestiya tirkan hatibû nivîsandin, dikir û berê xwe didan korîdorê. Merş pir dirêj bû. Li dor nîv seetê digirt. Di hindurê korîdorê de mîna hespê tengîjî, herwiha me lingên xwe heta bi sêngê bilind dikir, bi şid li erdê dixist û me şerefa tarîxa tirkan dipêja. Piştî ku merş diqediya, îcar mehmet dîsa li pêpîkê dixist û digot:

«Kûçikino, xwe biavêjin erdê û xwe bi erdê ve bixijiqînin!..»

Me xwe diavêt erdê. Mîna gumgumoka avis çewtoxwarî me xwe bi erdê ve dixijiqand û dixijiqand û dixijiqand heta ku zikê me bê hemdî xwe ji erdê bilind dibû û em li ser anîşkan digîndirîn. Dîsa wê li pêpîkê bixista û em ê jî di cihê xwe de dîsa bûbana sing!

«Bênamusino, xwe li ser piştê bixijiqînin!..»

Vê carê jî me ê li ser piştê şeqlovîskî bida xwe.

«Rabe! Xwe biavêje! Rabe! Xwe biavêje!..»

Ji hindam de me xwe diavêt erdê û em radibûn. Piştî ku bi vî hawayî çar-pênc deqîqe derbas dibûn, dîsa li pêpîkê dixist:

«Tirino, li hev bicivin!..»

Di hikmê pazdeh-bîst saniyan de yek ji me diket pişt yekî û me sef digirt. Mehmet her tim pêşî li pêpîkê dixist û dû re bi girtî re dipeyivî.

«Bi-ki-ü banyoya ya..ak!..»

Ev îşareta ku em ê bi bazdanê biçûna himamê, bû. Ji deriyê korîdorê heta hindurê himamê, mirov di çar deriyên teng re derbas dibû. Çil-pêncî mirovî çar çar sef digirtin û bi telebê heta bi hindurê himamê bazdidan. ?elûpelek diket nav me, bê bêlome be! Hin ji me girs û dirêj, hin kin û

çiçelaskî, hin nexweş û hin bi birîn bûn û me hemiyan bi hev re bazdida. Hin diketin erdê, hinan pê li van dikir û diçûn; hin di navbera deriyan de asê diman, hinan poş li van dixist û wek gule diçûn; hin dipengizîn ber diwêr nîkarîbûn bazdana, hinan jî bi şegan ev bi xwe re radikirin himamê. Di vê kêlikê de dest û lingên hinekan difikiyan, diranên hinan dişikestî, dev û bêvila hinan bi xwîn dibûn û hwd.

Li himamê xortûm di mislixan de ye û serikê xortûmê jî di destê mehmet de ye. Hewd tije av e, ser mermeran hemû jî sabûna bêkef sabûnkirî ye û girtî dudu dudu, sisê sisê li ber mehmet ketine temenê. Mehmetek li pêpîkê dixê û pazdeh-bîst mehmet jî avê dipijiqînî ser girtîyan. Av her tim ya pir cemidî û ya jî pir germ e. Ji bilî vê, tim û dayim ava zivistanî sar û a havînî jî germ bû. Mîna ku di zarokiya xwe de, me serê mirîşkê dixist bin baskê wê û me jî mirîşkê re digot "Ev aliyê te behr, ev aliyê te ê din agir e û pêşiya te jî hemû şûr in", wilo li me dikirin. Gava ku xortûm di destê mehmet de bû û ew ava germ dipijiqand ser me, bêkeys em çeng dibûn wê navê; li sabûnê dixijiqîn û bertelaşkî em li ser mermerê vediziliyan. Ketin mekrûh bû, yanî niv sûcek bû. Îcar gava ku ev ê ketî hema wilo teqeze raneba ser xwe, mekrûhî dibû gunehkarî. Bi rabûna ku em radibûn û me dîsa berê xwe dida mehmetê bi xortûm û mehmet dîsa av dipijiqand ser me, em jî ber qûnaqûna dibûn û li mehmetên bi jop û zincîr diqelibîn. Mehmetan di vê dojhê de em jî hawhaw de dixistin! Himam beşekî dojhê bû û mehmetên tirkên misilman jî di vê dojhê de zebanî bûn.

Insan ya jî tirk mexlûqekî ecêb e! Di hindurê himamê de insanek bi ser şewt û êşa nava xwe de çirîsî ye, digirî û insanek jî jî zewqê li erdê veziliya ye û tîqtîqa kenê wî ye. Ev e tirk.

„Ê ne hakimo tu ê jî wek min bimirî. Te tenûreke nan zêdeyî min xwaribe, tu çûbe Elemanyayê, Îtaliyayê, Urûs û ez jî li ser serê çiyayên xopana Dêrikê geriyabim; tu li teyarê û ez jî li kerê siwar bûbim, mane hey tu ê jî wek min bimirî ehmeq. Tu deh salekî ji min bêtir jiya be çî ye yanî? Mîn digot qey ê bêaqil ez im. Lê min îro fêhm kir ku ez jî hakimî û temamê mezinên dewletan bi aqiltir im...“

Memo Ayhanê şivan wilo digot û hakimên tirkên „medenî“ jî wilo digotin:

„Lawê min esker, vî mîqrobî biavêje der! Li wan bidin! Kûçikino! Eşqiyano! Bêtoreno! Ne insan! Qeşmer!“ û hwd.

Mehmet di hindurê himamê de bi êşkenceyê em şerpeze dikirin. Bi vî hawayê ku me got, ev êşkence carina bîst-sih deqîqî diajot û carina jî hema wilo di hikmê deqîqeyekê de digotin, “Zû avê bi ser xwe dakin,

bavkûçikino!..” û em derdixistin. Av ji kelandîbû. Û de were bi ser xwe dake! Mehmet bi haweyê ku girtî ji qawîşê dianîn û bi rê de çawa asaç di wan de dikirin, wilo ji ew dibirin qawîşê.

Çûna himamê bi giştî her ji pazdeh rojan bû. Carina ji çar-pênc rojan û carina jî ji mehê carekê bû. Çima wilo dikirin? Ew ji hesabekî êşkenceyê bû. Carina bi sebaba eskerên ku nuh dihatin girtêgehê em dibirin himamê û bi van eskeran êşkence li me dikirin. Eskerên «nuh geldi» ji hewşa qawîşê bêtir li himamê hînî êşkenceyê dikirin. Carina jî bi sebaba ku hin karbidestên dewletê dihatin kuştin em dibirin himamê û li me êşkence dikirin. Di rojên ku Asala hin birêvebirên tirkan dikuştin, mehmetan bi lêdanê tam qeşema ser dilê xwe dihilandin.

Li himamê zewqêke mezin ji êşkenca ku li me dikirin distendin.

Carina, piştî ku me serî û laşê xwe hemû di nav kefê de dihişt, li pêpîkê dixistin û digotin:

«Bir-iki-üç istikamet koğuş orospular!..»

Îcar hejmara wan a yek û dudu û sisê hemû jî bi qasî hejmareke bi tertîp ne dihat. Bi-ki-ü digot û bi xezeb wilo tev li wê kefê me berê xwe dida qawîşê. Carina digotin:

«Xwe şilfitazî bikin!..»

Ku me derpî dadixist hindama gwîzekê, îcar wê bigotana:

«Bênamûsino ma hûn ji xwe fedî nakin ku hûn qûna xwe wilo berdidin çolê? Zû cilên xwe li xwe bikin!..»

Li vê himamê carina me ê him xwe bida ber xortûma mehmet û him jî me ê merş bigotana. Me digot, lê pir bi haweyekî ne xweş me digot. Meqamê merşê û şûştinê tu carî li hev ne dikir. Îcar ji herkesî bêtir? êxo Ayata ê sêwregî pir dida nav. Merş pir ji çap de dixist, niv-kurmanckî dikir û digot. Gava mehmet jê re digot:

«Topyekun marşına başla, bok!» Yanî dest bi merşa herî qerese bike!

Ji dêvla ku wê bigota tanklariyla, toplariyla gelseler dahi... îcar digot:

Tanklarî, toplarî, cemselerî, cîp û pîqaplerî û teyarelerî û qarîyerî û eskerî gelsin bakalim û disekinî. Mehmet jî wê bigota:

Hadi lan, hadi moruk nediye duruyorsun? Yalnız onlar mıdır? Taksi, otobus, kamyon, kamyonet, motosiklet oho daha neler neler, söyledin mi bunları?..»

Tirkan av di hestiyê me kurdan de vexwarine! Li gora terbiya têgihiştina min, tiştêkî pir şerm e ku kurd behsa biratiya bi tirkan re dikin!..

Di derheqa pirtûka Dîroka Kurdistanê da

Di derheqa dîroka Kurdistanê da çap bû. Taybetmendîya wê berhema zanyarî ew e, ku çend ulmdar-kurdzanên Rûsiyayê yên bi nav û deng cara pêşin dîroka gelê me ya ji demên Van dawîya ji aliyê Navenda Lêkolînên Kurdî li Moskow bi zimanê rûsî pirtûkeke here kevnare - ji sedsalâ 7a destpêkirî hetanî rojên me - hetanî rojên me radixine ber xwendevana. Vê carê wana gelek nivîsên arşîva yên usa bi kar anîne, ku berê ji bo xebitandinê girtî bûn.

Ji bo ku xwendevanên kovara me bi wê berhema zanyarî ra hinekî bibine nas, em li jêr wergera pêşgotina wê ya bi zimanê kurdî raberî we dikin.

Wergera ji rûsî: Têmûrê Xelil

Ne tenê li Asîya Roava, lê herweha li ser temamiya topa cihanê, kêm millet hene, ku bi tevayî reng û rûyê xwe yê miletiyê ji demên buhurî heta roja îro xwey kirine. Yek ji wan mileta kurd in. Eger em nivîsên pêşin yên derheqa kurda û pêşiyên wan da bidne ber çava, yên ku bi ulmî hatine lêkolanê û îzbatkirinê, em dibînin ku dîroka gelê kurd ji du hezar pêncsed sala derbaptir dibe. Weke hezar pêncsed sal berê gelê kurd wek ênos hate naskirinê. Em evê yekê nikarin derheqa tu miletekî Awropa îroyîn, lo hela derheqa gelek gelên Asiyayê û Afrîkayê da ji bêjin. Hela di ser da jî, sazûna kurda wek gel û pişt ra, ku bûye millet, her li ser axekê bûye - li ser axa Kurdistanî îroyîn. Bi vî awayî, em bi heqî kurdan dikarin bihesibînin wek miletekî herî kevnare li herêma Rohilata Nêzik. A ev e taybetmendîya sereke ya dîroka kurda.

Taybetmendîyeke mayîn ya giring jî ew pêvajoya êno-miletiyê ye bal kurda, ku pir dirêj kişand û hetanî niha jî berdewam e, ji ber ku gelê kurd hetanî niha jî yekgirtî nîne. Delîla civakî-aborî ya ewê pêvajoyê li bal kurda pir dereng pêşda diçe, ji ber wê jî ew heta roja îro ser dereca berê maye.

Eger em bêne ser aspêkta siyasî ya pêvajoya êno-miletiyê, li bal kurda ew herdem di şertên dirokî yên gelekî xirab da derbaz bûye. Û ew gotinên

zimanzanê Rûsîyayê, Kavkazzan û kurdzan akadêmîk N.Y.Marr, ku kurd "sêwîyên dîrokê" ne, di cî da nin. ?erên herdemî, êrişkarîyên ku her tişt ber xwe dibirin, wêran û kavil dikirin, serhildanên kurda yên bi xwîn, ku pişt ra millet dikete ber derba xezebê û gelkujiyê, rakirina bineciyan ji cî û warên wan, ku bûn sebebê perianiyê, reberiyê, tengezarîyê û rûyê van yekan da axa Kurdistanê gelek cara dihate perçekirin, dibûne astengên mezin li ser rîya bi sîyasî hevgerîna kurda, damezirandina dewleta kurda, li ser rîya Kurdistaneke serbixwe û yekgirtî. Û ev hemû tesîreke demdirêj û xirab li ser darinda civakî-aborî û dereca êtno-kûltûriyê ya gelê kurd dikir. A hema ev bûn sebeb, ku pêvajoya êtno-miletîyê li bal kurda dereng pêşda diçû û kurd ji gelên mayîn yên Asîya Roavayê, ku xwedî dewlet bûn, paşda man, îdî em derheqa gelên herêmên mayîn yên topa dinyayê da nabêjin. Ji ber wê jî kurd, ku xwedî xûsûsiyetên milletîyê yên usa ne, ku tenê hinkûfî wan in, û xwedî çandeyeke dewlemend in, hetanî niha jî mane wek êtnosa here pirjimar li ser topa dinyayê (weke 30 milyon), ku jî mafên xwe yên sereke - bi xwe biryarkirina qedera xwe - hatine mehrûmkirinê û bê dewlet in. Û ev yek di hindava xweda pêşketina wan ya milletîyê dide berberkirinê û şerpezekirinê.

Ji van xisûsiyetên dîroka kurda, ku me li jor destnîşan kirin, kemala wê ya balkêş tê ber çava bona lênihêdandina temamiya pêvajoya dîroka hemcihanê. Taybetmendîya dîroka kurda jî bona gelek gelên mayîn jî kêrhatî û kardar e, ew alî wê yekê dike, ku li ser demên buhurî bisekinin û ji wan dersan bigrin bona pêşerojê.

Dîroka gelê kurd ew herweha dîroka pîrsa kurda ye jî. Usa hatîye qebûlkirinê, ku gotina "pîrsa kurda" van axirîya, di dema ne gelekî dûr da xuliqîye, diha rast di dema perçekirina Împêratoriya Osmanîyê da, ku di şerê hemcihanê yê duda da jî aliyê dewletên Antantayê da têk da (di dema amadekirina peymanê Sêvrê ya aşîtiyê di sala 1920î da, ku bi ser ne ket). Piştî wê di dema her çirûskeke (pîrîsk) tevrabûn an jî tevgereke kurda ya milletîyê-azadîyê da li ser pîrsa kurda disekinîn. Bi vî awayî, ji bo pîraniya dema sedsala 20î gotinên "dîroka kurda" û "pîrsa kurda" bi fikra xwe va hema bêje weke hev in û dikarin dewsa hev bigrin, ji ber ku ew tevger naveroka pêvajoya dîroka kurda bû û ji bo gelê kurd pîrsa sereke bû.

Lê bi rastîyê pîrsa kurda gelek kevintir e. Ew pîrs wek katêgorîyake dîrokî, ku hewcê bersîveke anegor e, ango, hewcê safîkirinê ye, hela di dewrana sedsalên navîn da xuliqî, dema li meydana Rohilata Nêzik da mîrîtiyên kurda xuliqîn û dewa mafê xwe yên jî bo serxwebûnê kirin. Ji

wan dema pirs a kurda bû faktoreke sereke di nav jîyana sîyasî ya wan dewletên Asîya Roavayê da, ku kurd lê diman. Bi demê ra, bin hukumê bûyerên mezin, ku li herêmê dibûn, pirs a kurda roleke cuda-cuda dilist, fikir û naveroka wê hey dihate guhartinê. Lê her dema kakilê wê - ew şerkariya gelê kurd bû ji bo azadîyê û serxwebûnê.

Bi vî awayî, lêgerîna diroka kurda berî her tiştî ji bo gelê kurd bi xwe kemaleke sîyasî ya aktûal dest tîne, ku niha li ber pêwîstîya çareserkirina pirs a xwe ya miletîyê ya sereke sekîyê - pirs a damezirandina Kurdistanê serbixwe û dêmokratîyê - û ji bo ew armanca wê ya ziyaretî bi ser keve, ji diroka xwe ya derbazbûyî dersên hêla hildane. Lê ew yek ne tenê ji bo kurda pêwîst e.

Jiyana sîyasî ya kurda bi gelên mayîn yên Asîya Roavayê, bi cînartîya bi wan ra derbaz bûye. Gelek ji wana zû da ji dest şer û êrîşkarîyên kafkûnkirinê, kavi-l-wêrankirinê ji meydana Rohilata Nêzik betavebûne, tunene, an jî bi destî miletên ku piştî wan li wê herêmê diyar bûne, hatine helandin-asîmîlekirinê. Yên mayîn jî, wek kurda, di pêvajoyên pêşketina dirokî da bûne miletên pêşketî: piraniya wan piştî ku dagîrkariya li ser wan hate hilanînê, bûne xwedî dewlet. Kurdistan li ser axa Tirkîya, Îran, Îraq, Sûriya îroyîn e, û di hin perçên wan da kurd an piranî ne, an jî bi wan ra hinek miletên mayîn jî dijîn, ku hindikayî ne. Diroka Kurdistanê bi diroka van dewletên destnîşankirî va bi six girêdayîye. Bilî wê, gelek kurd jî dervayî axa Kurdistanê êtnîkîyê dijîn (li bakûr-rohilata Îranê, li Pişkavkazê, Asîya Navîn, çend welatên ereba da û li diasporê-li welatên Roavayê). Bi kurtî, diroka kurda perçekî diroka Asîya Roavayê (Rohilata Nêzik û Navîn) û Pişkavkazê ye û bi wê ra tevayî jî diroka welat û gelên wan herêma kîp bi diroka kurd û Kurdistanê va girêdayî ye. Ji ber wê jî lêniherandin-hînbûna wê dirokê pêwîst e ji bo bikaribîn temamiya pêvajoya dirokî ya li ser wî perçê mezin yê topa dinyayê derc bikin û têbigihîjin. Hilbet, hinek taybetmendiyên usa hene, ku tenê hinkûfî diroka gelê kurd in, û qîmetê wan di hêla dirokî-kulturî da pir giranbuha ye.

Bi vî awayî, lêniherandina diroka kurda û Kurdistanê him di hêla praktik da (piranî di aliyê sîyasî da), him jî di hêla hajpêhebûnê da pir hewaskar û balkêş e. Derheqa eva axirîyê da hêja ye bi hûrgilî bê gotinê.

Diroka kurda himberî diroka gelên mayîn yên Asîya Roavayê kêma hatiye lêniherandinê, di nav wê da gelek xalên (deqên) sipî hene, ku di gelek alîyan da hewcê lêkolînên zanyarî yên bi her alî û dûr û dirêj in, ji dewrana here kevin ya êtnogênêza kurda destpêkirî hetanî rojên me. Sebebê derengmayîna wê ber çava ye. Di şertên tunebûna dewleta kurda

da qewlên baş tunebûn bona bi kardarî û aza pêşdabirina çanda xwe, herweha lêkolînên ulmî û di nav wê da - dîroka xwe. Di wan welata da, ku Kurdistan di nav xwe da parvekirine, komên serkarîkir, ku ji bo kara (menfaet) miletê serdest kar dikin, an bi femdarî pêşdabirina dîroknivîsa kurda herbend kirine, an jî feşkirina dîroka kurda pesinandine, hetanî înkarkirina wê jî, û jî wê jî înkarkirina kurda wek milet hatiye holê. Tiştekî pir sêr e, lê tê femkirinê jî, ku ji bo çi usan e, ku piraniya xebatên giranbuha yên derheqa dîroka kurd û Kurdistanê da, jî sînorên welatê kurda derhatine çapkirinê, berê bi piranî li Rûsîyayê û Yekîtîya Sovyet, niha jî li Roavayê (piraniya xudanên wan xebata jî bi eslê xwe va kurd in).

Dem a bi sistematîkî lêkolîna dîroka kurda û Kurdistanê, sazkirina lêkolînên fûndamêntal jî bo wê problêma Rohilatzaniyê ya paşmayî, hatiye. Ew yek him jî bo tevgera miletîyê-azadîyê ya hemkurdîyê lazim e, ku hewcê wê yekê ye, ku gerekê heqê kurda - wî miletê kevnare, ku li ser axa kal û bavê xwe dijî û kulturake dewlemend û taybetî saz kirîye - jî bo bi xwe biryarkirina qedera xwe bê naskirinê, him jî jî bo ulmê Rohilatzaniyê lazim e, jî ber ku Kurdzanî çîçleki (perçeki) wê yê sereke ye. Ew armanc tenê wî çaxî dikare biserkeve, gava hereketê miletên cihê-cihê û welatên cuda-cuda yên di wê derecê da bighînine hev.

Hilbet, xebateke usa wext dixwe, lê destpêkirina wê hema îro hewce ye. Gerekê konsêpsyona dîroka kurda ya 2500 salî bê amadekirinê, dem û dewranên sereke bêne destnîşankirinê, qîmetê rasteqîn bidne bûyerên girîng, ku jî bo qedera kurda gelek muhîm in, merivên di dîroka kurda da xwedî roleke mezin derxine pêş. Femdarî ye, ku bona serketina vî karî gerekê nivîsên derheqa dîroka kurda yên heta niha nexebitandî, ku dikarin di serkanîyên neeyan (ne bêlî) û di nivîsên usa da hebin, ku bi sebebên cuda-cuda hetanî niha nehatine lêkolînê.

...

Ev berhema hanê gava pêşin e li ser rîya sazkirina xebateke bingehîn derheqa dîroka kurda û Kurdistanê da jî demên sazûna kurda wek gel (nîveka hezarsaliya pêşin ya dewrana me da) heta rojên îroyîn. Lêkolînên bi vî awayî ne di kurdzaniya me da hene, ne jî ya welatên mayîn da, ne bi kurdî, ne jî bi zimanekî din. Tenê çend aliyên dîroka mîrîtiyên kurda an jî dîroka şervanî-sîyasî ya Kurdistanê, ku bi serhildanên kurda yên jî bo azadîyê û serxwebûnê va girêdayîne, çap bûne. Xudanên vê pirtûkê pirsdanînen diha mezin û giranbuha datînine pêşîya xwe. Wana hewl daye

îzbatîyên sereke, ku derheqa dîroka gelê kurd ya pirsedsala da ne, ber xwendevanan raxin. Ji bo pêkanîna wê armancê wana piranî xwe li serketinên di kurdzaniya Rûsîyayê û Yekîtiya Sovyet da heyî girtîye, yên ku hetanî van demên axirîyê jî di kurdzaniya cinahê da pêşengî dikirin. Bêguman, ew berhem jî hatine xebitandinê, ku ulmdarên welatên dereke derheqa kurda da nivîsîne.

Xudanên nivîsa yên vê pirtûkê, li xwe mukur tên, ku zehmet e ewî karî tam û bi temamî pêk binin. Astenga sereke jî, wek me got, têrênekirina nivîsên derheqa dîroknivîsiya kurd û Kurdistanê da nin, tunebûna tradîsyona ronikirina hemû derecên dîroka kurda ne, kêmbûn û zeyifîya baza serkanîya û edebîyata anegor e. Ji ber wê jî di vê xebatê da xudanên nivîsa ne her cara û ne li her cîya li ser bîr û rayekê ne di raberkirina dewr û demên dîroka kurda yên cuda-cuda da. Gelek cara em mecbûr bûne nivîsên heyî yên usa bi kar binin, ku me têr nekirine.

Dijwariya here mezin, ku derketîye pêş me, ew ronikirina demên here kevin yên dîroka kurda bûne, ku ji aliyê rohilatzana da jî hemûyan kêmtir hatine lênihêrandinê û lêkolanê. Gotina me berî her tiştî derheqa dewrana êtnogênêza kurda da ne, ku weke hezar salan e (sedsalên VI-V yên berî dewrana me - sedsala VI ya dewrana me), gava pêvajoya sazûna gelê kurd di meydanê da bû li ser wê axê, ku kurd niha li ser in. Di wê pêvajoyê da, di gelek pirsên sereke da, ulm da yekşîvêtî (hemfikirî) tune. Sebebê sereke - lap kêmbûna serkanîyên bi îzbat, xwesma yên bi nivîskî ne. Serkanîyên ku derheqa kultura gela da ne, ku erdvekolana (arkêolog) diyar kirine, him hindik in, him jî di nav wan da yekfikirî tune û carna jî şirovekirinên wan lap dijî hev in. Serkanîyên mayîn jî (yên êtnografîyê, lîngwîstîyê û yên mayîn) jî pirvariyant in û, carna li ser îzbatî û rastiya wan şik heye.

Li ser van sebebên obyektîv, ku nahêlin em reng-rûyê êtnogênêz û dîroka kurda ya kevnare bi awakî îzbatkirî û bêy şikberî binine ber çava, sebebên sûbyektîv jî - diha rast yên sîyasî - zêde dibin. Ew yek bi awakî geş di xebatên wan lêkolîneran da tên ber çava, ku li wan welata da ewledên mîletê hukumdar in, ku Kurdistan di nav xwe da parvekirine. Herweha di nav xebatên çend dîrokzanên kurd da jî hene. Ewên pêşin, zordariya şovînîstîyê li ser wan heye, ku dixwezîn bi her awahî dîroka kurda feş bikin, nehêlin ku kurd wek mîletekî cihê bê xuyakirin. Lê hinek dîrokzanên kurd, ku me li jor qala wan kir, bi her awayî dixwezîn welatparêziya xwe bidne kîvşê û rehên (koka) "kurdîzmê" bi demên usa kevnare va didine girêdanê, ku derheqa wê yekê da tu malûmatîyên bi

îzbat tunene. Di herdu alîyan da jî dêmê eslî dixeyîre û, ya sereke jî, îzbatîyên bi logîkî û ulmî têne feşkirinê.

Bi vî awayî, di vî halê kurdzanîyê da hewce nake ku pirsên raberkirina dîroka kurda û Kurdistanê jî "demên here buhurî" da destpê bikin, dema êtnogênêza gelê kurd destpê bûye. Baştir e, ku ew kesên bi van pirsê da mijûl dibin, an jî hewaskariya wan berbi dîroka gelê kurd heye, berê xwe bidne lêkolînên pêşekzanên naskirî, ku heta niha derheqa van pirsê da gelek berhemên giranbuha dane çapkirinê û di nivîsên wan da hemû problêmên diskûsyon hatine lênihêrandinê. Di nav wan da jî yên jî alîyê hemûyan da qebûlkirî û bi ulmî îzbatkirî hene.

Êtnogênêza kurda di navbendeke kultura di cihanê da yeke here kevnare - di rex çemên Asîya Pêş (Roavayê)-Dicle û Feratê - destpê bûye. Sînorê bakûr yê herêma ku kurd lê bûne wek milet, ew deryayên wê herêmê yên here mezin - Wan û Ûrmiya ne. Gêografiya fizîkîyê, faktora erdnîgariyê tesîreke mezin li ser pêvajoyên êtnogênêza kurda kirine, xwesma di destpêka êtnogênêzê da. Perçê welêt yê çiyayî di alîkî da li ser rîya pêwendîyên di navbera komên kurda yên cuda-cuda da dibû asteng, di alîkî mayîn da jî ji bo wan dibû hêwirgeh û kela di dema şer û êrişkirinên bêhesab pir da. Bi piranî bi saya serê wê yekê bû, ku kurd gelek cara xwe jî qirê û asîmilyasyonê parastin. Xisûsiyetên axa Kurdistanê bûne sebebê wê, ku kurd xwe li malhebûna gundîtiyê û heywanxwedîkirinê girtin. Di navbera taybetîyên tebîyeta Kurdistanê û wê yekê da, ku di nav kurda da civaka malbetî-êşîrtîyê çê bûye, pevgirêdanek heye, û paşmayînen wê jî wan dema gihîştine heta rojên me jî (îzolebûna hinek kurda jî hev, şertên ne baş bona xwe li xwelîbêcerkirinê bigrin, dijwariyên bona çêkirina rîya û yên mayîn). Di van şerta da malbat-êşîr dikaribû xwe demeke dûr û dirêj biparasta wek katêgoriyake civakî.

Îzbatîyên xulîqandina gelê kurd bi ulmî hatîye makkirinê. Wargê êtnogênêza kurda yê pêşin li Mêsopotamiya Bakûr, di navbenda Kurdistana niha da bûye. Çi jî hebe, tiştê jî şikberîyê der e, ku mafê kurda heye li ser axa kal û bava, welatê xwe yê eynî da bi aza û serbest bijîn.

Ev tiştên me li jor gotin, nayê wê manê, ku axa Kurdistanê ya êtnîkîyê pêş da hatibû kivşkirinê, an jî gorî koordinatên erdnîgariyê yên îroyîn bûn. Gotina me tenê derheqa ocaxa (wargê) yekemîn ya pêvajoya êtnîkîyê da bû. Kurdistan, ku di orta Asîya Roavayê da bû, wek ax, ku li ser wê piranî kurd bûne, bin hukumê bûyerên dîrokî yên gumreh, ku leqandinên êtno-dêmgrafîyê pêşda anîne, timê sînorên xwe yên êtnîkîyê guhêrandine (sînorên bi qewlî). Ji ber wê jî gelekî dijwar e sînorên Kurdistana kevnare

û heta ya sedsalên navîn jî, binine ber çava.

Herweha ne hêsa ye wê demê jî binine ber çava, ka kengê destbi sazûna êtnosa kurda bûye. Pêwîst e ewê pêvajoyê pareveyî li ser du êtapa (dewr) bikin. Ya yekemîn - ew dema peydabûna eşîretan e li ser meydana dîrokê, ku meriv dikare wana bihesibîne wek pêşiyên kurdên niha (îroyîn). Bi hinek sebebên ew dewran (derheqa wê da tenê çend malûmatîyên arkêologî mane) ji bo lêkolîna problêma êtnogênêzê ya here dijwar e, zanyar li ser wan izbatîyên, ku di nav ulm da hene, ne hemfikir in û hetanî niha jî ne hatine ser biryarekê. Tiştê tek-tenê, ku zanyar li hev kirine û şika wan di wê yekê da tune, ew e, ku destpêka wê diçe dighîje demên here kevin. Destpêka wê ji hezarsaliya IV ya dewrana berî me ye, gava di herêma Mêsopotamiyayê da, herweha perça wê ya çiyayî da (li bakûrê wê) ocaxên medeniyetê yên pêşin xuliqîn, jiyana gel ji cûrê kevnare yê paşketî bere-bere derbazî cûrê pêşketî dibû. Di dawîya hezarsaliya IVa ew pêvajo xurttir û bi hêztir bû. Hema xût di dawîya hezarsaliyên IV-IIIa berî dewrana me li ser meydana dîroka Asîya Pêş gelên usa peyda bûn, ku meriv dikare wana wek pêşiyên kurda yên êtnîkiyê bihesibîne. Ew ev millet bûn: hûrî an subarey, kûtî, lûlûbêy, kassît, kardûx û çend eşîretên mayîn. Lê ewana bi merivtaya êtnîkiyê va (bi xwîn-qinê) naşibine kurdên niha û jî hev gelekî dûr in.

Ji ber wê jî zanyariya vê demê pirs ne daye ber xwe, ku di nav wan mileta da pêşiyên kurda bigere. Milletên Asîya Roava yên mayîn jî dikarin ser wî hîmî wê vêrsyonê jî bo milletê xwe bêjin, ji ber ku ew herêm, ku êtnogênêza kurda ji wir xuliqîye (Mêsopotamiya Bakur), û di wê da şikberî tune, axeke usan e, ku li ser wê navbendên medeniyeta cihanê yên here kevnare pêşda hatine. Berî 8 hezar sala li wir kultura Xelefîyê pêşda hat (perça Kurdistana Sûrî ya îroyîn), ku weke 600 sala dom kir û tesîreke mezin li ser axa der-dorê xwe kir û ewê yekê bingehê karê malhebûna gundîtîyê (rêncberî, malxwedîkirin) danî û demê wan gela yê kulturî guhart, ku ji demên kevnare da li ser wê axê diman. Pişt ra kultura Ubeydîyê, an jî ya Dicleyê dewsa wê girt (perça Mêsopotamiyayê ya deştî bigre hetanî perça wê ya berpala çîyan), ku weke hezar sala dom kir û tesîra xwe li ser gelên çiyayî jî kir.

Pişt ra dewrana gûrîya hat (hema bêje ji sala 4300î destpêkirî hetanî nîveka hezarsaliya II ya berî dewrana me). Gûrî li der-dorê zincîra çîyayên Zagrosê-Tavrosê, aranê Mêsopotamiyayê û heta were bighîje çîyayên Îranê, diman. Zimanê wan dikete nava koma zimanên Kavkaza bakûr-rohilatê. Rêçên medeniyeta gûrîya gihîştine heta rojên me. Ew di kultura

matêriyalîyê da, di eyd-erefatên olî, mîfologîyayê da, lo heta di gêna da jî hatine parastin. Lê jî dewrana gûriya heta destpêka êtnogênêza gelê kurd hela demeke dirêj hebû. Ji bo wê yekê bîngehên lîngwîstîyê jî tunebûn. Gelên wê dewranê, di nav wan da kûtîyên bi nav û deng, ku di çarêka dawî ya sedsala III ya berî dewrana me li ser axa Kurdîstana îroyîn (perçê wê yên Navbendî û Bakûr) pîranî bûn, tenê bi awayê antropologîyê û hinekî jî di alîyê kulturî da dikaribûn bihatana hesibandîne wek pêşîyên kurda, ew jî ne tam.

Di hezarsalîya II ya berî dewrana me demê (bengzê) êtnîkîyê yê herêma ku kurd niha li ser dijîn, pîr guhêrî. Dagîrkarên eşîretên hînda (mîtanî û yên mayîn) êrişî li ser vê herêmê dikirin û ewê yekê tesîreke mezin li ser jîyana civakî-aborî û çandî ya bîneçiyên çîya û arana kir. Hema di wê demê da ermenî belayî li bakûrê ewê herêmê bûn, lê eşîretên îranîaxêv (mîdîya, farîs, skîf, sarmat û yên mayîn) berê xwe dane başûr.

Ji nîveka sedsala IXa ya berî dewrana me arîya dakuta ewê herêmê, lê di sedsala IIIa da ya berî dewrana me hemû mîleta kirine arî. Bi vî awayî bû rengê êtno-dîrokîyê di wê demê da û êtnogênêza gelê kurd hema jî wir jî destpê bû.

Çi ku derheqa kurda bi xwe da ne, em dikarin bêjîn, ku jî nîveka hezarsalîya Iê ya berî dewrana me îdî pêşîyên wan yên êtnîkîyê hebûne. Çawa xuya ye, ew jî wan eşîretên îranîaxêv bûn, ku bi heywanxwedîkirinê va mijûl dibûn, ku diketine ber zerpa mîgrasyonê ya zor, ku wan dema ew herêm serobin kiribû, û dewletên Mîdîyayê û Farîzîstanê jî di hêla êtno-dêmoğrafîyê da serdest bûn, jî wana jî Mîdîya xurtîr bû. Hema bêje di wan deman da destbî êtapa duda û ya here gîring bû di pêvajoya êtnogênêza kurda da, di karê hevîgirtina wan ya êtnîkîyê da wek gel, lê di sedsalên dû wê ra jî - wek mîlet.

Navbenda wê pêvajoyê ya gêografî dibe navça başûrê Zagrosê, him perçê wî yê çiyayî, him jî yê deştî. Usa xuya ye, ku hema li vir êtnonîma "kurd" an jî "kurt" xulîqîye, an jî navên nêzîkî wî navî (wek nîmûne, "kurtî"). Ev têrmîn di nav berhemên gelek xudanmîvîsên kevnare da tê bîranîne (Polîbîy, Strabon, Plînnîyê Mezin, Tasît û yên mayîn). Serleşker û dîrokanê yûnanî Ksenofon di "Anabasis" a xweda derheqa "kardûxa" da şîrovedike (di sedsalên V-IVa berî dewrana me), lê ulmê vê demê bi çavekî biçûk li wê yekê dinîhêre, ku dibe kurd hema xût ew in. Ew fikir jî heye, ku têrmîna "kurd" pêşî wek navê hemû koçera hatîye bikaranîne, jî ber wê jî diyarbûna wê di nav edebîyata kevnare da (di sedsala IIIa berî dewrana me) nikare bibe argûmênteke bi îzbat bona wê yekê, ku êtnosa kurda di wê demê da jî hebûye.

Îzbatîya here xurt, em dikarin bêjin ya sereke, di pêvajoya demdirêj ya sazûna êtnosa kurda da - ew faktora lingwîstîyê ye. Êtnosa kurda ya hevgirtî destpê kir bibe xwedî zimanê xwe, ku bingehe wî îranîya kevnare ye û ew yek bû faktora here giring di sazûna êtnosa kurda da û ew bû bingeheke bi hêz bona sazkirina kultura xwe ya dewlemend.

Ev êtapa êtnogênêza kurda demeke dirêj kişand - weke hezar sala. Êtapa wê pêvajoyê di sedsalên II-VIa da (dewrana me) kuta bû, gava Arşakîda û Sasanîda li ser herêma kurda hukum dikirin. Di dewrana Sasanîda da cudatîya zimanê kurdî himberî zimanên îranî yên mayîn hate ber çava. Ereba, ku di nîveka sedsala VIIa Kurdistan zevt kirin, hatine ser wê bawerîyê, ku kurd wek gel serbixwe ye, xwedî ziman, çand û civaka xwe ya taybetî ye. Êtnogênêza kurda hema hema bêje îdî xilaz bûbû. Destbi dîroka gelê kurd dibû. Eger em zelaltir bêjin: dîroka medenî, sîyasî (di nav wê da herweha dîroka pêşdaçûyîna pêwendiyên civakî-aborî, çandî û yên mayîn). Çi ku dimîne derheqa dîroka kurda ya êtnîkiyê da, ew gelek dem berî Sasanîda destpê bûye û hetanî îro jî berdewam e.

Eger em gotinên xwe ser hev da bînin, em dikarin bînine ber çava, ku êtnosa kurda di pêvajoya konsolidasiya û întêgrasiya xwe da, ku çend hezar sala kişand, êlêmêntên hindo-arî (piranî yên îranî, xwesma yên madî-midî), herweha yên sêmîtiyê (aşûrîya, aramîya, paşê jî yên ereba) hilgirte nav xwe. Bi kurtî, êtnosa kurda, wek hemû êtnos-miletên cihanê yên vê demê, parzûna êlêmêntên here cuda-cuda ye, ku di dema pêvajoya pêşdaçûyîna dîrokê da saz bûye û ew bi kêmanî 7-8 hezar sala pêş da destpê bûye.

...

Wek ku hate destnîşankirinê, di Rohilatzanîya cihanê da demên dîroka kurda yên kevin jî hemîyan xirabtir hatine lênihêrandinê. Berî her tiştî ew derheqa dewrana neh sedsala da ne, ku bi êrişa, tevlihevîya û tevrabûna va Kurdistan ketibû di nav rewşeke xirab (ji nîveka duda ya sedsala VIIa heta destpêka dehsaliyên pêşin yên sedsala XVIa). Ew bi rastî jî "demeke tarî" bû bona gelê kurd, gava ew himberî qezîya gelkujîyê (jênosidê) û asîmilyasiyonê ya zevtkarên ereb, monxol û turka da ber xwe dida. Dîroka mîritiyên kurda, ku di wan dema da dixuliqîn (hinek jî wana tenê navê malbatên serkarîkir "kurdî" bûn, û tenê perçekî wan, gelek cara jî perçeyên biçûk, yên millet bûn), bi rastîyê hela nehatiye nivîsarê, ew bi lekeyên sipî va tije ne.

Hema bêje bi wî cûreyî jî dikarin li ser dîroka kurda ya hersê sedsalên piştî wê ra bêjin (ji destpêka sedsala XVIa hetanî destpêka sedsala XIXa), dema Kurdistana di nav Împêratoriya Osmaniyê û Îrana Sefevîda da perçekirî bûbû yekîtiyeke mîrîtiyên nivserbest, ku bi dîwana navbendî ya li Îstenbolê û Îsfahanê ra bi pêwendiyên nivresmî va girêdayî bû. Û şerên Tirkîyê-Îranê yên di wê dewranê da, ku piranî li ser axa Kurdistanê dibûn, û gelek eşîretên kurda jî tevî wan şeran dibûn, di herêma Kurdistanê da dibûne sebebê şerê navxweyî, xiringêleyê, tevlihevîyê û ew yek dibû astengeke mezin bona hevgerîna milletê kurd, bona pêşketina wan di hêla civakî-aborî, siyasî û çandî da.

Ji ber wê jî em serê vê xebatê yê pêşin (beşên I û II) bi cûrê lêkolîna, bi îzbatîyên ulmî va raberî xwendevana dikin.

Serê duda (beşên III û IV) derheqa dîroka Kurdistanê ya vê demê da ne (ji dehsaliyên pêşin yên sedsala XIXa destpêkirî hetanî dawîya şerê hemcihanê yê yekemîn), dema bi cûrê derebegîyê-cudaxazîyê destbi têkoşîna gelê kurd bû ji bo azadîyê û serxwebûnê, lê ji dawîya sedsala XIXa destbi tevgerên milletîyê-azadîyê bûn, ku ji bo wê yekê bû, ku ji nîrê Tirkîyayê û Îranê xilaz bibin û Kurdistaneke yekgirtî û serbixwe ava bikin. Hema di wan dema da Rûsiyê û dewletên Roavayê yên dagîrkar (piranî Îngilîs, lê di dawîya sedsalê da jî - Almanîya) ketine Kurdistanê û şerê di navbera wan pêşî jî bo testîqkirina hukumdariyê bû li ser wî welatê bi stratêgî û aborî giring, paşê jî jî bo perçekirina wê bû. Hema di wan dema da pîrsa kurda xuliqî wek faktoreke giring di pêwendiyên navnetewî da, him bi dereca Rohilata Nêzîk, him jî ya hemcihanê.

Himberî dem û dewranên mayîn, ev dem jî aliyê kurdzanên Rûsiyayê da baştir hatîye lêkolînê û azirûkirinê. Ji ber wê jî me rê tê ra dît, ku vî perçê evê berhemê da wan nivîsa bi cî bikin, ku piranîya wan berê hatine weşandinê, hilbet, me bi çavekî rexne li wan nihêrîye û nerastî sererast kirine. Ji ber wê jî hema bêje qet ne hewce ye em serkanî û edebîyata jê hatîne girtin, destnîşan bikin.

Di serê sisiya da dîroka Kurdistanê ya here nû ye, ji dawîhatina şerê hemcihanê yê yekemîn destpêkirî, hetanî rojên me. Keda rohilatzanên Sovêtîyê (Rûsiyayê) di lênihêrandina pîrsgîrêkên evê dem û dewranê da bi gişka va baş eyan e. Ew didemên, ku di edebîyata me û welatên dereke da rind hatine lêkolînê, em tenê çavkanîyên hineka ji wana didin. Lê ewên, ku hewcê rastkirinên berbiçav in, an jî gerekê lê vegezin û bi çavekî nû li wan bûyeran binhêrin, herweha qewmandinên van dawîya jî, yên pîr balkêş, ku ulm hela pêra negîhandîye li ser wana bisekine û raya xwe

bêje, çiqas ji me bê, emê wana di parzûna zanyariyê da ronî bikin.

Em ser gotina xweda zêda bikin, ku di vê berhemê da pirsên aborî û çandî nayêne ronîkirinê. Guhdariya sereke hatiye danînê li ser jiyana siyasi ya kurda û Kurdistanê. Çawa jî hebe, xudanên nivîsa ser wê baweriyê ne, ku di vê pirtûkê da pirsdanîna sereke bi ser ketûye: bi sistematîkî raberkirina faktorên pirî-hindikî giring, demên sereke yên jiyana gelê kurd yên dîrokî, ji xuliqandina wan li ser erafê Rohilata Nêzik wek êtnosa serbixwe di nîveka hezarsaliya derbazbûyî hetanî hezarsaliya dû wê ra. Bi bawerîya me, ev xebata ku lêgerîna dîroka gelê kurd ya ser dereca bilind tîne ber çava, bi kil û kêmasiyên xwe va wê keda xwe bike nava kurdzaniyê da.

...

Navenda Lêkolînên Kurdî li Moskow (serok - akadêmîkê Akadêmîya Zanyarî ya Ermenîstanê ?ekroyê Xudo Mihoyî), xwe daye ber vî karî û ew çap kiriye. Ev berhem bi saya nivîsên xebatkarên Laboratoriya lêkolînên kurdî ya Înstîtûta Rohilatzanîyê ya Akadêmîya Rûsiyayêye Zanyarî û kabînetâ para Sankt-Pêtêrbûrgê ya Înstîtûta Rohilatzanîyê ya Akadêmîya Rûsiyayêye Zanyarî bi ser ketûye. Pêşgotina wê M.S.Lazarêv nivîsiye, beşên I û II - Y.Î.Vasilyêvayê, beşên III û IV - M.S.Lazarêv, beşê V - M.A.Hasratyan, beşê VI - O.Î.Jîgalînayê, beşên VII û VIII ?ekroyê Xudo Mihoyî, paşgotin - M.S.Lazarêv nivîsîne. Di pêşgotinê da nivîsên O.Î.Jîgalînayê, di beşê Va da têkstên M.S.Lazarêv û ?X.Mihoyî hatine bikaranînê. Kronologîya wê O.Î.Jîgalînayê û M.S.Lazarêv, lê navnişên wê O.Î.Jîgalînayê û ?X.Mihoyî amade kirine.

Navbenda Lêkolînên Kurdî li Moskow bi dilgermî razibûna xwe dide sponsorê evê berhemê, doktorê dîrokê Emînê Hesên Mustafayêv.

EZ Û HEYKEL

M. Alî Kut

Em li ber heykelekî civiya bûn. Heykel, li qiraxa golê, li ser erwazekî bû. Em deh kes bûn; pênc keç, ji bilî heykel em pênc kes jî mêr bûn. Wusa dixuya ku heyîna heykel, ji min pêva bala kesekî din ne kişandi bû. Belkî jî ji berku ez bi tenê biyaniyê wê derê bûm loma...

Ne dihate famkirin bê heykel temsîliya çi dikir. Tu nivîs li ser hîmê wî nedixuya. Dibû ku heykelê qehremanekî bû... Lê tu diruvê qehremaniyê jî pê ne diket! Şîpya bû, lingên wî yên ji hev ji bo gavavêtinê amade bûn. Gopalê didest de ku bihînd kiri bû, ji daristana hemberî me pêve tu dever nîşan ne dida. Bîrhên wî mîna hejikên ser sêncan bel bûn. Bêvila wî ya mezin dîmenadev û ruwê wî yê nelihev bêtir xera dikir. Qama wî ne kin û ne jî dirêj bû. Lê dîsa jî hîmê wî yê ji mermer dida xuyakirin ku di wexta xwe de bi qedir ûqîmet bûye. Me sifra xwe li teniştê heykel danî bû. Lewra jî wê derê, me bi hêsanîdikanî bû li golê û şînahiya daristanê temaşê bikira. Bi rastî cihekî ewqas xweş bû ku meriv dikanî bû li wir rûniştê û di rojekê de çend şîir jîbinivîsiya. Min piştê xwe dabû hîmê heykel. Pêşiyê min got qey bi gopalê di destê xwe degefta li min dike, ez jê tirsîya bûm. Lê dîre min xwe bi xwe; "Ma meriv qet ji heykelekî jî ditirse!" got û pala xwe da hîmê wî. Ro di aso de hêdî hêdî diçû ava, şûna xwe bêdil ji tava hîvê re dihişt. Li jor ezmanekî bêewr, ji stêrkan xemilî û li xwarê jî xweşikbûna xwezayek ku bi bêjeyan ne dihat teswîrkirin... Me him jî fêkiyê ser sîfrê ditamand û him jî şeraba xwe hêdî hêdî vedixwar. Gerçî nizanim çima, lê min hinekî bi pît vedixwar!

Dawiyê yekî ji me şekîrek dişikand! Dest pê dikir ji mijarên romantîk dipeyivî. Behsa hewayê kir; di wê bêhnikê de te digot qey ji bo ku axaftina wî romantîktir bike, di ser me re pêlik bayê hênîk derbas bû. Wî axaftina xwe berdewam dikir, bi rengêkî gelekî xwezayî gotina xwe ji ser hewayê guherand ser cemedê. Lerzekê ji sermayê bi me teva digirt! Wî pîyaloka

xwe hildida, gulpek ji şeraba xwe vedixwar, me jî pê re... Wî axaftina xwe bi katkirina çîroka H.C.Andersen ya bi navê "Xatûna Cemedê" didomand. Digot ku; "Yê sêrdar neynikek efsûnî çêkiri bû. Yê ku di vê neynikê de li xwe dinerî... li dunyayê hertişt xerab didît. Dûre yê sêrdar xwest vê neynikê derxîne ezmên ku melek jî di wê de li xwe binêrin. Lê neynik li ezmên hûr hûrî dibû û weke xweliyê dibariya xwarê. Ew kesên ku piçek ji xweliya vê neynikê keti bû çavên wan, dest pê dikirin hertişt çewt û xerab didîtin." Dûre jî got ku kêfa wî mêrî gelekî ji vê çîrokê re tê. Dema ku weha got, min gotina wî birî û digel ku qet pêwîst ne dikir, dîsa jî min got; "Kêfa min zêdetirîn ji çîroka Keçika Kibrîtîroş re tê." Lê pêre pêre jî ez bi gotina xwe poşman bûm. Serî tev fitilîn ser min, çavan teva li min nerî, komek guh xwe miç kiri bûn û mîna ku bibên; "De bêje, vêca em li te guhdarî bikin!" Lê mixabin, tiştêkî min î ku ez ji wan re bibê m tune bû. Ne zimanê min têrê dikir û ne jî dilê min qîm dikir. Min ji herkesî bêtir dixwest ku ez guhdarî bikim.

Dema ku wan jî evaya fam kirin, dest pê kirin cot cot bi hev re axifîn. Yek bi yek ji hev re navên çîrokên ku jê hez dikirin gotin. Wusa peyv dirêj dibû, ji mijarekî derbasî ser yekî din dibûn. Mîna heykel, heyîna min î li wir jî zêde ne di bala kesekî de bû. Pêşiyê li gor dilê min bû, kêfa min jî vê re dihat. Mîna nêrevanekî tenê bi çavên xwe min civat dadiwerivand û di serê xwe de analîza şexsiyetên wan dikir. Lê dûre ez jî vê vatiniyê aciz bûm û min xwest xwe bidim xuyakirin. Xwestinek ku bi hinekan re mijûl bibim li cem min çêbû ku êdî min nikanî bû rê li ber bigirta. Cara dawîn dema min bi awirên xwe civat daverivand; li aliyê xwe yê çepê min keçek keşif kir. Du gavan dûrî min xwe serî xwe bû. Yê din tev bû bûn zo. Ango yek nêr û yek mê...

Li wê derê ez, keçik û heykel ma bûn. Li gor ku heykel bêgiyan, jî kevir bû; ez û keçikê pişka hev diketin. Gava ku ez wusa fikirîm, tu sedem jî bo ku neçim pê re nepeyivim min ne dît. Ji xwe dema ku wê jî carekê duduyan di bin çavan re li min meyizand, êdî jî bo axaftinê ez amade bûm! Bêyî ku bizani bim ez ê çî jê re bibê m min hilda xwe ku herim cem. Lê bi hildana min re, jî nişka va pîhnek wusa bi pît li piştî min ket... Dunya li dora min zîvirî, kabokên min zîz bûn, min nema ber xwe dît, di cihê xwe de ez kumişim û bêhemdî xwe ez qêriyam! Hemî fitilîn ser min û bi devekî gotin; "Çî bû?" Dema min serê xwe zîvirand, li paş xwe min jî heykel pêve tu kes ne dît; "Heykel pîhnek li min da!" min got. Hemî bi min kenîyan, teva; "Henekên te çiqas xweşin, lo!" gotin. Bi rastî li paş min jî heykel pêve tu kes tune bû. Dema min lê nerî bû ez têgihîştî bûm

ku lingên wî jî ne li cihê berê bûn. Gopalê ku di dest de jî bilindtir bû bû. Çavên wî yên kevirîn bi awirên dijwar li min dinerîn. Weke ku bibê; "Eger tu xwe hinekî din nêzikî wê bikî, ez ê vî gopali li serê te bidim!" Yên din zo zo rabûn li nava daristanê belav bûn. Li wê derê keçik, ez û li paş min jî heykel ma bû. Ji tirsê heykel bêyî ku jî cihê xwe bilivim ez rûniştî bûm û difikirîm bê ez ê xwe çawa jî nav lepê vî heykelê çavnebar xelas bikim! Keçik jî li cihê xwe rûniştî, goşik tirî di dest de, jê dixwar; serê gavê jî li min dinerî û dibişirî. Teqnekî weha me li hev meyizand, dûre min biryar da ku rabim biçim balê. Min piyaloka şerabê ya dawîn bi ser xwe de kir, hemû hêza xwe civand û hinekî bi hêrs ez rabûm ser xwe. Lê bi rabûna min re pîhnek ji ya berê bi deh caran hêztir li pişta min ket. Ez bi deverû ketim, li erdê dirêj bûm. Hişê min ne çû bû, lê janekê wusa dijwar bi canê min tevî girti bû ku êdî min nikani bû xwe bilivanda. Te digot qey qorika min bi derbekê re felişî bû. Weke ku bîhna min bi carekê çikiya be, deng û his ji min dervediket. Wusa dixuya ku keçikê tiştêk fam ne kiri bû. Ji dêlva ku were alikariya min bike, tiqetiqa wê bû bi halê min dikeniya.


Evaya jî ji derba heykel bêtir bi min zor dihat. Nizanim bê li erdê ez çiqasî dirêjkirî ma bûm. Dema ku ez bi ser xwe ve hatim, yên din jî nava daristanê vedigeriyan. Tiştê ku bi serê min de hati bû min ji wan re kat ne kir, ji xwe ew ê kesekî ji min bawer nekira. Herweha keçikê jî behsa tiştêkî ne kir. Lê gava ku çavên wê bi min diket ew her dibişirî. Şev dereng keti bû, êdî wexta çûyîna malê bû. Me firaxên xwe berhev kirin û em bi rê ketin. Dema em ghiştin bajêr, me ji hevdu xatir xwest û em belav bûn. Herkesî riya mala xwe girt, lê ez bi şûnde vegeyriyam cem heykel. Min çend fitil li dorê avêtin û min hezar çêr jê re kirin. Wî qet di xwe dervedixist, mîna hemû heykelan ji cihê xwe ne dilivîya, bêdeng û bêhîs bû. Di dilê xwe de min got; "Keçik ne li vir e, loma!" Lê min dev jê berneda; ez çûm ser hîmê wî, min xwe dayê da wî bixim erdê. Qeweta min têrê ne kir, min bi herdu destan bi gopalê wî ve xwe daliqand ku bişikênim lê ew jî ne şikest. Dûre min dît ku bi vî babetî ez ê nikani bim xisarekê bidimê, ez daketim, çûm ji perava golê min ber sînga xwe tîji kevir kir û hatim li ber veketim. Lê wê jî xêr ne kir! Kevirên ku min davêtinê dîsa jê dipengizîn, dihatin li binguhê min diketin. Min fam kir ku jî wî zêdetir ez ê xwe brîndar bikim. Şev jî dereng bû bû êdî. Ji neçarî min kevir avêtin erdê û pîs pis reya malê girt...

Berî ku ez ji cem bi dûr kevim min jê re; "Tu qet nefikire ku ez ê wusa dev ji te berdim! Ez nuha diçim lê bizani be ku ez ê sibê dîsa vegeyim. Ez dev ji te bernadim ta ku te ji ser hîmê te bigindirînim..." got.

Ji weşanên nuh

Koç


Silêman Demir di vê romana xwe de, trajedyaku bi serê miletê me hatiye, bi zimanekî têr û edebî rave dike. Romaneke realist û civakî ye. Nivîskar di guhera romanê de tiştê ku xwestiye bide, baş daye. Bi serketî ye. Koça ku ji 188 rûpelan pêk hatiye û di nav Weşanên Roja nû de derketiye, bi formateke sipebî divê ku ji nûv re çap bibe. Mezinahiya romanê di serastkirinên teknîkî, vekîtê û kêmaniyên çapê de fetisî ye.



Tofan


Hesenê Metê di vê novela xwe de, vê carê jî li ser zirzopan, hotir, pivikî, solalês, derewîn û gelacên civaka me kurdên îro rawestiyaye. Ew bi zarekî xweş û bunerî destnîşan dike ku civaka me çendî silûk bûye û ji marîfetên xwe ên kurdî dûr ketiye.

Kitêba Metê, bi naveroka xwe xurt û ji aliyê edebî ve jî, ji hew bêtir bi serketî ye. Tofana wî a ku ji 88 rûpelan pêk hatiye, Weşanxana APECê bi haweyekî dilpijokî çap kiriye.



Xezeba Azadiyê

Laleş Qaso bi vê romana xwe a ku Weşanxana Pelda çap kiriye, xezeba ku ji salên 1980î û vir ve bi ser miletê me de rijiyaye, girtiye û aniyê. Xezeba Azadiyê dewama romana wî a ku Nûdemê bi navê "Sê Şev û Sê roj" an çap kiribû. Roman 312 rûpel e.



Zindana Diyarbekirê û Şoreşgeriya me

Ev kitêba Laleş Qaso, ji 363 rûpelan pêk hatiye û ji serî heta binî zilma tirkan, liberxwedan û reva girtiyan rave dike.

Çapa kitêbê Weşanxana Pelda kiriye. Di dawiya kitêbê de albûmek jî heye.

Bi xatirê Sîlehan


Serdar Roşanê ku di pêşxistina edebiyat û zimanê kurdî de sûnddayî xuya dike û bi Çîrokên Hezar û Şevêkê û Mircana Qelew (Guy de Maupassant) hilfa xwendevanan kişandibû, vê carê jî di sa ji swêdî, romana Hemîngway derbasî ser refikên edebiyata kurdî kir. Lê mixabin Weşanxana Nûdema ku kitêbên xwe bi dispîhn û dilpijokiyeye delal pêşkêş dikir, ev romana ku xelata Nobelê girtibû bi mîzanpajeke qurquçî û bi gelek çewtiyên di vî warî de, çap kiriye. Roman 345 rûpelan pêk hatiye.

Pêlên Derya Reş

Firat Cewerî di vê kitêbê de gera xwe a ku di sala 1994an de bi çar sed nivîskarên dinyayê re derketibû ser Deryaya Reş, rave dike. Balkêş e mirov bixwîne. Weşanxana Nûdemê, kitêb bi mîzanpajeke delal û marifeteke bedew çap kiriye. Di dawiya kitêbê de albûmeke ku ji sûretên 30-40 nivîskarên navdar berhev bûne, heye. Ji bilî van sûretan wekî din jî, çend nameyên ku ji navdaran jî Firat re hatine û herwiha jî rojnama Ögur Politika û Ögur Ulke, du perçe nivîsên pozîtîv jî di derbarê wî de hene. Kitêb 91 rûpel e.


Çîrokên Kurmancî

Konsulê rûsî Aleksander Jaba 140 sal berê ev çîrok nivîsandine. Ev kitêba ku Weşanxana Helwest-Çanda Nûjen çap kiriye, 137 rûpel e. Û jî 40 çîrokên kurdî pêk hatiye; hemû jî bi kurdiya 140 sal berê hatine nivîsandin. Cankurd, kitêb jî tipên erebî derbasî tipên latînî kiriye.




Rênasî

Rênasiya Şêx Xiyasedîn Emreyî Zeynelabidîn Zinar, ji tîpên erebî derbasî tîpên latînî kiriye. Digel 93 rûpelên kitêbê ên bi tîpên latînî, orjînalê bi tîpên erebî jî hatiye nivîsandin. Kitêb xwerû jî şihran pêk hatiye. Di şihrên Şêx Xiyasedîn de, bi qasî gotinên kurdî ewqasî jî gotinên erebî hene. Şihrên cenabê wî, bi wezn û kafî ye û li gora mewluda kurmanciya Melayê Bateyî hatine nivîsandin. Rênasî, "Pencînar Weşanxaneya Çanda Kurdi" çap kiriye.



Fermana 33 Rewşenbîran

Ev kitêb li ser wan 33 kesên ku di nav welatperweran de wek "33 Rewşenbîrên Kurdan" û di nav cemaeta PKKê de jî wek "33 Xayin, 33 Alçak, 33 Beko, 33 Kew, 33 Teres" û hwd. hatibûn binavkirin, amade bûye. Nivîskarê wê Zeynelabidîn Zinar bi komantarên xwe ên belawela û tevlihev û bi çend rêzên di rengê izirnamyê de ku him di hindur û him jî li ser bergê kitêbê nivîsandîye, kitêb sivik kiriye. Û nivîsandina bi haweyê ku bihayê kitêbê "33 kronên swêdî ye", bêyî ku bi xwe bihise, meqsed çendî pozîtîv dibê bila bibê, rê daye henkpêkirinê û li lîteretora exlaqê 33 Kewan 33 Rewşenbîr wek 33 kronan zêde kiriye.



Kitêba ku jî 167 rûpelan pêk hatiye, "Pencînar Weşanxaneya Çanda Kurdi" çap kiriye.

Fermana 33 Rewşenbîran, ji aliyê bê kê çî jî wan 33 kurdperweran re gotibûn, liêjayê bidestxistinê ye.

Not: *Danasîna di derbarê kitêban de Laleş Qaso kiriye.*
Redaksyon

Çêlepîsîk bi gelek tiştanokan dizane

Nivîs û wêne: Ulf Löfgren
Wergera kurdî: Amed Tigrîs
Weşanxana APECê bi rengîn
çap kiriye.

hinek ji naveroka çîrokê:

....

-Tu dikarî bibêjî ew çi ye
ku mal bi mal digere û
derbasî tu malekê jî nabe?
-Bise... bise... Ew RÊ ye!
-Baş e, ew çi ye ku çav heye
serî tune ye?
-Ew... ew... DERZÎ ye!
-Wey li mino, ev çawa bû

ku te bersiva hemû tiştanokan rast da!

Divê ez di vê holikê de heta dawîya jîyana xwe bimînim.

Ji nişka ve bayekî xurt Çêlepîsîkê me radike, di ser darê re dibe li pêş
pisîkekê dirêj datîne ku di destekî wî de mercekek heye.

Pisîkê dirêj dibêje:

-Ez dibînim ku tu li ser rêyeke bi talûke yî, Çêlepîsîk!

Ez bi merceka xwe li pey te me.

Navê min Şerlok e û ez bala te dikişînim,

hay jî wî çiyayê ha hebe. Li wir du kevirên mezin hene,

neçe nêzîkî wan û nebêje:

KUNCÎ MINCÎ DERÎ VEKE JI VÎ QUNCÎ!

Wê demê dikare tiştên pir bi talûke pêk bîn.

...

-Ez Turandota Çînî me û ez ê jî te tiştanokekê bipirsim Heger tu
têdêrnexî divê tu heta dawîya jîyana xwe li vir, di nav birca ferfûrî de
bimînî. Çêlepîsîk bi kelegirî dibêje:

-Tu dikarî jî kerema xwe re tiştanoka xwe bipirsî!

-Baş e, ew kî ye ku SERGILOK Û NAVTÛRIK Û BOÇGOPAL e?

-Ew... ew... ka raweste... Çêlepîsîk difikire. Û difikire... û difikire lê
na, ne mumkun e, ne mumkun e ku bizanibe...

-Çi ye, divê çi be, çi be...?



RINDO Û MÊVANÊN XWE

Nivîs û wêne: Ulf Löfgren
Wergera kurdî: Rewşen Tunc
Weşanxana APECê bi rengîn çap kiriye.

hinek ji naveroka çîrokê:

....

Lê anuha dîsa derî lêdikeve!

Oy, oy, oy! Yê ku li derî dixê
hîrçekî mezin e.

Hîrç dibêje: Gelo ez dikarim li
mala te rakevim, Rindo?

Rindo dibêje: Erê tu dikarî. (Lê Rindo hinekî jî ditirse, ha!)

Rindo dibêje: Tu dikarî di cîrnê serşoka min de rakevî.

Hîrç dibêje: Ew ê baş be. Cîrnekî pir xweşkok e!

Lê anuha êdî derî lênakeve!

Rindo difikire û dibêje anuha xweş bû û jî xwe mal jî têra xwe tijî
ye. Gava ku Rindo rûniştiye û li ser van tiştan difikire, teperepeke
XURT dibihîze.

Rindo mereq dike û dibêje: Ev teperepa jî kuderê tê?



RINDO Û HEYWANÊN DIN

Nivîs û wêne: Ulf Löfgren
Wergera kurdî: Mahmûd Lewndî
û Khabat Aref
Weşanxana APECê bi rengîn,
bi kurmancî û soranî çap kiriye.

hinek ji naveroka çîrokê:

Rindo dîsa bi pahniya xwe li topê dixê.


Îcar jî li serê yekî dikeve ku dibêje:
QIRREQIRRR !

Rindo dibêje: Gelo dikare beq be!

Na, ew qirik e! Binêre, îcar jî Rindo bi pahniya din li topê dixê.

Top diçe li serê yekî dikeve ku dibêje: WEQ WEQ...

Rindo dibêje: Gelo dikare şêr be!



Kitêbên nû

bi resmên renqîn, ji bo zarokan hatine amedekirin.

Hûn dikarin van kitêbana li navnîşanên jêr peyda bikin.



Çêlêpisîk bi gelek
tiştanokan dizane
Ulf Löfgren



Li Swêdê

Box: 3318,
SE 163 03 Spånga / Sverige
Telefon: 0046-(0)8-761 81 18
Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

Li Almanyayê

M. Özgür
Postfach 900348,
51113 KÖLN/Almanya
Telefaks: 0049-(0)2203-301630

<http://www.apec.nu>

E-Mail: apec@swipnet.se